
Barîyê Bala

# Kulilkên Necilmisî



***Barîyê Bala***

# KULÎLKÊN NECİLMİSÎ

Weşanên Zengezûr
Bîşkek - 2011

***Талантливый курдский поет Барийе Бала (Барийе Елийе Паша) родился 1937 году в Армянской ССР в селе Демирчи Массиского района.***

***Автор четырех книг. Первая книга под названием «Мой мир» вышла в свет в Армянской ССР в 1974 году. Вторая книга в 1994 году «Куда идти» в республики Азербайджан. Третья книга «Моя Дильбар» и четвертая книга «Мать» вышла в свет в 2008 и 2009 годах в республике Кыргызстан.***

***Пятая книга под названием «Букет цветов» содержит его новые стихотворение, три поем и два пьесов.***

Rêdaktorê berpirsiyar:
**Hejarê Şamîl**



***Ya Rebb!***

***Derdê gişka te mehlem kir***
***Bê mehlem hîşt te derdê me.***
***Boy tew gela derge vekir***
***Lê girtî hişt te dergê me.***

## Pêşxeber

Nava Barîyê Elîyê Paşê (Barîyê Bala) pêncî deh sala zêdetire, di navên nivîskar û helbestvanên wêjeya Kurdên Sovêta berê û YKS-ê niha da bi hurmet û siyaneteke mezin tê kişandinê.

Riya emrê wî nav gelek kaş, kerîşa ra buhuriye. Ser qewmandinê pir tel û kêm şirîn hatiye bingeh kirinê, wî zaroktiyê xweye şirîn, nav sexîr û sêwîtiyê da qut kiriye. Dema ewî pênc salî bûye, şerê cihanêyî duda dest pê dibe. Bavê wî boy ne altbûna welatê Sovetêyî ku tê da dijî, çekê hildide, miqabilî Almanê faşîste devxwîn şer dike, şehîd dikeve. Meydana şêr boy wî dibe goristanê biratîyêyî nebîrkirî.

Ew derheqa bavê xwe da helbesta “Êvarekê bavê min birin, lê ew îdî paşda venegeriya” da dilekî kulî, birîn bi hûrgilî wa dinivîse, kasil, kasil wa dibêje:

“Nanihêre ez îdî kalikim, neviya dora min girtiye. Hineka maç dikim, hineka serê wan mehez dikim. Lê heta nika jî riya ku bavê min tê da birine, timê wê rê dinihêrim. Bavê min kivş nabe… Keserên kûr dikişînim, ber çavên min şil dibin. Faşîstên devxwîn cinûs lê tînim. Ji hemû bava rica dikim, wekî ew mehêlin çavê zarê wana jî nolanî çavê min ser riya bavê wan bimîne…”.

Dayîka Barîyê Bala, Qaza Evdoyê Bişo, wê rojê da porê xweyî reş sipî dike. Tevî Mehemedemînê ku dû bavê xwe ra mal da mêrê mezin dihate hesabê, şeş lawa – Ehmed, Kerem, Barî, Baqî, Knyaz, Torin û keçekê – Asyayê halekî pir giran da rokê birçî, rokê tezî mezin dikin. Lê destê xelayê Baqî û Torin jê wê distîne. Ew 1947 salê ji halê koçeriyê, derbasî halê riqatiyê dibe. Nav çetinaya da cîguhezî nehiya Zengîbaserê, gundê Demirçiyê dibe.

Mehemedemîn, payiza wê salê Bariyê biçûk dibe dibistana gunde hevt sale, li kiderê perwerde bi zimanê

Azerî dihata dîtin. Barî li dibistîn da çetinayîke giran dikişîne. Çimku wî xênî zimanê dayîkê zimanê cuda nizanibû.

Nav wedekî kurt da ew zimanê Azerî hîn dibe. Halekî birçî, tezî, sergot û pêxas da wey axir wê dibistanê xilaz dike. Dû wera diçe dibistana gundê cînar – Qereqişlaxêye navîn. 1957 salê wê kuta dike.

1958 salê qebûlî zankoya Dewleta Ermenistanêye ser navê X.Abovyan dibe. Para Azerî, dîrok û fîlolojî dixwîne. 1963 salê zankoyê zanebûneke kûr va xilaz dike. Çend sala dibistanên nehyê da dersdar û serwerê dibistana dişuxule.

Berê pêşîn bi zimanê Azerîkî çend helbestên zorokaye piçûk dinivîse. Dema rojnama "Riya teze" dixwîne, radyoya Êrêvanêye zimanê Kurdî dibihê îdî helbestên xwe bi Kurdî dinivîse. Helbesta wiye ewile Kurdî nivîsi 1960 salê bi sernivîsara "Qulingno" rojnama "Riya Teze" da tê weşandinê. Ew vê helbesta xwe da ji refên qulingên ku demsala baharê beriya jêrîn tên, halê gelê xweyî koleyî, pir zêryayî pirs dike.

Mijarên efrandina Barîyê Bala dewlemend û pir janre (şaxe). Wî qeweta xwe pir janrên wêjeya nivîsar da ceribandiye, ji wan serfinyaz û rûsipî derketiye. Vê hostadiya xwe janra çar xetê da daha berbiçav dide kivşê:

Dinya fire heq mêzîne
Xêr û guna dikişîne.
Zû û dereng, firqî tune
Kê çi dayne, wî hitlîne.

Ew bi van çar xete dixwaze bêje, wekî her kes gerekê rind bizanibe, nav emir da çi wî ra pêwîste, çi ne pêwîste. Çi ne pêwîste, gerekê wî meke.

Çar xeteke din da ew lawê xwe wa şîret dike:

Qet bîr meke van şîretê bavê xune
Nav jiyan da tim nas bike şûna xune.
Geh jor, geh jêr, tu rûnenê, lez mekeve
Kesê şûna xwe rûnanê, zû dikeve.

Mijareke wiye pir hezkirî jî walatparêziye. Barîyê Bala tu carê li Kurdistanê ne bûye, çi li wir diqewimin bi çavê xwe ne dîtine. Lê, boynet azaya welatê dayîkê şev û roj dil da dikewgire, mitala dike. Car-carana hêrsên şewat ji çavê wî berjêr dibin. Ew çar xetê da wa dinivîse:

Delalê min, leke ma
Ser dilê me leke ma.
Hemû welat bûn aza
Welatê me kê ra ma?...

Ew helbesteke din da dilekî kulî, birînî, xemî-keder berbirî rebbê jorîn dibe û jê rica dike:

Birîna tewa te mehlem kir
Bê mehlem hîşt, birîna me.
Pêş hemûya gerge vekir
Lê girtî hîşt te dergê me.

Ew dixwaze, wekî lawên gelê wî ji xewa hişyar be, derdora xwe mêze bike, nolanî hemû netewe, gelê Kurd jî yekbûna xwe çêke. Heta yekbûn nebe, azayî nayê dest anînê.

Çiqilekî efarandina Barîyê Bala parastina erf û edetê gelê wî ye, kîjan ku xezna zêr tê hesabê. Ew nolanî şervanekî şûr dide dest xwe ber dergê wê xeznê şev û roj disekine, nexwaze tu kes wê talan û tajan bikin. Çibûna wê wan bi şiva berhemên xwe va dikute. Helbesta “Min çi dît, çi nedît” da wa dinivîse:

Duh çûbûme meclîsekê,
Gelek dîtin, cara yekê.
Bala xwe da tew hatiya,
Tîna xwe da rûniştiya.
Sivre tijî, her tem hebû,
Çi pêwîst bû, ew tune bû.
Tore, telîm, nezaketî,
Erf û edet merfîfetî.
Piçûk jorê rûniştî bûn
Kal, pîr devra sekinî bûn.
Bûk bê kofî sekînî bû
Gerden, sîngî vekirî bû.

Ew ji lawên gelê xwe rica dike, wekî wana jî ber dergê wê xeznê bisekinin, nehêlin destê neyara têkeve bedena wê. Wê weke ronahiya çavên xwe qorî bikin, timê pê emel bikin.

B.Bala usa jî cîkî pir bilindî kêrhatî dide mijara hub û hezkirinê. Helbesta "Nazika kurd" da wa berbirî wê dibe:

Ne cewahir, ne lel-durî,
Tu ji wana bahatirî.
Hingiv nakim himberî te,
Tu ji hingiv şirîntirî.

Biska berde, guliya şeke,
Çav û burûya kil meke.
Reng hilnade dêmê alav,
Tu bedewî, bê misk, gulav.

Di pirtûka "Baqe kulîlkên ne çilmisî" da du şano û sê poêma cî war bûye. Pêwîste bê gotinê, wekî ew herdu janr nav wêjeya Kurdaye nivîsar da gelekî kêm hatine xebatê. Wekî tê zanîn, hîmdarê janra şanoyê di wêjeya me da

zanyar, helbestvan û nivîskar Wezîrê Nadiryî rehmetî tê hesabkirin. Wî bi nivîsara şanoya “Reva jinê” va qeşa helandiye, ev janr kiriye milkê gelê xwe. Barîyê Bala çawa dûhatîkî wî ev janr gorî qeweta xwe dewlemend kiriye, du şano - “Miho û Têlî” û “Seyran” nivîsîne. Wî boynet herdu şanoya jiyana gelê xweyî buhurî û nûdem bingeh hildaye. Bûyerên ku di şanoya “Seyran” da derbas dibe, bi awayî realîst ji jiyanê hatine hildanê.

B.Bala mijara şanoya “Miho û Têlî”yê ser hîmê destana gele zaravî hildaye. Ew destan heya nika jî nav gel da tê weklandinê û qîmetê xweyî lel-dur unda mekiriye. Ew obrazên ku hîmlî tevgelê herdu şanoyane, helbestvan wan obraza pareveyî du desta, du qeweta dike. Nava wana da doza mirin û manê diçe. Her yek wan bi çi bahayî dibe, bila bibe, dixwaze yê miqabilî xwe altke, bigihîje armanca xwe.

Barîyê Bala bi culet wan qewetên boy gele ne pêwîstin, pê şivdara xwe dikute û rexne dike.

Barîyê Bala usa jî sê destana (poêma) bi nêt û meremên xwe va pir dewlemed nivîsîne, kîjan di vê pirtûkê da cîh digire; “Paşa û Belgîzar”, “Cemîle” û “Çar emir, demsal”. Ew van poêmayên xwe da timê aliyê heqiya diparêze, wê digihîne armanca hêleye dest negihêştî. Helbestvan derheqa poêma “Paşa û Belgîzar”ê da wa qal dike wekî wî mijara wê poêmê bîranîn û qalkirina dapîra xweye sed salî hildaye.

Barîyê Bala têma poêma “Cemîle”yê (kîjan ku Cemîle nika dijî), ji jiyana dayîkeke bedbexte ku ji hemû dayîkên xwedêye bêpar man hildaye. Ew vê poêmayê da miqabilî wan bavên ku boynet emrê xwe nav kêf û eşqê da derbazkirin, zarokên xwe bê xweyî, birçî, tezî, sêwî hîviya kulfeta xwe va dihêlin, serê xwe hildidin, ji mal direvin şerekî hêle dike. Wana rexne dike.

Poêma helbestane sisiya “Çar emir, çar demsal”in. Ew vê nivîsara xwe da nolanî avjenekî dikeve nav gola emre bêhed

û bê hesabe kûre, bê bin Diçerçire, rast û çep dimeşe, va alî, wa alî diçe, lê, nikare ji golê weke xastina xwe derê. Dilekî pejmûrî, sêfîl, bangorî rebbê jorîn dibe, jê îltîmas û minet dike: ya Rebb, dema tu benda dixuliqînî, çima qismek gela ra çi te heye, gişkî daye, lê, hinek gela ra kulûr-kulûr xem û kedera şîn-girî didî? Çima rehma xwe ser hemû bendê xwe wekhev paravenakî? Ji wan gelên bêpar yekî jî em Kurdin. Boynet wê jî çar xeteka waha banî rebbê jor dike:

Ya Rebb,
Carek li me were rehmê
Xilazke, me ji vê zulmê.
Wekî ne dibû li me xudan
Çima te em anîn dinê?...

Dawiyê da xwedayê mezin rica dike, derenq be jî, îdî rehma xwe ser gelê Kurd hinekî pir bike. Belkî Kurd jî azaya xwe bistînin. Serokê wana bê sûç, gune ji hepsê derê, ala wan jî tevî ala gelê dinyayê bimilmile, ew jî bibe xwediyê axa xweye tijî lel-dur û cewahir.

Barîyê Bala ji wan helbestvan û nivîskaraye, mirov dikare derheqa berhemên wî da arxanî gelek belgên kaxetaye sipî tijî bike.

Lê, min ji behra jiyan û efrandinên wî dilopek hilda, raberî xwendevana kir. Giliyê dawiyê digihîje xwendevanên bi rûmet. Dil dixwaze, helbestvana dil ciwan ra bêje, wekî ew navê kaltiyê nayne ser barê xwe. Nebêje, ezî îdî kalim, westiyame û qelema xwe daneyne.

Eme vir ha şûn va jî hîviyêne, wekî ewê bi karê xweye pir qîmet va wê dîsa me şa bike.

Ez va rê da wî ra emrê dirêj, sihet û qeweta tim gence eşqe û şa dixwazim.

**Hejarê Şamil**

*Nivîskar, lêkolîner*

# HELBEST

**** Welathezî***
**** Lîrîka***
**** Hub û Hezkirin***
**** Şîret***
**** Çar xet***
**** Ji bo zarokan***
**** Rewakirin***

# Welathezî

## WELATÊ DÊ

Xwezil min ra te bigota, ewladê min,
Gul-nûre te dilop-dilop daniya ser min.
Min sihkira ezî îdî xwedan axim,
Ne sêfîlim, ne sêwîme, ne dildaxim.

Kubar-kubar bimeşyama ser sîngê te,
Hemêz kira deşt û zozan her qulçên te.
Ber her zerê, her zinarî rûniştama,
Paşe roja xweye şirîn dûr nemama.

Vî emrî da rûyêm îdî bikeniya,
Xilaz bûma rêwîtiya hemû riya.
Kevrek danya ser kevrekî, pê şa bûma,
Hesret dilê min derketa, hêsa bûma.

Têr bidîta tew karkirên welatê xwe,
Tevî wana min daniya ked-heda xwe.
Deynê xweyî ewladiyê biqedanda,
Cesedê min rihet bûya gora sar da.

## AZAYÎ

Azayî tim şirîn teme,
Bê wê emir keder, xeme.
Gelê ji wê maye bêpar,
Bê tivaqî, bê mereme.

Ew bê cefa nayê deste,
Riya wêye çep-xar, raste.
Boynet bibî, wêya xudan,
Pêwîste gel bibe qespe.

Tu tişt wek wê mezin nîne,
Dawî şayî, destpêk şîne.
Wekî gel ku bibe yeke,
Wê xwînxara bela bike.

## LAÇÎN

Laçîn, Laçîn, Laçîn ya meye
Neyar hildaye ji destê meye.
Em wê nadine qet tu kesiye
Nahêlin neyar bimîne lêye.

Laçîn, Laçîn, Laçîn ne dûre,
Navbera me da gelî kûre.
Berf lê dibare, kuliyên hûre
Her kanîke wê şerbete, nûre.

Laçîn, Laçîn, Laçîn zeynete
Cimaeta wêye pir nav hurmete.
Axa kal-bava em nadin dere
Nahêlin neyar bigere sere.

Laçîn, Laçîn, Laçîn xezneye
Namûs û xîret, ew tacê meye.
Lorik dayikê cuda namîne
Gêlê wê îdî neyar bistîne.

## LÛRÎ-LÛRÎ, LAWÊ MİNO

Lûrî-lûrî, ez heyrana bejn-bala te,
Çi şirînin, zar û ziman, dev-lêvên te.
Mezin bibe, bin esmanê çîkî-zelal,
Bok-beran be, hezke axa xweye delal.

Lûrî-lûrî, berxê mino,
Sebir-tawet, ruhê mino.
Hîviya te me bavo bêjî,
Ser axa dê pî bavêjî.

Lûrî-lûrî, per û baskê dayika xuno,
Hişyar razê, welêt mede yekî dino.
Bikeve, rabe, hûrik-hûrik rast bimeşe,
Ji te dûr bin, qeda, bela, rojên reşe.

Lûri-lûrî, emrê mino,
Şirîn, şerbet, zarê mino.
Hîviya te me dayê bêjî,
Neyar welêt tu bavêjî.

Lûrî-lûrî, Qendîl, Botan, warê te ne,
Kurd, Kurdistan, namûs, xîret, tacê te ne.
Mehêl neyar, bigere ser dilê mine,
Xwe helalke, şîrê berê dayika xune.

Lûrî-lûrî, hemû rabûn,
Dem hatiye, tu jî rabe.
Gelê dinê xwedî war bûn,
Îdî tu jî xwedî war be.

## WELAT

Xwezil, min ra te bigota ewladê min,
Gul, nûra te dilop-dilop daniya ser min.
Sih bikira ezî îdî xwedan axim,
Ne sêwîme, ne sexîrim, ne dil daxim.

Aza, kubar bimeşyama ser sîngê te,
Hemêz kira banî, beyar, deşt, qulçên te.
Daristana seyrangeha hêsa bûma,
Paşe rojên eşqe, şirîn dûr nemama.

Vî emrî da, rûyêm îdî bikeniya,
Xilas bûma rêwîtiya hemû riya.
Kevrek danya ser kevreki, pê şabûma,
Hesret dilê min derketa, hêsa bûma.

Têr bidîta tew karkirên welatê xwe,
Tevî wana min daniya ked, heda xwe.
Deynê xweyî ewladiyê biqedanda,
Cesedê min rihet bûya gora sar da.

## RÊWÎME

Dilê hejar, dengekî zîz quloz dibe
Geh dinale, geh digirî, rihet nabe.
Dihejîne, dizêrîne, nevsa mine
Dibê rabe, rêwiyê rêyî, mesekîne.
Dertême rê, gava davêm gir, hûr, nerme
Ez nabînim hêlîneke piçûk, germe.
Kasil, kasil didomînim riya xune
Erş û kursî şûnek tune boynet mine.
Rebbê jorîn dikim pirs û îltîmase
Heta kengê ezê bijîm bi xof, tirse.
Dibêm: - Ya rebb, çima dergê min venakî
Mîna tewa çima derdêm derman nakî?
Ez jî şabim, bibim xwedî axa xune
Jan, êşên xwe derman bikim destî xune.
Were rehmê, dernekev ji serê riya
Serxwe bibim, eşq, şa bijîm tev hemûya.
Deşt, zozana, daristana dibihorim
Cem û kaniya, ber, okyana derbas bibim.
Dubar, dubar, hey, hey diçim, dîsa diçim
Bê menzîlim, qet nizanim kuda diçim!

## ŞİKİR, ŞİKİR

*Wedê 3-yê meha Hezîranê 2009 salê prêzîdêntê Kurdistana Aza Mesud Berzanî çû serdana dewleta Tirkiyayê.*

Rêbbê jorîn, hezar şikir ber rehma te,
Dereng be jî, em jî bûne ewladê te.
Dayika meyê lawo nebê, dû me megrî,
Te vekirin pêş me îdî dîwan, derî.
Ala meyê tevî ala bimilmile,
Welatê me, wê derkevin derd û kule.
Kurdê îdî boy nevsa xwe bikin kare,
Bombên jehrê ser axa me nayên xare.
Tew hebûna meyê bibe tek milkê me,
Dibistana wê biaxife zimanê me.
Keç û xortê seyrangeha tev bimeşin,
Wê kutabin hemû rojên tele, reşin.
Ser kaniyan mêyê îdî şêlû nebin,
Gul-kulîlka bin piya da pêpez nebin.
Her Kurdekê bibe aza, xwedî nevse,
Xwîna neheq, wê mekişe, îdî, ese.
Tewcivînê dinyayê da Kurdê rûne,
Wê xasteka xwe elamke temam dinê.
Hemû gelê mêvan bêne welatê min,
Wê nasbikin, tew dîroka şêr gelê min.
Ezê hildim, kaxez, qelem, berçevka xwe,
Binivîsim, bixemlînim welatê xwe.

## YEKBÛN ÇİYE..

*12 Hezîranê 2011 salê da li Tirkiyayê, hilbijartina giştî da gelê Kurd serkeftineke mezin bi dest xistin…*

Yekbûn çiya dihelîne
Dehir, behra dixulqîne.
Hepsê tarî kafkûn dike
Xwînxwara ser çoka dike.
Ewa temê dev, lêvane
Şewq, şemala herd çavane.
Nav û namûs bilindaye
Serxwebûn û edilaye.
Kan, xezneke têr, tijiye
Çi bixwazî, tê da heye.
Wekî aqil biqiflînî
Behra wê tuyê bibînî.
Wek wê şirîn tu tem tune
Şerefa rûyê însîne.
Ew gele ku nabe yeke
Xwînxwar dergê wî vedike.
Kîbûna wî pêpez dike
Ku dixwaze, wir hol dike.
Wî dihêle tim koleye
Sexîr, hejar, heta heye.
Dike pêken, bê destûre
Qewmandina dike dûre.
Tu kes wî gel nahesbîne
Nav zulmê da dihelîne.
Hemû ji wî dûr direvin
Mehel nakin tev bigerin.
Bê ru, rûmet jiyan dike
Dewleta wî nanê zike.
Meclîsa da wî bê şûne
Ziman qutî, dil birîne.

Sal tên, diçin vala, bade
Dişewite halê xwe da.
Qîmetê wî zilek nîne
Ku davêjin, wir dimîne.
Halê wiya kes napirse
Dilî tijî xof û tirse.
Ez ban dikim gelê xune
Qebûl bike rica mine:
Neyar fêlbaz, zar şirîne
Mehêl ew te bixapîne.
Kêr li hestu asê bûye
Azayî te, destî teye.
Hemû bibin yek kulmeke
Xinzir naçe, bê koteke.
Qot, laşê wî bihecqînin
Welatê me jê bistînin.
Bê welatî bendeware
Bê per-baskî tim suxare.
Pîroz, pîroz ev coşa we
Feqîr nabin lawê Kawe.

# Lîrîka

## ŞUXLÊ XWEDÊ KES NİZANE

Xwedê bende ku xuliqand anî dinê,
Erş û kursî îdî dabû seknandinê.
Bi rewşa xwe, wî erş çêkir ça pêwîste,
Kir valaîke bê ser bine, şîne, raste.
Li wir her tişt kir du para, rind cîwar kir,
Para yekê ji misqala çûçiktir kir.
Ronya çavê wê nabîne, nayê xanê,
Para duda xizmet dike boy cihanê.
Ew stêrk, ro, hîv, ewrê gewre, sipî, reşin,
Ewe ji me dûr, nêzîke, rinde geşin.
Ro alemê tîrêja va şeveq dike,
Hîv şevekê hewzê xwe da zelal dike.
Stêrk esman şînî, tîlan dixemlînin,
Tîrêjên xwe bînbera ra kêm dişînin.
Wekî ewir bar hilnedin berên kûre,
Tebîetê ji jiyanê bibe dûre.

***

Ser erdê jî, çi xuliqand kir du pare,
Parek ruhber, para dinê bê ruhbere.
Para bê ruh, sekiniye, nalinije,
Merivayî kar-xizmetê bi wê dike.
Para bînber, ew jî kire du parane,
Xênî însîn, hemû bînber nav wê da ne.
Para duda însane, wey, destê wiya,
Rebb poşmane, ev firsenda daye wiya.
Dinê dike gola xwînê, poşman nabe,
Kafkûn dike, dişewîte, rihet nabe.

Him dikuje, him qut dike, nayne piya,
Xwe-xwe dike sexîr, sêwyê serê piya.
Bilind dibe, bin piyê xwe qet nabîne,
Hebûna wî, şîn û girî, qetil-xwîne.
Zêrzebelê dike dinê kêfxaş dibe,
Xwîn dikişe, nateîse, firnaq dibe.
Aşîtiyê gelek dûre, tim jêdike,
Bê dê, bê bav birçî dimrin, ew şayê dike.
Şuxilê xirab dûr nakeve, venakişe,
Timê dibê ezî rastim, yê din şaşe.
Rebbê jorîn mitheyr maye boy kirnên wî,
Poşman bûye, ev hebûna çima da wî.
Ya rebb, benda wê qutkira nisla heve,
Te çima ew xuliqandin, bi jîn teve.
Rehmê têke dilê xwînxar bê riya heq,
Cezê mezin, nazil bike tu boy neheq.
Îdî qutke reh-rîçalê, qetlê xwînê,
Edilayî bila bigre rûyê dinê.
Text û tacê qetilkara welgerîne,
Bila dinê rihet bêhna xwe bikşîne.

## GELEK HATİN

Gelek hatin, jiyan kirin,
Hildan, danîn, emir kirin.
Pêş xwe pêştir tişt nedîtin,
Çep, rast lêdan, nener kirin.

Boy nefên xwe, hemû hildan,
Kola zexim fiqara dan.
Ber zengîna tim nizim bûn,
Mîna tejiya dêloke bûn.

Tew emrên wan zû qedandin,
Gelek bê suç, hev qetandin.
Guhdirêja qet fehm mekir,
Boy gelê xwe lê wan çi kir?!

Gelê wana ça bîr bîne,
Navê wan ça bikişîne.
Kesên usa wek heywane,
Firqiya wî tek zimane.

## MİN Çİ DÎT, Çİ NE DÎT

Duh çûbûme meclîsekê,
Gelek dîtin, cara yekê.
Bala xwe da tew hatiya,
Tîna xwe da rûniştiya.
Sivre tijî, her tem hebû,
Çi pêwîst bû, ew tune bû.
Tore, telîm, nezaketî,
Erf û edet merfîfetî.
Cîkî bilind çêkiribûn,
Bûk-zava wir cî kirî bûn.
Bûk bê xêlî rûniştî bû
Sîngê wêyî vekirî bû.
Dikeniya hewal dida
Destê zavê av hildida.
Hatiya ew maç dikirin,
Kulîlk ser wan wer dikirin.
Dewsa bûkê, bira zava
Merixîbûn dirûk, dirûjka.
Fate dabûn serê bûkê
Bê hene bûn destê zava.
Xêlî, kofî, qolê zêra
Pêwîst nînbûn tu kesî ra.
Lê nekirbûn dêre, mêzer
Kavtî, tûman, pişt, bendê ser.
Morî, mircan, çarbisk, gevzeng
Xizêmên zêr, cûne, hevtreng.
Tew hatibûn bîrkirinê
Bibûn rewşa qurna dinê.
Bûk mînanî qareqîtka
Sekinîbû li ser çoka.
Hatî, çûya mêze dikir
Zorekê xwe xweyî dikir.

Bisk, keziyên reşe, zere
Cî dabûne “moda” dere.
Gijkê bûkê den kirbûn
Kejik, gewrik belek kiribûn.
Bûk, zava dans direqisîn
Carna heva diçilpisîn.
Dema tort hat, hev maç kirin
Kevçî devê hev va kirin.
Şerm ne mabû li wê derê
Miribûn erf-edetê berê.
Pîrek dizî digiriya
Ev dîdema mêze dikir.
Kalek ber wê digeriya
Ne dihîşt bigrî ew aşt dikir.
Piçûk jorê rûniştibûn,
Şûna mezna tew girtibûn.
Hemû kal-pîr mabûn devra,
Kesî fikir ne dida wan ra.
Min destê jêr xwe ra cî dît,
Ne hêvişand, pirsek avît.
Pira dengê min sih nekir
Hineka jî serê xwe bakir.
Çûk, mezin tev direqisîn,
Şam dihelyan, dibinisîn.
Dor bûk-zavê baqê gula,
Diheciqîn bin piya da.
Her yek bibû eslanekî,
Fişe-fiş bûn wek fîlekî.
Hişmetkar bûm vê ecebê
Dor min çû, hat temam dinê.

Hatî Kurd bûn, min Kurd ne dî
Çend zimana diaxifîn.
Eşq digotin, hewes, heyran,

Bîr kiribûn, gel û ziman.
Yekî ziktêr, kir hire-hir,
Nêzîk min bû, wek sekî dir.
Pir laf, pesin dane xune,
Destê xwe da porê mine.
Got: - Porê te sipî bûye,
Kalbûnê lap te dest daye.
Wî nihêrî, ketim fikra,
Terşê awa dijîn çira?
Got:-Dostê min, fikra meke,
Tu porê xwe timê reşke.
Min boy gel ew sipî kiriye,
Te zikê xwe mezin kiriye.
Yê nolî te barin dinê,
Gel ra tînin qetil, xwînê.
Hemû ji wan dibên bêzar,
Zû diçine ew qebra sar.
Ezê bijîm dewir, qurne,
Dû te pêçeke qenc tune.
Kesê qet te neyne bîre,
Nebên ku mir ew feqîre.
Meclîs dubar min mêze kir,
Sefîl, pejmûr zû ew terk kir.
Pêş çavên min bû dûmane
Ketim mitalê girane.
Li min pir bûn êş û tevzî
Çik bûn dilêm dirêş, derzî.
Got: - Wa be, wey, wey halê me
Wê unda be hebûna me.
Erf-edetê meyê bimrin,
Ji dîrokê ewê herin.
Beriya gotiye:
“Kûsî qalkê xwe derketiye,
Li qalkê xwe nebû xwediye”.

**DOMAMA KURD**

Pir nazikî, timtêşa te bedew tune,
Esil xasî, eslê te da tu telp tune.
Hurya qesra cinetêyî, kefîl heqî,
Hemû pesna, tew libasa tu layiqî.

Av vexwarye te ji sîngê Sîpanê sar,
Agriya kal berjêr bûyî, Nûh hatî xar.
Hîvê royê bedewtirî, xêlif tune,
Tu loxmanî, wek te loxman tu cî tune.

Gula terî, bahar, paîz, zivistana,
Wek te bînxweş, gul tunenin gulistana.
Bilbil şerma nakevine te ra leca,
Birca lêyî, kew nayêne ewan birca.

Çavêd belek dil-hinava dihelînin,
Zer kezyên te hiş û sewda cî dertînin.
Lêvên tenik tu, toxavka şevekêne,
Herd sûretê te al sêvê cinetêne.

Hingiv, qendî, nakevî ji ser zimana,
Rewşê didî tilî, pêciyên bilûrvana.
Zimanê te mehikiye tev şîrê dê,
Ev bedewî te ra daye reha bavê.

Rebbê jorîn, dergê xêrê ber te veke,
Ser axa dê hêlîna germ tera çêke.
Bextewar bî, tu jî nolî hevtangên xwe,
Lawa bibî dibistanê welatê xwe.

## KESTEK HALÊ KÊVİR GİRYA

*(Ji folklora gelê Kurd)*

Ro nediçû, sekinî bû,
Erd hemdî xwe hesa dibû.
Kevir nedikir tu talaşe,
Ketsek bibû bê hed doşe.
Remil davît hemû ciya,
Xwe dadanî serê çiya.
Bir kiribû, ku hatiye,
Çawa heva zeliqiye.
Pesin, berad, didan xune,
Bilind dikir eslê xune.
Bê hiş, vala hewal dida,
Tinaz dikir esilzada.
Digot:-"Dinya min çêkirye,
Esman boy min sekiniye.
Ev zor-zexma min da heye,
Rebb kesî ra ew ne daye.
Çi bixwazim, ezê bikim,
Çiya ji cî ezê rakim".

***

Nişkêva ewê demê
Tarîstanek hate xanê.
Ewra kirin gure-gure,
Rêtin hêrsên piçûk, gire.
Hev xuldirîn, birq avîtin,
Lêyî kişya, çem xuliqîn.
Kestek kêvir kûr mêze kir,
Hêdî dest bi giryê xwe kir.
Kevir mitheyr wî nihêrî,
Got:-"Dostê min çima digrî?
Qasek berê dikeniya,

Nika çi hat serê wiya”.
Zû ji wî kir pirs-hewale,
Bêje, ku hat te ra bela?
Çima wa zû bûyî melûl,
Çima ketî şîna zelûl?
Kestek kasil wî nihêrî
Got:-“Nevsa min boy te digrî.
Bi rewza min, dû baranê,
Tuyê îdî nayê xanê.
Ezê kê ra bibim tevgel,
Tev kê bikim, kar û emel.
Gav rojên xwe ça derbaz kim,
Naz, gazinên xwe li kê bikim?”
Kevir halê wî keniya,
Ber baranê neleqiya.
Got:-“Fikra min, mekişîne,
Mine ew baran zû da dîne.
Ber zexmê wê sekinîme,
Ça hatime, usan heme.
Tim dibarin ew barana,
Gelî, gepor, deşt, zozana.
Haj hewarên wê tim heme,
Min ne dîtiye, ji wê xeme.
Dostê delal, boy min megrî,
Xwe mêzeke, paşê bigrî.
Piçek boy xwe mitaleke,
Sitarekê xwe ra çêke.
Dest vekşîne lafên vala,
Nekeve nav çela, kola.
Erd, esmana ‘mehejîne’,
Bin sîkê da cî bibîne.
Yê nolî te dawiyê digrîn,
Dinya ronik îdî najîn”.

**
Esman vebû, tavê danî,
Gul, sosina vekir enî.
Tebîet şabû, keniya,
Keskesorê danî çiya.
Bêhna miskê misê hat her derê,
Her tişt xan bû nolî berê.
Kevir bê xem sekinî bû,
Haji bayê dinê nîn bû.
Kestek îdî ne
hat xanê,
Helya, maşya, ber baranê.
Kesê lafek hinek kefe,
Ber zor, zexma najî zefe.
Berya gotiye: "Ewil halê xwe mêzeke,
Paşê derheq yekî din da mitaleke".

# Hub û Hezkirin

## KEÇİKA RİNDİK

Bejna zirav sipîndare,
Hevek boy min bike xare.
Te bibînim çavê xune,
Bibî bûka dayka mine.

Baş nas bike hemû kesî,
Merhemet be, meke nesî.
Sihke dengê dilê mine,
Xwe hel bike bextê xune.

Xwedê firsend carek dide,
Aqilbend jê par hildide.
Bê fehm dibe, sêfîl, sêwî,
Li tu erda ew nagre cî.

Firsend buhur, qet mede dû,
Berya gotye: "Dû hatiya ra
Mitaleke, ecele, zû".
Weysêtên wan, dersin me ra.

## BEDEWA XWE RAZÎ

Gerden zera, gulî reş
Xuliqiyî tu boy min.
Were, maçkim çavên reş
Hêsa bibe dilê min.

Nazikî nolî Zînê
Dîtî nabuhurin te.
Egîtî mîna Eyşê
Ezim kefîldarê te.

Kulîlk xemla tebyetêne
Pêş te bejnê ditewînin.
Wek xezala bedew tune
Ew jî wek te cindî nînin.

Qed-qamet ne daîm milke
Ew çawa tê, usan diçe.
Nav û namûs, wek neynûke
Telp ku ketê, îdî naçe.

Rebbê jorîn şikir bike
Ev bedewî kir para te.
Edetê xwe xweyî bike
Telp nakevin ser navê te.

## DOTA KURD

Ez ji te ra av nabêjim,
Tu ji avê zelaltirî.
Ez ji te ra gul nabêjim,
Tu ji gulê pir bîntirî.

Ne cewahir, ne lel-durî,
Tu ji wana bahatirî.
Hingiv nakim hemberî te,
Tu ji hingiv şirîntirî.

Ne ro, hîvî, ne stêrkên dûr,
Ne cem-kanî, ne berên kûr.
Kulûr-kulûr benda yekî,
Bê hemberî, hebûnekî.

Xuliqiyî ji qudretê,
Kesk, sor û zer bejna te tê.
Haveynê te nişa xase,
Eslê teyî dinê nase.

Dîtî dibin te hişmetkar,
Wek te tune nazik, kubar.
Rebbê jorîn hewesa xwe,
Neqişandî bi destî xwe.

Şîr daye te dayka mêrxas,
Rinda ra çi xemil, kiras?
Ça hatiyî, usan heyî,
Xanım, xatûn, bijareyî.

Biska berde, gulya şeke,
Çav û buriya tu kil meke.

Reng hilnade dêmê alav,
Tu bedewî, bê misk, gulav.

Kedkir dayîk, him şervanî
Melheme ser birînanî.
Namûs, xîret tacên teye
Kurd, Kurdistan xemla teye.

## HEY BÊ ÎNSAF

Emrê xwe da min te hez kir,
Te bersîvek neda mine.
Tim libasê hubê xwe kir,
Neketî nav ruhê mine.

Ber dergê we bûme dîlek,
Nenihêrî te li mine.
Pêş huba min çiya bûn hevek,
Hejiyan, heliyan tevî mine.

Nişa hubê dîlê te da,
Gelo, çima cî-war nebû?
Ez kewgirîm halê xwe da,
Yalê te da tiştek ne bû.

Kê ez dîtim, tu lomandin,
Nevsa te dan ber şûr-qema.
Kîn û kudret te ra şandin,
Gira girtî, heta qewma.

## EZ Jİ KÊ RA HAY, EZ Jİ KÊ RA?

*Mehemmedê Ûsivê Biro û helala wî Zadîna Evdoye eslê xwe va Kurda Êzîdî dema ciwaniya xwe da hevdu hez kirine. Temam yasayên olî alt kirine û hevdu stendine. Dîlana da wana ev herdu rêzên qîmetbiha stirane. Mehemmed ser govendî kişandiye, Zadinê dû govendê stiran hevdu vegerandine û reqisîne.*

*Heya nika jî nav êla me da ev herdu rêz (xet) têne bîranînê. Lê kilamê (stiranê) gişkî kesek nizane. Çimkî mirovên wî heyamî hindik mane. Wana jî kilam îdî bîr kirine. Ser bingeha van herdu rêza (xeta) min ev helbesta nivîsî, rewayî ruhê wan kir. Bila ruhê wana ra eyan be, wekî huba wane nolî ava zem-zemêye zelale, bê telp dijî û çawa mînak tê wekilandinê. Hezar, hezar carî rehma xwedê li wan be. Hika jimara kur, keç û neviyên wana sî derbaz bûye. Ewladekî wan Eylaze. Ew nav êla me da xwediyê qedir û qîmetekî pir bilinde. Ew hemû xêr û şerên êlê da nolî ciyakî disekine.*

KÊÇ:
Ez ji kê ra hay, ez ji kê ra?
Bok, berano, şêr lewendo,
Ez ji kê ra hay, ez ji kê ra?

XORT:
Tu ji min ra hay, tu ji min ra
Kew, bilbilê, qaz, qulingê
Bêjn bilindê, enî keverê
Tu ji min ra hay, tu ji min ra

KEÇ:
Ez ji kê ra hay, ez ji kê ra?
Namil peno, simêl reşo,

Ez ji kê ra hay, ez ji kê ra?

XORT:
Tu ji min ra hay, tu ji min ra
Poz xizêmê, guh gaharê
Çav belekê, gerden gazê
Tu ji min ra hay, tu ji min ra.

KÊÇ:
Ez ji kê ra hay, ez ji kê ra?
Rind çelengo, aqilbendo,
Ez ji kê ra hay, ez ji kê ra?

XORT:
Tu ji min ra hay, tu ji min ra
Gulî reşê, sûret sorê
Zar şirînê, lêv hingivê,
Tu ji min ra hay, tu ji min ra.

KEÇ:
Dayka xwe qaîl bike,
Bila min bûk qebûlke.
Ezê destê wê maçkim
Dilê wê da xwe cî kim.

XORT:
Dayka min qaîl bûye
A, zûda hîviya teye.
Deme, îdî mal derê
An na bêje, an êrê.

KEÇ:
Ez qaîlim, çelengo,
Meke hewar ne dengo.

Were bigre destê min
Ku dixwazî, bibe min.

HEV RA:
Em herin welatê xwe
Têr bibînin axa xwe
Wir çêkin germ hêlîne
Hesret dil da nemîne
Em hevra hay, em hevra.

# Şîret

## KURÊM, QENCÎ UNDA NABİN

Tu ketiya ji cî rake,
Xatrê xwedê lê sitarke.
Wedê ketî tengasiyê
Tewê bêjin ewî nake.

Qencî namre, hergav dijî,
Hene qotê vala, tijî.
Qotê vala heye, tune,
Qotê aqil, timê dijî.

Qencî destê tewa nayê,
Pir pêwîste şîrê dayê.
Şîrê dayika ku paqiş be,
Qenciyê wê timê hebe.

## KURÊM, BİGRE RİYA RASTE

Lawo, dirav pir pêwîste,
Bê diravî tim çav deste.
Boy dirav xwe darda meke,
Eslê xwe tu unda meke.

Wekî hebin bext û kemal
Diravê xwe bikişe mal.
Xwedê ku ew nedane te
Ew venake dergayê te.

Dirav emre, roja geşe,
Bê diravî, tim rû reşe.
Dilî xofî, pê sirûke,
Boy parî nan dibe çûke.

Dirav du piya tê deste
Yek xirave, ya din raste.
Rast te dike şêr, mêrxase
Xirav dike rût, pêxase.

Dirav ruvî dike şêre,
Qelsa dike “esilmêre”.
Qazanç kirin pir cefaye,
Çetin xerçkirina wiye.

Bêaqila dîn, har dike,
Wek asîman bilind dike.
Merîfetê jê distîne,
Dawiyê zexm dizêrîne.

Kurêm, bigre riya raste
Wê rê çûyî qet naweste.

Ew rê şeref, bilindaye
Nav deng, hurmet, merivaye.

**LAWO**

Xelateke xwedê heye
Ev şerm rûyê bendê wiye.
Cem kê ku ew hat hildanê
Ew çawa kes nayê xanê.

Îdî dibe zil piçûktir
Hesab nabe, ew tu car gir.
Kes selamê nade wiya
Dibe pînê binê piya.

Hemû ser wî qelfa dikin,
Pê dikenin, xwe dûr dikin.
Ew kesî ra pêwîst nîne
Mervayê ra telp dimîne.

## PÊWÎSTE, WEKÎ HER KES ŞÛNA XWE DA RÛNÊ

Beg dimîne timê bege,
Ew eslê xwe unda nake.
Xulam çiqas rûnê jore,
Wê hol bibe, were jêre.

Wê hewalde bade, vala,
Dest bavêje, hemû hêla.
Pesin, metha, bide xune,
Eyan bike, eslê xune.

Pirsê bide, bersîv nade,
Çerxê wê tim çep, xar, bade.
Siya wiye weke mûye,
Qenc nevsê da cî ne bûye.

Armanca wî şer û dewin,
Hemû tiştî faş dibîne.
Dilî tijî birîn, kewin,
Wek xwe kesî baş nabîne.

Ça hatiye wê, usan here,
Xeysetê xwe naguhere.
Wekî bijî hezar salî,
Karê nade ew tu gelî.

## XWELÎ Çİ YE?

Lawo,  xwelî milkê gire,
Herdu desta wê bigire.
Ew kesê ku bê xweliye,
Li tu dera nagre ciye.

Xwelî gotiye: “Bikuje min,
Behra xwe va ez sax kim te.
Wek ruhê xwe xweyîke min
Bilind bikim tim serê te.

Usa bike, dest te neçim,
Te dest berdayî, dû min neyê.
Pir gelekê boy min pevçin,
Heta hebin li dinyayê”.

Her pêciyê wê lel-dureke,
Bê wê jiyan nabe tu car.
Ew xezneke xwedê daye,
Wek wê xezne tune kubar.

# Çar xet
## (Çar rêz)

Delalê min, êl kişiya,
Êl lerizî, êl hejiya.
Qedrê êlê tu tim bigre,
Bê êl nagrî tu tu ciya.

***
Êl ronaya herd çavane,
Taqet, sebra mil, çokane.
Kesê êlê ku bîr dike,
Dibe hewcê nanê zike.

***
Êl kuda çû, pêra here,
Êwir, ewir, tev bigere.
Tew cefayê tevî êlê
Şirîn, şerbet, cewahire.

***
Êlê te tim bilind bike,
Nav-dengê te quloz bike.
Wekî êl ku te biêşe
Îdî ew te xweyî nake.

***
Şîrê dayê, wekî xas be
Ziyan nayê tu car jêye.
Berê darê temî, qesp be
Darê neyê jêkirinêye.

***

Serkar, wekî heyfî, baş be
Dewsê naynin yekî dine.
Ava kanyê ku ne şor be
Kanî nayê miçqandine.

***

Dinya fire, heq mêzîne
Xêr û guna dikişîne.
Zû û dereng firqî tune
Her kes para xwe distîne.

***

Çiqas bijî rûyê dinê,
Qet bîr meke vê gotinê:
"Qîztî, xortî gula geşe,
Katlî, pîrtî roja reşe".

***

Keda helal hingiv, qende,
Tu tişt wek wê, nabe rinde.
Destteng bîjî, xwe xweyî bike,
Eslê xwe qet unda meke.

***

Keda heram, mewte, jehre,
Ji wê timê tu dûr here.
Wê kes nejiye, heta dawiyê,
Bê behre, ça dara biyê.

***

Lao, welat şîv, şekire,
Tu qedrê wî bilind bigre.
Bê welatî, bê hêlîne,
Dûmeka da ew dimîne.

***

Ew mirovê xaşa te tê,
Tu berbirî wî be, pê-pê.
Amin nebe, bicerbîne,
Mehêle te bixapîne.

***

Wedê zarok ku tê dinê,
Wek neynûkê ew tê xanê.
Paşê emir ya xwe dike,
Fend û fêla, wî hîn dike.

***

Gul te hilda, wê bîn bike,
Zû navêje, pêpez meke.
Ew bedena cindîkêye,
Wedê xwe da ew jî jiye.

***

Nanê derya zik têr nabe,
Xuşkiya tendûr germ nabe.
Wekî gel ra rûnên hesêb,
Serokê wî gerek hebe.

***

Delalê min, ez te benî,
Her gotina meke menî.
Ev hişa ku hişê teye,
Wê biêşin li te penî.

***
Rind nas bike, bibe bengî,
Zû mekeve hezar rengî.
Bengîtiye pir girane,
Sêra xwe qet meke dengî.

***
Lawêm, rêkê bigre, here,
Armanca xwe venegere.
Ser giliyê xwe bisekine,
Nav emir da nebe qure.

***
Ulim timê behra kûre,
Tu ji wî qet nebe dûre.
Nezan her tim belengaze,
Bê îmkanî, pir kolaze.

***
Çav mekute malê cînar,
Zikê hûrka wê têr nabe.
Bibe comerd, bike qirar,
Qudûm bike, ji cî rabe.

***
Armanca xwe biqedîne,
Kesek te ra deyndar nîne.
Wekî bikî tu hereket,
Xwedê bide te bereket.

***
Kasivayî etiv nîne,
Bê qudûmî şermê tîne.

Hespê karkir nagre zenge,
Mêrê qenc dibe yek renge.

***

Ber nemêra merûm nebe,
Cesûr, egît, şereze be.
Mervê du rû tirsoneke,
Bê hurmetî, pêkenoke.

***

Emekê baş unda nabe,
Esilda xas xirab nabe.
Qanûna tebîetêye,
Şêr pîr dibe, merûm nabe.

***

Cemrê devê gê kirine,
Hemû hatî, tew jî çûne.
Aqilbend namirin, dijîn,
Dîna tiştek nehîştine.

***

Beg dimine timê bege,
Ew eslê xwe unda nake.
Xulam bibî hêla jore,
Wê hol bibe were jêre.

***

Çiqas jê ra hurmet bikî,
Ser destê xwe xweyî bikî.
Delal bigrî, bixelî ber,
Firsend ketê wê here der.

***

Esla wî da çi ku heye,
Nikarî wî biguherî.
Ber deriya nan xwariye,
Dibe padşa, nabe meriye.

***

Hatiyê herin, ev eseye,
Kes namîne li dinêye.
Ezrail hat ber derê te,
Gerek pê ra bê rayêye.

***

Xwedê meriv ku xuliqad,
Cefê mezin sipart loxman.
Wedê merez benda ra şand,
Got loxmana: bike derman.

***

Lawêm, dinê mêze bike,
Kevnî başbe, teze bike.
Mirvên xirav tim dûr here,
Har pir najî, jê vegere.

***

Dinya fire heq mêzîne
Xêr û guna dikişîne.
Zû û dereng firqî tune
Kê çi daniye, wî hitlîne.

***

Şûna şînê qet mekene
Biaxife pir girane.
Wekî zarê te nû derên
Tew pêwîstê te bibihên.

***

Avekê ra kes du cara derbas nabe,
Emrê xwedê heqe, ferze, çare nabe.
Bedesilî mêraniyê gelek dûre,
Pesin, metha ew tu cara egît nabe.

***

Dinya fire tijî dibe, vala dibe
Emrê rebbê jore, gerek usan bibe.
Esilzade tu car namre, tim dimîne
Xwedê xelat boy bendê xwe, wan dişîne.

***

Qijikê xwest mîna qazê tim bimeşe
Pî avîtin, hemû bûne çep, xar, şaşe.
Wê fehm nekir esil, esas nayên kirin
Rebbê jorîn wê ra daye tenê qirîn.

***

Roja fire gelek dibên, dostê te me
Qet metirse, ezî piş te sekinîme.
Dema giran xwe fit dike, zû direve
Nav xelkê da te ra dibê, dûrîm here.

***

Mal-dewleta xweye pir va qerix nebe
Nebê ezim, hene destê ser desta ra.
Çiqas heye, wek wê bila dîsa hebe
Bibe comerd, wê xerc bike gelê xwe ra.

***

Sekê ketî meleqîne, jê vegere
Pêpez meke, meleqîne, jê dûr here.

Kengê leqya, wê har bibe pê nikarî
Îtbar tune kes venake pêş te derî.

# Jİ BO ZAROKAN

**HEJMARAN**

Yek û dudu, sisê, çar.
Çûme warê meyî par.
Dît keweke gewre jar,
Ketî bû bin kevrê xar.
Dest avîtê, kir pirîn,
Çûçika dû kir qîrîn.

Pênc, şeş, hevt, heyşt, neh û deh,
Çûme bin dareke reh.
Dît bilbila gerden zer,
Qûtê çûçka dabû ber.
Destê xwe min danî ser,
Firî destêm derket der.

Yanzde, danzde, sêzde, çarde,
Çûme koşka bilind, rinde.
Dît kurekî cindiyî gir,
Em hevdu ra bûne hogir,
Kewkam hilda, wî xwe ra bir.

Panzde, şanzde, hevde, heyjde,
Çûm kaniya sere gunde.
Xwest dilopek av jê vexwim,
Mezin bibim, heyfa derxim.
Dilop şabû, got: Xêr hatî,
Tu min vexwe, nemîne tî.

Nozde, bîst, bîst yek, bîst û du,
Dît xezala pir suru.

Xwest bigrim, timarkim,
Pê şabibim, jê hezkim.
Wê ez dîtim, revî çû,
Karik mikyan dane dû.

Bîst sisê, bîst çar, bîst û pênc,
Dît şêrekî zexm, sênc.
Sekinî bû wek çiya,
Min xwest herim cem wiya.
Xwe firfitand kire nirîn,
Tew terewil ji wî revîn.

Bîst şeş, bîst hevt, bîst û heyşt,
Tev bavê xwe dikir geşt.
Dît zaxake vala, sar,
Zer, zinarê gire, xar.
Çivîkekê kir wîtîn,
Wê ez dîtim, kir pirîn.

Bist neh, sî, sî yek, sî du, sî sisê,
Berjêr bûme nav Qersê.
Dît kulîlkên kesk, sor, sipî,
Lê sekinîm, min ne avît pî.
Xwest livekê hildime dest,
Destêm lê ket, xar bû, şikest.

Sî çar, sî pênc, sî û şeş,
Gihîştime bera reş.
Dît masîkî rev-revok,
Çûçkanokî şim-şimok.
Xwest bigrim wî rihet,
Şimitî destêm derket.

Sî hevt, sî heyşt, sî neh, çil,

Çûme nava baxçê gul.
Kalê min girt destê min,
Gulek hilda zû da min.
Got: - Vê gulê hilîne,
Bê min hilneqetîne.

Çil yek, çil du, çil sê, çil çar,
Karka kalêm gura xwar.
Bavêm dû ket, bikuje,
Xwîna wiya birêje.
Dest avîte tivingê,
Ew venebû, wê hingê.

Çil pênc, çil şeş, çil û hevt,
Kalê min darê da ket.
Pîra min kir îskîne,
Dayikam min kir qîrîne.
Kalêm rabû ser piya,
Pîram nihêrî, keniya.

Çil heyşt, çil neh, pênç, pêncî yek,
Birêm nan xwar, pê bû deq.
Dayikam ser wî pir hêrs bû,
Kevir hilda kete dû.
Birêm revî ket gomê,
Wî  hewar da tew zomê.

Pêncî du, pêncî sisê,
Çûme mala xwişk Asê.
Da ber min nanê lawaş,
Tasek avsîra tem xweş.
Xwar, vexwar, nemam birçî,
Hat kalekî henekçî.

Pêncî çar, pênc şeş, pênç hevt, pênç heyşt,
Nav sorgula kire geşt.
Gulek hilda destê xun,
Gulvan revî, hat cem min.
Got: - Wê gulê hilneke,
Avê bide, mezinke.

Pêncî neh, şest, şêst u yek,
Kevotk firîn ma livek.
Min hilda ew mehez kir,
Baskê wêya mehlem kir.
Destêm derket kir pirîn,
Kete nav esmanê şîn.

Şêst dudu, şêst sisê, şêst çar,
Sêvek xorda hate xar.
Min girt ewa nav hewê,
Nehîşt bikeve erdê.
Neşûşt, dizî ewa xwar,
Zikêm êşya bûme jar.

Şêst pênc, şêst şeş, şêst hevt,
şêst heyşt, şêt neh, şêst hevtê,
Çûm derketim nav rastê.
Dît gurekî guh mîçik,
Ruvîkî dêl, ne çûçik.
Wan ez dîtim, feriqîn,
Dû keriya herikîn.

Şêst heşt, şêst neh, hevtê,
hevtê yek, hevtê dudu, hevtê sisê,
Ketime rêke, tengasê.
Xwest hevekî hêsa bim,
Avek vexwim, hê rabim.

Dît hespekî çalî, reş,
Siwar bûm, kêfa min bû geş.

Hevtê çar, hevtê pênc,
hevtê şeş, hevtê hevt, hevtê heyşt,
Cîkî nenas min nehîşt.
Geriyam, kolan, bajara,
Hogir dîtin min xwe ra.
Feto tewa baştire,
Çav belekî, poz gire.

Hevtê neh, heyştê, heyştê yek,
Geriyam, nehîşt min derek.
Dît dareke tijî rez,
Revîm çûme cem wê ez.
Min rezê wê têr xarin,
Darê gotem pir werin.

Heyştê dudu, heyştê sisê, heyştê çar,
Şev, ro barî berfa sar.
Kewroşka min qifilî,
Mine ew revand her alî.
Dît kolikeke rinde germ,
Kire wir da, rûnişt cem.

Heyştê pênc, heyştê şeş,
heyştê hevt, heyştê heyşt, heyştê neh,
Çûm bin dara rîçal, reh.
Xwest hinekî hilkişimê,
Wir mêzekim li dinê.
Darê tev min vekir zar,
Got: - Xwe bigre, nayê xar.

Nod, nod yek, nod dudu,

nod sisê, nod çar,
Pişo kewoka min girt, xwar.
Şivek hilda min da dû,
Revî kete bin sêr zû.
Daykam got, ew guneye,
Suç hemû sucê teye.

Nod pênc, nod şeş, nod û hevt,
Xezal revî kete kevt.
Dû wê ketim ez kevtê,
Min destê xwe avîtê.
Wê ez dîtim, hejiya,
Kire kalîn, qûjiya.

Nod û heyşt, nod û neh, sed,
Xwezil, biçim ez Serhed.
Ter bigerim axa dê,
Maçkim, maçkim her derê.
Wir bimînim, kal bibim,
Xwedî mal û hal bibim.

**KURKÊ MİN**

Hacan, hacan, hacanê,
Kurkê min çûye Wanê.
Riya Wanê mexmere,
Kurkê min diçe sere.
Digere warê bava,
Ez heyrana dev, lêva.

Hacan, hacan, hacanê,
Kurkê min çû Rewanê.
Dimeşe nolî şêra,
Mêr dikevin ji mêra.
Têr veduxe ava sar,
Kurkê minî kaw, kubar.

Hacan, hacan, hacanê,
Kurkê min çû Astanê.
Hînbe ulma dinyayê,
Karê bide merivayê.
Ketiye nav baxçê gula,
Dide keçka sorgula.

## NÛRXANÊ MİN

Nûro-Nûro, Nûrxanoko,
Qend, hingivo, çûçanoko.
Piçik piçik pî bavêje,
Nan, ava xwe tu merêje.

Dayik te tim mehez bike,
Bavo gelek te hez bike.
Letoş nanê te biçîne,
Qadir te pir bihevîne.

Bibe xortekî mêrxas,
Welatê xwe bike nas.
Pesin, metha mede xwe,
Qet bîr meke, kalê xwe.

# REWAKİRİN

## DAWÎ EVE

***Knyazê Îbrahîm, zanyarê eyan, Kurde xas, hevalbendê nebîrkirî.***

Gelek gav-roj hatin û çûn, rêçên wan man,
Xwe nîşandan, nolî avê bûn çem kişan.
Him bûn hogir, him jî bûne edû, neyar,
Ruh, cesedê min vejendin wek gurên har.
Min ji wana gelek hilda, wana ji min,
Cefa kışand, behra xwe da emekê min.
Ro, şev kir yek, wekî emir paş nemînim,
Vekim dergê ulmê tarî, dûr bibînim.
Bûme avjen, serav, bin av, boy min bûn yek,
Bahar zû çûn, zivistana hîştin rêçek.
Dûr bû nêzîk, didu bûne sisyê sirûk,
Qamet bû xar, qerefat bû xêlek piçûk.
Pişt mêl bûye, por weşyaye, diran çûne,
Naz-bedewa êwir ser min guherîne.
Pî westyane, guh nabihên, dest dihejin,
Hizî dikim, çok sist bûne, dilerizin.
Gul çilmisiye, av miçiqiye, çem nakişe,
Hevt reng min va têne xanê tenê reşe.
Bilbil gulê dûr ketiye, gul bê bîne,
Paîz hatiye, zûda çûye geş havîne.
Dest davêjim, tiştek destê min va nayê,
Tew ezayêm îdî min ra nayên rayê.
Xeyîdîne, nabin hogir, dûr dikevin,

Belg zer bûne, dadiweşin, xwe dikevin.
Hatî çûne, mêrxas, hafat pir kêm mane,
Der-dorên min vala bûne, nenas mane.
Mêze dikim dost, hogira, ez nabînim,
Car-carana, rêç, ewledên wan dibînim.
Dîn tebîet ça dixwaze usan dike,
Kesên baş ra hezar sal jî pir hindike.
Dawî eve, kes nizane çiyê bibe,
Kiyê here, kiyê bijî, kiyê rabe.
Însan xemla rû dinêye, berê-berda,
Bê rebbê jor, tu fermanek nayê jor da.
Emrê xwedê boy tew benda heq, eseye,
Axê çêbûyê, têkeve nav axêye.
Birê delal, çiqas bijî rûyê dinê,
Agahdar be, qet bîr meke, vê gotinê:
“Qîztî, xortî gula geşe,
Katlî, pîrtî roja reşe”.

## KEKE EZÎZ

***Welatparêzê qedirbilind Ezîzê Zîyo Bedîrxan ra.***

Mêrê xasmêr, şertê dayî qet bîr nake,
Wî wede da diqedîne, hasil dike.
Tu serokê xas mêranî, gilî tune,
Te emir da, bilind giritye serê xune.

Her kesî ra nabe qismet, bêjn comerd,
Pir pêwîste cem wî hebe, xas merîfet.
Wê şerefê tu layîqî xêlif tune,
Gel bê sebeb, qîmet nade lawê xune.

Xwedê dinya daxuliqand boy me tewa,
Daye me da erş û kursî, ev av, hewa.
Hinek dinê kirinê xwe va dixemlînin,
Hinek jî wê kafkûn dikin, dihedmînin.

Navê te ra girêdayne, pir kirinên nûr,
Welathezî, dilovanî, gel nabî dûr.
Bi siya te gelek bûne mêr û tijî,
Qenciya te ji bîr nakim, tu car ez jî.

Heta kengê ezê bijîm ça mehpûsek,
Derheq min da fikir nake qet tu kesek.
Ev giranî rûniştiye ser milê te,
Qenc û xirav hev na jibêre kes weke te.

“Qedirê zêr, zêrger zane” gotiye beriya,
Din nikarin qîmet bidin tu meriya.
“Mêrok” pirin, ew nabine persenga te,
Berata min, wê bê stendin bi destî te.

## AXALİYÊ NÎYAZ RA

***Rewayêi 45 saliya ji dayîkbûna pismamê xweyî pir delal, Kurdê xas Axaliyê lawê Nîyaz dikim.***

Rojbûna te pîroz dikim
Lawê Nîyaz, Kurdê hêca.
Rebbê jorîn rica dikim
Te bibînim tim nav qenca.

Karê xwe da bê qusûr bî
Kîbûna xwe mekî bîre.
Wek neynûkê bê leke bî
Xeta, bela bibî dûre.

Nav jiyan da serfinyaz bî
Çawan bikim, qet nebêjî.
Boy gelê Kurd sî, sitar bî
Eslê bavê xwe navêjî.

Rihet bijî tu bi salan
Tev xwîşk, bira, xanima xwe.
Girkî torin Nîyaz bala
Bizewcînî wî destê xwe.

Ev dayina xwedê daye
Herkes nabe Axaelî.
Bapîra da mesel maye:
Alî te ke Hezret Elî.

## CEYRAN, KEÇ BİRA

Megrî, megrî, îdî bese, horiya delal
Şêlû meke, ewan çavê reşe zelal.
Beriya gotye: “Xwedê yeke, derge hezar”
Ewqasî zû, emrê şirîn nebe bêzar.

Rehma xwedê gelek pire, sebir bike
Te bîr nake, wê dergekî pêş te veke.
Tavî, teyrok tim nabarin, nabin seqem
Ro ku dertê, şemal dide dinya, alem.

Tîrêjekê ser te dayne tuyê germ bî
Qismetekê te peyda be, bê par nabî.
Gav, rojên te wê derbaz bin nav şayê da
Rozayê te wê nazil be ji xwedê da.

Kur û keçê li dora te herin, werên
Biaxifin, bixemilin, ji mal derên.
Tu tem, şirîn nînin weke temê lawa
Ro, hîv dertên, lê bê wede naçin ava.

## DOSTÊ MİN

***Melîkşa, dostê minî qedir bilind, şêst saliya te pîroz be.***

Nav mêra da tek mêrekî
Egît, mêrxas, lewendekî.
Zane, maqûl, merhemetî
Qedir bilind, pir hurmetî.
Hogirekî bê himberî
Dilpaqij û zehf tevdîrî.
Welat boy te ruh û cane
Kî tê dinê, ew mêvane.
Bijî gelek salên dirêj
Ji te dûr bin destên qirêj.
Xwezil, xwedê bide nisret
Dilê me da nemîn hesret.
Ez tu herin welatê dê
Defin bibin li Agriyê.
Cîkî quve, gelek bilind
Me va xuya bin bajar û gund.
Kur, keç bêne ziyareta me
Ter kulîlka daynin ser me.
Şêst sal, sed sal birê hevin
Ew dimeşin timê tevin.
"Wekî mejî tu sed salî
Boy wê tu xwe gunekarî"[1].
Dilekî baristan.

[1] Ji Osman Sarivellî îqtîbas.

## GULNARA, BUKA MİNE DELAL

Paqijayî dayîneke
Rûyê merva sipî dike.
Her kesî ra ew hev nayê
Gerek xas be şîrê dayê.

Te ev hurmet dest aniye
Gihîştî wê bilindayê.
Şêmîka min pî daniye
Ser rastiyê, halaliyê.

Torê te da qusur tune
Eslê te da leke tune.
Hasil bûyî, bibî dayîk
Navê dayka bibî layiq.

Mêvanheze, berhêwanî
Qedir, zane, dilovanî.
Şîrê daykê te helal be
Emrê teyî şaya da be.

Sê gulên zêr me ra dane
Letîfe, Qadir, Nûrhane.
Eşq û şaya mala mene
Kulîlkên ber bîna mene.

Tev Elîyêm bextewar bî
Jan û êşa timê dûr bî.
Kur û keça bizewcînin
Nolî min nevya bibînin.

## NÛRHAN, PİÇÛKA KALKO

Pî bavêje, par dilê min
Qend, hingivê ser lêvên min.
Te eşq aniye mala mine
Wek eşqa te, şayî tune.

Eme zûda hîvya te bûn
Şikir hatî, em pir şabûn.
Pê, parên te pîroz bibin
Destên xirav ji te dûr bin.

Welatê xwe bihebîne
Boy wiya ruh nehêvşîne.
Welat, dayîk weke hevin
Ruh, beden hev cuda nabin.

Siya xwedê tim ser te be
Anegorî eslê xwe be.
Bibe dostê sêfîl, jara
Ne tewe pêş tu neyara.

## MEGRÎ, NÛRHANÊ MİN

Megrî, megrî Nûrhanê min,
Ez heyrana vî dengê te.
Eşq û şayî, xêr, bereket,
Te aniye nav mala me.

Eme zûda hîvya te bûn,
Dereng hatî, em pir şabûn.
Bibe serê sed mêrekî,
Qazanc bike baş navekî.

Riya teye, vekirî be,
Şûna teye çêkirî be.
Hergav rûnê destê jore,
Şêr û dewa bibî dûre.

Axa daykê bihebînî,
Xêr-şera wê dûr nemînî.
Kêr, kirnên te, gel pir şake,
Xwedê derga pêş te veke.

## TÊMİRÊ BİRA

***Ji bo hevtê saliya Têmirê Îbrahim.***

Xwezil dîsa vergeriya ew heyama
Ev hesreta dilê me da îdî nema.
Ez û tu tev bimeşyana li zozanê
Êla rengîn me bidîta Araşanê.
Têr vexwara ava kaniyên sare zelal
Têkira qûç, nanê dayka teyî delal.
Kek Îbrahîm li me bikra qelf, heneke
Bigota: birçîno, bixwîn, nan geleke.
Dost û pismam li dora me bicivyana
Malo-malo mêvandariya bigeryana.
Ser kevirê Şaxbilaxê sivre danya
Xurek biçûya dîsa nolî cem, kaniya.
Neltepe, Qizil Ziyaret mêze kira
Xerîvayî yekcar îdî me bir kira
Baranê lê kira çadira te dilop kira
Rojbûna te me li wira derbaz kira.
Rebbê jorîn rica dikim boy te sed sal
Welatê dê bibî kalikekî delal.

04.04.2011

## PİSMAMÊ HECA

***Rewayî şêst saliya ji dayîk bûna Hetemşahê Mehmedê Osman dikim.***

Birê delal, şuxlê xwedê kes nizane
Çiyê bibe, çiyê nebe, ne eyane.
Ew dipîve, dinivîse, xwe dişîne
Yekî Bakûr, yekî Başûr rast hevtîne.

Fermana wî kez nikare biguhêze
Hemû emra tek ew dide eynî, ferze.
Bext miraza ew cot dike, par-par dike
Xeleqa hev hildikşîne, îdî war dike.

Dema mirov dixuliqe, ku tê dinê
Li eniyê bextê wî tê nitrandinê.
Ewladên me wî kirin qisemetê heva
Got: - Bextwar bin, bê qezya bijîn teve.

Ew bûn sebeb ez, te bûne bira, doste
Nan, av û xwe me xwar, vexwar dilê raste.
Gulê teltir em ji hevdu neêşyane
Nolî bira tim tev çûne şîn, şayane.

Boy vê danê rebbê jorîn şikir dikim
Emrê dirêj te ra xwedê rica dikim.
Gav, rojên te bê xem, keder tim wa geş bin
Nevî, kur, bûk, malê te da têr tijî bin.

Tu, Mînare xanime nav wana da bin
Heyştê saliya te da emê hemû hebin.

12. 04 .2001

## REWAYÎ ŞÊXE PİR XWE RAZÎ DİKİM

Giran rabe, giran rûnê, şêxê min,
Tevî şuxlê cuda nebe, tacê min.
Çi dan hilde, şikir bike rebbê jor,
Gelek tişta mêze bike nolî kor.

Nav êlê da qedir, qîmet te dest aniye,
Zanê dînî, lewzê teyî pir cindiye.
Esil kivşî, ser eslê xwe bisekine,
Qelbê kesî meêşîne bê suç, gune.

Car-carana veke dergê tu fiqara,
Pirske halê sêwî, sexîr, bê sitara.
Tev zengîna pir nemeşe, wan dûr here,
Nava gel da tim ser bilind tu bigere.

Zar şirîna, amin nebe qet tu cara,
Yê nolî te wan hiştine tim şûn wara.
Hêla jorê ciyê xwe çêke, şêxê min,
Merhemet be, xwe nas bike, tacê min.

# POÊMA

**** Paşa û Belgîzar***
**** Çar emir, çar demsal***
**** Cemîle***

# Paşa û Belgîzar

Şaîr dewrê paş nemîne,
Riya emir şayî, şîne.
Xezna xwedê têr-tijiye,
Çi bixwazî, tê da heye.
Wir şandiye sê tiştê gir,
Bexte, ave, yek jî agir.
Bext ku raza, pey nekeve,
Ew hişyar bû, pê ra şabe.
Bext tel dibe, him jî şirîn,
Dibe mexmer, dibe sirîn.
Hineka ra hingiv, qende,
Hineka ra kul, xem, derde.
Qenc, xirava hev najbêre,
Zexm lê dide, ku ket bere.
Carna dibe tolanbazî,
Carna dibe, dirêş, derzî.
Kes nizane çiyê bibe,
Wê ça bijî, çiqas hebe.
Geh şa dike, dizêrîne,
Bersîv nade kirnên xune.
Hal-ehwala qet pirs nake,
Ça dixwaze, usan dike.
Him dikene, him digirî,
Sêrê nade ew tu merî.
Ciyê xwe da dilikije,
Geh radike, geh dikuje.
Tebîet dêye, xemil însan,
Bê îtbare, dewir, zeman.
Esman behre, ro, hîv, hogir,
Jiyan nabe, bê av, agir.

Ro şewqê dide vê dinê,
Hîv dikuje tarîstanê.

**
Agir şên dike, him jî xirav,
Dinê dike dojan, dolav.
Du agirê xwedê hene,
Herdu boynet bendê wîne.
Agirek timê dişewtîne,
Yê din eşqê, şayê tîne.
Tew agira heye çare,
Agrê hubê tune çare.
Venaêse heta qebrê,
Pêç dihêle rûyê dinê.
Gulistana dike pejmûr,
Mixenete, ji rehmê dûr.
Piyê wî ket li kî derê,
Pir girînge, ji wir derê.

**
Av, zeynete, ruh, jiyane,
Dinya bê wê wek zilane.
Nûr, zem-zeme, tiverike,
Erş û kursî paqiş dike.
Wek wê tu tişt zelal nîne,
Dinya ronik dixemlîne.
Mikanê em dijîn nave,
Parek zaye, sê par ave.
Gema wê dest rebbê jore,
Gelek zexme, gelek zore.
Gema wê ku piçek vebe,
Para zayê unda bibe.
Wê raweste rûyê dinê,
Tu tiştekê meyê xanê.

**
Xebat emre, edlayî zêr,
Meriv gerek najî bêkêr.
Pir dûr ketim, ji mexsedê,
Dîl jarekim pêş tebîetê.
Tebîet, pirin ewladê te,
Heq cinete, hemêza te.
Her yek dike curek kare,
Boy te tînin nûh bahare.
Dergûşekî paxila te me,
Pesindarê resmê te me.
Ez sond dixum, bi navê te,
Bilind bigrim, tim navê te.
Nebim xwînrêj, ne muvtexur,
Nekim qetil, ne jî kufur.
Tu bendê te meêşînim,
Boy mervayê şayê bînim.
Vekim pêlê dewir-zemana,
Binîvîsim pir destana.
Li rengê te reng zêde kim,
Kes, sor, sipî bejna te kim.
Qeweta xwe nehêvşînim,
Nîgara te bineqşînim.
Nefê bînim boy hemûya,
Qisê vekim emrê çûya.

**
Gelek sala, pir dewrana,
Hukum kirye bega, xana.
Zêrandine pale, gundî,
Qut kirine hemû zindî.
Roja wana reşkirine,
Ked-heqa wan tew birine.

Xas baxçên ter, çol, çolistan,
Boy wan kirne tew goristan.
Bircên belek, bajarên gir,
Çêkirine, firnaq û hur.
Xof nekirine rebbê jore,
Kirine şehîd xas, pispore.
Xwîn rêtiye sefîl-jara,
Qet nebûne xweyê para.

**
Bahar ku tê, berf dihele,
Baran erdê dike şile.
Bilbil gula dibin mêvan,
Dixemilin deşt û zozan.
Sosin, rihan dibin cînar,
Sorgul, sûsen dibin kubar.
Tav datîne best, bereka,
Keçik diçin bin darûka.
Gav, roj dibin şirîn, şerbet,
Bilind dibin qedir, qîmet.
Hemû hevra can dibêjin,
Ji zarê xwe dur dirêjin.

**
Ciyê zulum dibe zexme,
Unda dibe, nîgar, kexme.
Xirav digre rûyê dinê,
Qenc tu ciya nayê xanê.
Însaf, murvet tê hildanê,
Dîn-bawerî diçin dinê.
Zorbe dibin simêl pale,
Hejar dikin nale-nale.
Merivayî xeza dibe,
Zane zelûl, nezan şa dibe.

Însanetî dibe du par,
Parek hetev, parek fiqar.
Parek xwînxar, parek sexîr,
Parek zordest, qismek feqîr.
Dûvê dinê dirêj dibe,
Heya, hurmet unda dibe.
Cî rabûyî, dibê ezim,
Egît, mêrxas tenê ezim.
Fitla dinê dest min da ye.
Xwedê firsend min ra daye.
Derdora xwe mêze nake,
Ça dixwaze, usan dike.
Dibê dinê ne dur, zore,
Emir dike kesê zore.
Esil-koka xwe bîr dike,
Xwe wek çiya bilind dike.

***

Boy xatirê du tûnsiza,
Du sêfîla, belengaza.
Hildidim vî barê giran,
Huba wana bînim ziman.
Mehêlim bên bîrkirinê,
Vegerînim dubar dinê.
Riçim bikim emrê çûyî,
Kes nebîne wî cefayî.
Tew hezkirî cot bimeşin,
Şûnda neyên rojên reşin.

Wî heyamê qetil, xwînê,
Tifalek jî têye dinê.
Çavronkayê didin cînar,
Pir şadibin herdu hejar.
Dê-bav têne qirarekî,

Daynin navê wî piçûkî.
Li wî dikin navê Paşa,
Piçûk bedew, mîna çira.
Emer berxek serjê dike,
Der-cînara par-par dike.
Şikir tîne xwedê xwe ra,
Dibê, ev par te da min ra.
Bask vedide hetev dayik,
Vê xelatê bûye layiq.
Şev û roj boy dibin yeke,
Tev wî dike ken-heneke.

***

Roj dibûn meh, meh dibûn sal,
Dibuhurîn bi doz û qal.
Tunebûnê penc vedida,
Kesî guh kesî nedida.
Tewa dikir boy xwe kara,
Xwe ra bikin sî-sitara.
Emer rêncberê beg-axa bû,
Hajî rewşa dinê tune bû.
Kerî dibir deşta, çiya,
Dernediket nav meriya.
Emrê xwe da tişt nedîbû
Tenê hîvya heqê xwe bû.
Keri dihîşt cem hevala,
Şev dikete gelî, dela.
Xwe bighîne lawê xune,
Têxe nava dilê xune.
Nediwestya rê û dirba,
Fedî nedkir reşê şeva.

***

Hinek derde bi dermanin,

Hinek derde bê dermanin.
Wey wî kesî bê îmkane,
Birge derdê, bê dermane.
Wê têkeve bin piyane,
Kesek nabe wî xudane.
Wedê guhast dinya xune,
Kes wî nabe goristane.
Dîtiyê wî dûr birevin,
Riya xwe ser biguherin.
Selamekê nadin wiya,
Danaynin wî dewsa meriya.
Wê nehêlin hewal bide,
Bersiva xwe rihet bide.
Kes naxwaze wî bibîze,
Wê nav lêkin, bêjin dîne.
Pismamê wî nebin xwedî,
Wê nas nekin çawa zindî.
Wan zengînek kengê dîtin.
Wê ji wiya qet neqetin.
Bêjin sitar me ra tuyî,
Xwedê zane, birê meyî.
Emir bike, em cî-warin,
Kê dixwazî, em cî rakin.
Tu şayîşa mekişîne,
Pişta te em sekinîne.
Wa gotiye gelek zana,
Bê dirav kes naçe xana.
Suryê mêre malê dinê,
Neyar dide rûniştinê.

***

Şev hatibû, gelek tarî,
Baraneke hûr dibarî.
Ewra zexim birq vedida,

Ronaya wan erd hildida.
Kelba carna dikir ewtîn,
Kihêl meneka dihat şihîn.
Şivana dixwar êvariye,
Hev dikirin laqirdiye.
Dengê gula şev hilçinî,
Bû zêrzebel, hat qîrîni.
Cerdê girte ser şivana,
Şîv nexwarîn, wan dêrana.
Li wan serda halê giran,
Komek nehat ji tu deran.
Talan birin, şivan kuştin,
Laşê wana erdê hîştin.
Xezal bê mêr, Paşa sêwî,
Li wan giryan, dar û devî.
Bû xulama mala axê,
Dixebitî nanê rokê.
Derda zor kir wê rebenê,
Pir nekişand, çû ji dinê.
Tewa karkir, vê mirinê,
Paşa sêwî ma li dinê.
Têmir ew bir mala xune,
Qebûl kir wek lawê xune.
Ber çavên xwe nedikir dere,
Mêla xwe zehf dabû sere.
Roj zû diçûn, meh dihatin,
Meh difiryan, sal dihatin.
Paşa îdî gevre dibû,
Pir şereze bedew dibû.
Dîtiya digot, bavê xune,
Heyf, wî nedît, lawa xune.
Destê wiya dargirtibû,
Têmir pê ra firnaq dibû.
Serberjêrî, merîfet bû,

Pir rûnermî, xebathez bû.
Kesek ji xwe nediêşand,
Xwe hemûya zû diheband.
Destpêkê da bû dûajo,
Çola dima şev û roja.
Car carana dihat ovê,
Diçû cem birê Belgîzarê.
Wî Belgîzarê hev didîtin,
Awira dilê xwe digotin.
Xewle hevra çav dikirin,
Bê deng hevdu fehm dikirin.

***

Paşa, Ahmed dostê hev bûn,
Sêr, gotinên wane tev bûn.
Firaqê da nan dixwarin,
Bê hevdu av venedixwarin.
Ew kirnên wan wiya didît,
Tim kivş dikir, wekî nedît.
Rokê Paşa huner dike,
Xasteka xwe ber wî vedike.

***

Wedê zar ku têye dinê,
Hubê nayê qutkirinê.
Ew cî dibe nevsa wî da,
Dikeve nav xwîna wî da.
Piçik-piçik mezin dibe,
Digihîje, hê kivş dibe.
Ewil dayka xwe hez dike,
Hê ser bavê xwe mêl dike.
Hub, cahiltî birê hevin,
Nav emir da timê tevin.
Hub, genc dike dilê xune,

Nahêl derê qalibê xune.
Şaxa mezin, huba dile,
Nolî kanya dixulxule.
Mecrê dertê cî nabîne,
Ewil yekê dihebîne.
Paşê hez dike welatê xwe,
Bilind digre ji ruhê xwe.

***

Paşa hez kir Belgîzarê,
Ser gotina xwe nehat xarê.
Şabû dilê Belgîzarê.
Bû guleke dev baharê.
Paşa mehîşt bê bersîve,
Hubê per veda ro û şeve.
Paqiş, bê telp, dihat xanê,
Tev didîtin tîlandinê.
Ne didîtin kaş-kerîşe
Çiyê bibe, roja paşe.
Ahmed, Paşa pir mêzekir,
Dest bi ken û heneka kir.
Got:- Birayê minî delal,
Zanim huba teye zelal.
Ezî hîvya vê demê bûm,
Haji hemû tiştî hebûm.
Rebbê jor te were rehmê,
Dil bavêje keser, xemê.
Ezê derdê te dermankim,
Xasteka te eyan bikim.
Wî firsenda xwe fût mekir,
Ji haca xwe îltimas kir.
Ewe zûda dezgirtî bûn.
Hîviya dîlana xwe bûn.
Ew jî bibe alîkare,

Paşa bikin bexteware.
Got:-Haca min, nehêvşîne,
Dayka xwe pê bihesîne.
Boy huba herd gulê tere,
Mitaleke dil-cegere.
Bila bêje bavê teye,
Boy xatirê xwedê xweye.
Dîsa bike şuxulê başe,
Paşa ji wî qet meêşe.
Wê gilî da merd, merdane,
Caw gihande dayka xune.
Dayka delal, Sîsa hakim,
Gelek şa bû, ne got, nakim.
Wê mizgîn da helalê xwe,
Got:-Bicêrbîne qewata xwe.
Têmir şa bû, vê xastekê,
Got:-Xwedê bide min komekê.
Çend roj şûn va çû cem Fetî,
Armanca xwe tew gote wî.
Fetî şa bû, got bira can,
Ew keça min tera qurban.
Nîşan danîn Belgîzarê,
Dosta hêsir anîn xarê.
Gotin dê-bav hebûyana,
Xwezil ev roj bidîtana.
Dilê Paşa pir hêsa bû,
Destê Têmir maç kir, şa bu.
Paşa dubar hat guhastin,
Digot, komkim gelenê xun.
Şev, roj boy xwe kirin yeke,
Diçerçirî, mal beravke.

***

Rûyê sêwiya qet nakene,

Qezyak diçe, tê yek dine.
Werzebakî zexm cî rabû,
Ser genc Paşa ew peya bû.
Gavên şirîn bûn tel-jehre,
Paşa pir bûn xem kedere.

***

Gundê wanî ne mezin bû,
Li ser erf-edetê xwe bû.
Pareke gund diçûn çiya,
Dadianîn sar kaniya.
Dîlan diçû nava zomê,
Dihat dengê defê, zurnê.
Keç û xortê geşe, cindî,
Xwe kiribûn kesk, sor sipî.
Direqisîn gelekî şa,
Wan ra dihat eşqa dila.
Belgîzare nav wan da bû,
Xemleke rewş xwe kiri bû.
Pozî xizêm, guhe guhar,
Kezî jor da dihatne xar.
Dêre, mêzer, xevtanî sor,
Fîno, qotik, temerzî dor.
Zîv kembera more, monik,
Zende bazin, qirke zerik.
Gişka hevra dikire şer,
Bejna tîtal, kulîlka ter.
Çav têr nedikir wê mêzekî,
Kîjan lewzî pîroz bikî.
Xorta pir wê dinihêrîn,
Awirên xwe ne diguherîn.
Her yekî wan dilê xwe da,
Digot:-Xwedê ewa bida min da.
Hesen beg hatibû wira,

Dinihêrî nolî gura.
Hemû pêş wî dilerizîn,
Ciyê xwe da ditevizîn.
Nedixwastin wî bibînin,
Xwe ber çavên wiya xînin.
Wî nişkêva Belgîzar dît,
Dilê wî kir çirpîn, avît.
Got:-Ya rebbêm, bawer nakim,
Kîjan çavî wê mezekim?
Roye waye, ew çi roye?
Hîvê pêş wê sucde da ye.
Çi qesrê da ew wa jiye,
Kîjan bircê berjêr bûye?
Xizmetkarêk ban kir cem xun,
Got:- Cawekê zû bide min.
Bê ew keça ku hatiye,
Dota kîjan dê-baviye?
Xulam pirsî kesên derva,
Cawa xêrê anî wî ra.
Got: - Begê min, fikra meke,
Hîn bûm kiye ew rindike.
Ewa dota Fetiyê kine,
Naguhere, ruhê xune.
Çavên beg lê bûne tase,
Qirarê xwe wir kir ese.
Got: - Nahêlim, ew bedewa,
Xênîm bike, ew tu kesa.
Çend roj şûn va ban kir Fetî,
Armanca xwe eyan kir wî.
Got: - Min keça te dîtiye,
Hiş, sewda min lap firiye.
Çavên belek kaniyên durin,
Sûretê wê sêvên sorin.
Bejna zirav minareye,

Horya qesra cinetêye.
Lêvên tenik toyê sibê,
Çi li wêkî, bejna wê tê.
Kew-bilbila per hêşîne,
Wek wê cindî min nedîne.
Şikir-şikir hezar carî,
Xwedê daye te ew horî.
Ez wê nadim yekî dine,
Ew layiqî nevsa mine.
Fetî hêrs-hêrs wî nihêrî,
Zû-zû şûna xwe guherî.
Got: - Keça min dezgirtiye,
Mirazê xwe zû da dîtiye.
Gotina te boy min nîne,
Tu hevtangê xwe bibîne.
Fetî bû masiyê avê dere,
Li wî pir bûn xem, kedere.
Zor û bela gihîşt male,
Bû xestekî pir bedhale.
Ban kir Têmir hate cem wî,
Armanca beg tew gote wî.
Herdu pir dirêj hewaldan,
Gelek danîn, hindik hildan.
Herd hatine qirarekî,
Wî nebêjine tu kesekî.
Gazî kirin cem xwe Paşa,
Xwesteka xwe gotin wî ra.
Beg hers bûye, digirije,
Wê kela xwe zexm birêje.
Riya xilazbûnê yeke,
Tu vê çarê emel bike.
Dest pê dibe agirekî gur,
Belgîzarê bive ji vir.

***
Şeve reş û pir tarî bû,
Ro jî wedê xwe da çûbû.
Piçûk ketibûn xewa şirîn,
Novedara dikir qûrtîn.
Çîrokbêja laf dikotin,
Pira mêvan rêdikirin.
Dayka zû da cî danî bûn,
Bûka perde kişandibûn.
Çivîka şevê dikir wîtîn,
Seka hêdî dikir ewtîn.
Reş girtibû rûyê dinê,
Tenê rengek dihat xanê.
Ewra esman hemêz kiribûn,
Hîv, stêrka xwe veşartibûn.
Zinge-zinga zenglê nêrî,
Dixemiland şeva tarî.
Hemû bînber hêsa dibûn,
Boynet sibê hazir dibûn.
Fetî bankir cem xwe Xelîl,
Got, nisla me nebûye dîl.
Barê giran kete ser te,
Vî şuxulî dispêrime te.
Tu here cem xwîşka xune,
Biqedîne emrê mine.
Destê wê têke destê Paşa,
Bila herin ew ji vira.
Mêrxas Xelîl ewê şevê,
Paşa ra da cawê: revê!
Destê wan kir destê heve,
Got: - Bimeşin ro û şeve.
Hev hezkiriya ewê şevê,
“Ya Rebb” gotin, ketine rê.
Hevdu şabûn, tev keniyan,

Êwir, ewir cot meşiyan.
Çend menzîla wir dûr ketin,
Zaxekê da kûr raketin.
Ketin nava xewa şirîn,
Piçek bibûn ew arxayîn.
Nizanibûn çiyê bibe,
Sibê li wan çawa ron be.

***

Cawa nebixêr dane bege,
Xwînxar qîjiya wek hirceke.
Ew nişkêva rabû piya,
Nolî dîna babû, hejya.
Hemû dîtin wek mûrmûrka,
Teherî da mezin, çûka.
Simêl lê bû bijyê hespa,
Çav derketin ji heqera.
Tolan çû-hat nav malê da,
Difetisî qalbê xwe da.
Bû gurekî devxwîn û har,
Rûkir, pîva, kire qirar.
Ban kir xulam, xizmetkara,
Got: - Fitê medin rûhê wî ra.
Li ku hebe, zû bibînin,
Rêke nehat wî bişînin.
Belgîzarê nedin bavê,
Nîşan nedin ewê ovê
Yekcar bînin mala mine,
Bila naske mêrê xune.
Du roj şûn va xizmetkara,
Bê însafa, qetilkara,
Sexîr, bêkes Paşa kuştin,
Warê Emer vala hîştin.
Bedbext paşda vegerandin,

Nedît Paşa kuda şandin.
Dosta mekir tu culete,
Pêş zulmê man bê taqete.
Helyan, nalyan halê xwe da,
Kesî salxê Paşa neda.
Êl mitheyr ma vê ecebê,
Pira barkir çûn ji ovê.
Diperpitî Fetyê kinik,
Bedxeysetê hêrsî, dendik.
Nedihate tu bend, kapa
Digot, ezê qirkim gişka.
Begê fêlbaz çend rûsipî,
Boy lomana şandin çem wî.
Fetî dît ku feyde tune,
Da xebatê hêrsa xune.
Fersenda xwe neda bade,
Xast qelenê gelek zêde.
Ser her tiştî kire menî,
Çi xwest, kezav ew jî da wî.
Heta sedî hogeç û mî,
Du kihêlê li dû cenî.
Du, sê mange, çar gezyazme,
Cote gayê suru burme.
Çend bar genim, fêkî, birinc,
Ji Îranê anîn mewic.
Zêr û zewer bê hed, hesav,
Xelat, berat bûna sêlav.
Qelenê xurt hilda Fetî,
Heyfa xwe wa "derxist" ji wî.

***

Belgîzare şanzde salî,
Hesen begî pêncî salî.
Mele kebîna wan birî,

Yekî firot, yekî kirî.
Bû xanima bege çara,
Diheliya fikra, qara.
Hesen begê xwe naskir heq,
Boy van kirina nedît neheq.
Wî civandin dengbêj, defvan,
Tew sazbendê êlê eyan.
Dîlan kişand hevt roj, hevt şev,
Çav westiyan neçûne xew.
Govend diçû nava zomê,
Dengê zornê diçû dinê.
Begê harî, ne teîsî,
Sergovendî ne dida kesî.
Wek xortekî direqisî,
Elawetê mîna kûsî.
Geh Koçerî, geh Şiranî,
Terewilê pir beyanî.
Hinek bi wî dikeniyan,
Qismek pêş wî diheliyan.
Gelekî hêrs digeriya,
Dihurmujî diqîriya.
Ku bû wedê bûk anînê,
Siwar qure bûn ewê demê.
Bûk birin ciyê kivşkirî,
Tevî wê çûn xêlek merî.
Hevra ketine hucet, lecê,
Kiyê bîne balgiyê bûkê.
Wan kihêlên xwe bezandin,
Balgî destê hev revandin.
Yekî qure, belgî hilda,
Qamçîkî zexm hespa xwe da…
Berî tewa hate ovê,
Belgî gîhand mala zavê.
Bûk gihîşte ku ber dêrî,

Gurê pîr, sêv avît sêrî.
Tasek danîn ber sivderê,
Pî neda ser Belgîzarê.
Berbû rûnişt li sivderê,
Boy erf û edetê berê.
Şev hatibû, nexêr, xaşî,
Neketibûn kes nava cî.
Dengê gulê dil hejandin,
Dosta hêsrên xwîn barandin.
Ev dîlana qetil, xwînê,
Îdî hate seknandinê.
Sibe ronbû, begê hovî,
Diçû, dihat şa, çargavî.
Kesî tirsa hewal nedida,
Tenê dûr va selam dida.
Rojek dibû weke salek,
Kûr dihîştin gir, hûr, pêçek.
Hineka ra dibûn kêf, ken,
Hineka ra kul, derd û xem.
Ketî zane halê xune,
Sêrê nade yekî dine.
“Dil ne sivreye - got beriya -
Tu wî vekî ber hemûya”.

***

Şev hatibû gelek tarî,
Beg razabû, pir vexwarî.
Belgîzarê mitale kir,
Hilda-danî, ecele kir.
Derket ji nav ciyê xune,
Qeme hilda destê xune.
Nigande nav dilê xune,
Got: - Paşa nadim yekî dine.
Kezav rabû xewa şirîn,

Dît cinyazê kewa nexşîn
Nekir axîn, ne jî ofîn.
Heyfa wî hat malê dayîn.
Ban kir xulam, xizmetkara,
Got: - Wê têxin bin kevira.
Kesek laşê wê nebîne,
Boy wê tu kes meke şîne.
Gihîşt êlê eva cawa,
Tirsa kesek nehat wira.
Fetî tevî pismamên xwe,
Hildan, birin kesûka xwe.
Binax kirin cîkî bilind,
Hatne şînê êl, ove, gund.
Pêş wê serê xwe xar kirin,
Şehîda hûba ew nav kirin.
Tirba wêya kirin ziyaret,
Ji wê xastin îmdad, medet.
Berserê wê dar çikandin,
Qeytan, bendik lê alandin.
Gel êwirî ziyareta wê,
Fathe dane boy ruhê wê.
Keç û xortê wê herêmê,
Tewa sond xwar bi gora wê.
Pir Belgîzar hatin dinê,
Bûn nîşana hezkirinê.
Wa xilaz bû ev hikyeta,
Hezar, hezar lene bêye,
Bê şerefa, bê murveta.

**Mijarê vê poêmayê kengê û ji kê hatiye hildan?**

Wedê ezî 8-9 salî bûm. Pîredayka min Gewra Baloyê Hecîelî ev qewmandin min û xwişka mine Asiya ra zû-zû

qep dikir. Emrê wê 100-î derbaz bibû. Wê ronaya çavên xwe îdî unda kiribûn.

Em temam roja cem wê rûdiniştin. Me hemû gotinêd wê diqedandin. Wê ev qewmandin wa qise dikir: "***Ezê panzde salî bûm. Em gunda diman. Navê gundê me Borelan bû. Cimaeta gund hemû Kurmanc bûn. Bahar ku dihat cimaeta gund diçû zozanê. Hemûya pez û dewar xweyî dikirin.***

***Mezinê gund Hesen beg bû. Dewleta wiye bê hed û bê hesab bû. Jimara xulam, xizmetkarên wî kesî nizanibû. Boynet wî qayde, qanûn tune bûn. Kêfa wî çawa dixwast, usan dikir. Wedê ew derdikete nav gund, yanê jî nav zomê, geleka xwe jê vedişart. Gişk bangorî xwedê dibûn, wekî xwedê wî zû ji nav milet hilde. Zulma wî erd, esman hilda bûn.***

***Mala me û mala bavê Belgîzarê cinarê hevdu bûn. Mala bavê Paşaye hinekî ji malê me dûr bû. Min û Belgîzarê hevdura hevaltî dikir. Me sêra xwe hevdu ra digot. Ew salekê ji min mestir bû. Ew ji min bedewtir bû. Lê Paşa pênc sala wê mestir bû.***

***Wê û Paşa hevdu hezdikir. Paşa, Xelîl ra hevaltî dikir. Ew birê Belgîzarê bû. Paşa zû-zû diçû mala wan. Dê û bavê Paşa gelekî zû çûne rehma xwedê. Pismamê wane nêzîk tune bûn. Apo Têmir (hevalê bavê Paşa bû), Paşa bire mala xwe. Gelekî ji Paşa hez dikir.***

***Xêlek derbazbûnê şûnda dezmala Paşa dane serê Belgîzarê.***

***Rojekê gund da dewet hebû. Ez û Belgîzar jî çûbûnê dewetê. Beg jî hatibû dewetê. Belgîzarê sergovendî dikişand. Beg ew dît. Lê bû aşiq. Beg hîndibê, wekî ew keça Fetiyê kinike. Çend roja şûn va gazî Fetî dike. Belgîzarê xwe ra dixwaze. Fetî dibêje ku qîza mine dezgirtiya Paşayê kurê Emere. Beg hêrs dibe. Dîbêje: "Fetî, ew min pêştir nikare bibe jina tu kesî".***

***Paşa Belgîzarê hildide direvîne.***

***Beg çektarên xwe pey wan dişîne. Ew Paşa dikujin, Belgîzarê tinine mala beg. Belgîzar dibe xanima bege çara.***

***Şevekê Belgîzar qema beg hildide, dilê xwe da diçikîne. Dibêje: "Ez xênî Paşa, naxwazim bibime jina tu kesî".***

Pîrka min wê giliyê xwe kutakirinê şûn va hêsrên xwe paqiş dikirin. Destê xwe bilind dikirin, bin lêva va hewal dida. Me nizanibû çi dibêje.

Min ew qewmandina salên dirêj bîra xwe da xweyî kir. Boynet pêş ruhê pîredayîka xwe deyndar nemînin, ew hilda qelemê.

Bila hezar-hezar rehmeta xwedê Belgîzarê, Paşa û pîrdayîka min be.

# Çar emir, çar demsal

Barî, ewqas xema meke
Him jor, him jêr xwedê yeke.
Pir pêxember hatine, çûne
Pêş rebbê xwe zikir kirine.
Ferman dane bi dew, bi zor,
Nedane hev mecal û dor.
Xwedê wan jî hez kiriye,
Mêla xwe wan ne guheriye.
Mihemmed Elêyhî Selam
Xwedî lewze aqil, kemal.
Xwe ra resûl bijartiye
We wî kesî hez ne kiriye.
Her emrekî temek heye
Her fesleke navek heye.
Dinya ronik wa hatiye.
Ferman dayî tek xwedaye.
Şikir bike, rebbê jore
Dinya pêlekana xare.
Qewmandin bê menî nabin
Destpêbûn bê dawî nabin.
Geh dikevî, geh radibî
Geh şa dibî, geh şa nabî.
Rebb her merivî çar emir dayê
Her kesî ra ew hevdu nayê.
Emrê ewil zaroktiye
Emrê duda ciwantiye.
Emrê sisya ahiltiye
Emrê çar, ew jî kaltiye.
Hinek nîvcî dinê diçin
Eyan nîne boy çi diçin.
Ezraîl tim wan digere

Jê dûr naçe, venagere.
Dinya ronik diqetîne
Emrê  xwedê diqedîne.
Qismek dijîn heta dawiyê
Rebb dide wan hemû heyê.
Dibin xwedan qedir, rûmet
Dinya boy wan dibe cinnet.
Wek ziyareta dihebînin
Bejna xwe ber ditewînin.
Dû çûya pir nekewgire
Xem, mitala xwe dûr bigire.
Çûyî îdî paşda nayên
Dewsa wana kesê din tên.
Her kesî ber dora xune
Kes naçe, pêş yekî dine.
Ewir hergav na gurijin
Tavî, teyrok tim narijin.
Him tav dertê, him baran tê
Keskesor wede da dertê.
Emir dayî rebbê jore
Kes namîne ji wî dere.

**Beşa yekê**

Zaroktî emrekî şirîne
Wek wî tu tişt bi tem nîne.
Dinya bo wê tîlan, raste
Hime nerme, hime qespe.
Wedê ku tê nafikire
Ji neynûkê zelaltire.
Hûrik-hûrik pî davêje
Geh dişkêne, geh dirêje.
Na edile, nasitire
Leq lêdikevin, xwe digire.

Kêm dimeşe, kêm direve
Mezin dibe, him ro, şeve.
Sal tên, diçin, dibe bişkûr
Ji reca xwe dernayê dûr.
Tê heyamê, xwe nasiyê
Dorê dide ciwaniyê.

***

Ciwan ezim, ezim dibê
Dûr nakeve dozê, herbê.
Ew tu kesî fedî nake
Hev najbêre xirav, pake.
Şev, roj boy wî dibin yeke
Westyayî nabe çi jî bike.
Sîngê xwe tim dide pêşe
Hebûna wî xemil, rewşe.
Kûr û tenîsk xwe davêjê
Hahebîne kîn, qirêjê.
Dibê tu na, ez dizanim
Dewsa hemûya ezê herim.
Nahêle kes hewal bide
Şûna yekî deha dide.
Seyran, geşta pir hez dike
Himî nerme, himî rike.
Dîlan, şayî ruhê wîne
Gelek dibe, hindik tîne.
Pêş mezina xwe pak dike
Dilê wan da xwe cî dike.
Digihîje xwe nasiyê
Şûnê dide ahiliyê.

***

Ahiltî pir maqûliye
Nabe para her kesiye.

Zar şirîne, dil dewlemend
Diaxife hingiv û qend.
Kîbûna xwe bilind dike
Xirav nake, ava dike.
Dihêle rêcên hûr, gire
Qewmandina namîne dûre.
Şera, dewa, radizîne
Edilayê dihebîne.
Nav-dengê xwe bilind dike
Dergê şayê tim vedike.
Xeleqa hev hildikşîne
Dost, hogira dicivîne.
Meclîsa da diçe jore
Jê dibare gul û nûre.
Timê kom dike û tîne
Hîmê jînê ew datîne.
Hebûna xwe eyan dike
Xizmeta xwe kuta dike.
Deyndar namîne pêş kesiye
Nişa wê xwedê nasiye.
Bar dike bê dew û qale
Şûnê dide birê kale.

***

Dema ku tê emrê kale
Hindik dertê, ew ji male.
Neviya firnaq digerîne
Mêj, taqeta xwe namîne.
Şîn û şaya verê dike
Ulmê şerîf qise dike.
Boy axretê difikire
Destê ketiya tim digire.
Şikir bûnê diweklîne
Mirina heq tim bîr tîne.

Dil dixwaze, nikare bike
Kasil-kasıl mêze dike.
Xênî nêzîk, dûr nabîne
Dike hilde, zor tu nîne.
Diaxife bê bend, navbir
Devra boy wî dibe hundur.
Bê wî hildidin, datînin
Gelek tişta nahesînin.
Pirsa dide, bê caw dibe
Diqilqile, pir teng dibe.
Kaltî emrekî şirîne
Merez dest jê vekişîne.
Wekî here wedê xwe da
Wê bimîne nava dila
Gelekê wî tim bîr bînin
Navê wiya bikişînin.

**Beşa duda**

Çar fesilê xwedê hene
Her çar jî boy bendê wîne.
Fesla ewil nûh bahare
Xemil, rewşa rebbê jore.
Fesla duda germ havîne
Xêr û xeznê tev xwe tîne.
Fesla sisya zêr payîze
Nav fesla da pir ezîze.
Fesla çara zivistane
Rûsipiya tew birane.

Temaşeye ku bahar tê
Kubar, kubar dimeşe tê.
Ewil kurda gotiye Newroz

Bînber hevdu dikin pîroz.
Dixemile rewşa dinê
Tebîet ciyê xwe rûdinê.
Dinya pejmûr dibe ciwan
Hevşa dibin sosin, rihan.
Xezal dertên merg, çîmana
Kedkir diçin bax, bostana.
Bilbil gula dibin mêvan
Dixemilin deşt û zozan.
Kew dikakin awaz, awaz,
Teyrê sîmir dikin perwaz.
Quling têne ref bi refe
Hulgiz dibin qirav, berfe.
Erş û kursî tev şa dibin,
Hemû bînber xew radibin.
Kelekel dikeve axê,
Kurê pîrê tê ji zaxê.
Derê mala vêdixin agir
Tev şa dibin piçûk û gir.
Cem û kanî dikin xuşîn
Bayê sar, germ, dikin lîlîn.
Vedibin dergê seyrangeha
Mêvan têne mêvangeha.
Jiyan dibe şirîn, şerbet
Hemû der, qulç dibin cinet.
Ew dewra xwe diqedîne
Dû wê lez tê, germ havîne.

***

Oxra xweda didomîne
Pê-parê xwe eşq datîne.
Ked dikele hemû dera
Dêj xandikin li bêdera.
Şev, roj dibin birê heve

Qey dimeşin herdu teve.
Rez û fêkî digihîjin
Diwerixin, xwe dirijin.
Gele behir halî dibin
Sûk û maldizk tijî dibin.
Tebîet tê guhastinê
Pir çandinî tên çinînê.
Bînber xwedê dibin razî
Ya bext dibên dikin gazî.
Havîn emrê xilaz dike
Fesleke nûh dest pê dike.

***

Tê payîza zer zêrîne
Eşq û şayê tev xwe tîne.
Nivî dibe du parane
Parek sivik, yek girane.
Lez nakeve, hûr dimeşe
Têne holê rojên geşe.
Alem dibe dengil, dîwan
Her qulç, dera dibin dîlan.
Dengbêj, sazbend dinicrînin
Keç û xorta dizewcînin.
Ev emira pir nakişîne
Para giran pî datîne.
Geh baran tên, geh bayên sar
Tavî teyrok, tim têne xar.
Mij datîne serê çiya
Berf lêdike bilind ciya.
Merg û çîman vala dibin
Terewil tijî dela dibin.
Nayê dengê naz, cindiya
Keç naçine ser kaniya.
Şivan kerya naynin dana

Ban nakine bêrîvana.
Siwar nakevin hevra leca
Belgî naynin menekên hêca.
Koç vedgerin êwir, êwir
Nayên xanê roj, hîv, pêwir.
Seyrangeha kes namîne,
Dest pê dibe belgweşîne.
Avên tenîsk diqerimin
Gul, gulistan diçilmisin.
Hemû bînber dicedînin
Ruzê salê dicivînin.
Her yek boy xwe karê dike
Zêr payîzê verê dike.

**

Tê rûspiya çar birane
Pejmûr dibin erd, esmane.
Berf, teyrokê gur-gur tîne
Çi kete ber diqerisîne.
Xemla wêya tek rengeke
Cila sipî dinê dike.
Tew xwarina sivik dike
Hime hêrse, hime rike.
Hemû bînber wê hez nakin
Dost, hogiryê wêra nakin.
Ez, ew bûne birê heve
Qerqaş dikin nolî heve.
Mitala da diçûm dûre
Rojên çûyî dianîn bîre.
Gavê dawiyê hûr davîtin
Nav xema da wê ez dîtim.
Min wê hevdu pir mêze kir
Emrê çûyî hevra qal kir.
Got: - Însanê şîrê xav mêj

Wan mitala yekcar bavêj.
Ewqas nebe bê îtbare
Şikir bike, rebbê jore.
Îdî bibe birê mine
Piçek bijî tevî mine.
Her sê birêm te dîtine
Yek wa nîne nolî mine.
Xwedê sê meh min ra dane
Tê niqlandin navê mine.
Loma kes min nahebîne
Îtbara xwe bi min nayne.
Ku têm hemû pejmûr dibin
Dema diçim, tew şa dibin.
Ez rebbê xwe gazin nakim
Param ewe, ez çi bikim?
Bese bikî xem, xiyala
Dûr mekeve dost, hevala.
Xwedê aqil te ra daye
Emrê dirêj para teye.
Ça dixwazî usan dikî
Xirav dikî, ava dikî.
Tew ruhbera tu firq kirî
Ew bê zarin, tu zar kirî.
Jiyan boy wan tu tişt nîne
Armanca wan têr xwarine.
Min got: - Bira, înkar nakim
Ji emrê xwe gazin nakim.
Demên jan, êş min kêm dîne
Rojên eşq, şa gelek dîne.
Kaltî ewqas min kar nake
Dilê mine ew xirav nake.
Derdê min pir-pir girane
Kûrayê da wek okêane.
Welatê min tê pêş mine

Zingîn dikin guhên mine.
Dil-hinavên min dihejin
Xuber hêsrên min dirêjin.
Zêre-zêra dê û xwîşka
Zare-zara pîr, piçûka.
Diperîtînin dilê mine
Kes nizane halê mine.
Kan, xeznên min tew birine
Zimanê min yasax kirine.
Erf, edetê min hildane
Ew kirine malê xune.
Serokê min bê sûç, gune
Kirne hepsa teke, tene.
Welatê min kirne çar par
Ser axa min dikin bazar.
Mirovên dinê kor, lal bûne
Kes naxwaze wê bibîne.
Evê zulmê yek nayne zar
Loma dikim, ez ah û zar.
Xwezil, rebb kêm emr bida mine
Nekirama kolê yekî dine.
Nebûyama sêwî, him hejare
Heya min nexwara gurê hare.

Amed, Hewlêr hîn ne yekin
Çar par heva nezeliqin.
Kurdistana min elam nebe
Ala kesk, sor, zer bilind nebe.
Dergê hepsa hûrxaş mekin
Serokê min aza mekin.
Xem, mitala xalî nabim
Naseqirim, rihet nabim.

Nayê danîn ser çar riya

Heykelê Mehemmed Qazî.
Zulm hilnayê hemû ciya
Mirovên dinê nabim razî.
Goristanên şêr gêrîla
Ala sereng, nemilmile
Dergê welêt ber hemûya
Ku venebe, eşq û dile.
Dinya boy min vala, sare
Gelê min ra bê îtbare.

# Cemîle

***Rewayî ruhê Îsa û Zeynevê dikim.***

Daykek digrî, dilûvûne,
Dil-hinava dihelîne.
Dixeniqe nav xema da,
Dikewgire halê xwe da.
Bûye pepûk serê riya,
Mêze dike, hatî çûya.
Çav hêsra da binisîne,
Dev-lêvên wê zingirîne.
Qudûm nake pêşda here,
Ji kê pirske, ku bigere.
Tenê digrî, dilûvîne,
Por gulyên xwe dirûçkîne.
Kevir-kuçik tev wê digrîn,
Ewir-esmanê dikin zêrîn.
Mitheyr mane, banî, çiya,
Sekinîne avên kanya.
Kew rabûne ser çûçika,
Bilbil naçin nav kulîlka.
Hej ketiye zer, zinara,
Gelî, gepor, deşt, beyara.
Xezal naçin çolistana,
Hej ketiye daristana.
Rûyê royê tê girtinê,
Hîv digirî, vê mirinê.
Merg û çîman diqimilin,
Hemû bînber dikewgirin.
Tebîet ketye nava derda,
Boy ecêba hatiye jorda.
Ew jî maye hişmetkare,

Tev wê dike zare-zare.

***

Xwedê benda jê pirs nake dixulqîne,
Qalbê xwe da hasil dike, hê dişîne.
Bextê wan li eniya wana dinivîse,
Yekî hetev, yekî dike bê beysûse.
Hineka bilind dike wek asîman,
Hineka jî dike hewcê parîke nan.
Qismekî ra dinê dike cineta heq,
Qismekî ra par dişîne qetla neheq.
Teyrok cîkî ku nas dike, tim dikute,
Rojên şirîn dike tel-jer, zikur mewte.
Cemîlê ra wî nivîsî bextê reşe,
Ew rebena taf-tofana neda paşe.
Gava ewê çav vekirin hate dinê,
Rûyê royê reş xemilî hat girtinê.
Şepirze bû rewş-nîgara bajar, gunda,
Pir çûk-mezin nav lêyê da bûne unda.
Piçûk Cemîle nav lêyê derxist yekî,
Gote: - Bila ew jî bike, rind emrekî.
Roj dibûn sal, sal jî diçûn qenc û xirav,
Cemîle dibû bedeweke rewşe, bi nav.
Bedewiya wê ketibû ziman, zara,
Pir dayika dixwast wê bûk bibin xwe ra.
Kulîlk vebû, pêwîste bê bînkirinê,
Dot ku gihîşt, ese ew bê rêkirinê.
Sêv nagihîje, ji darê da nayê xare,
Bê hiş, sewda tim dimînin bê cî-ware.
Baran nebe, rûyê erdê wê nekene,
Dirêj najîn, xuliqiyê tên bê deme.
Her bînberî, wedekî wî ese heye,
Ew dema hat, gerek bide behra xweye.
Dem buhurî, diqimile, diçilmise,

Nîgara xwe unda dike, dibinise.
Dê û bavê wê nihêrîn gelek şa bûn,
Boy bextê wê dua kirin hejyan, ba bûn.
Dilekî eşq, ewlada xwe dane mêre,
Rica kirin xwedê siyê bide sere.
Rizma heyî ne teriband bavê wêya,
Dîlaneke bi erf-edet kir boy wêya.
Şabû wê bibe dayika pir ewlada,
Boy hevalê xwe, wê xwe tim bike feda.
Pir nekişand, şabûn kete dilê wana,
Dost-hogira çavronkayî dane wana.
Du ewladê wane cindî hatin dinê,
Ronaya wan, mal şewqêda kirin xunê.
Herda bêhev tişt nedikirin devê xune,
Dihejandin hêleçana lawên xune.
Cil dikirîn, xemil didan bejna wane,
Eşq û şa rêdikirin rojbûnê wane.
Dişuxulîn heweseke pir bê sebre,
Berî tewa dicivandin dilik, debre.
Pira îdî bextewarî didane wan,
Çavnebara pir dikolan bin piyên wan.
Hev dûrketin, rojên şeveq bûne tarî,
Ser zara da agir, alav jorda barî.
Bav sax, dê sax, herd jî bûne sexîr, sêwî,
Nan didîtin, av tune bû, dimane tî.
“Şêr, şêre, çi jin, çi mêre” gotye berya,
Şêr Cemîlê emrê xwe da boy sêwiya.
Ro xebitî, şev xebitî, ne westiya,
Got:- Zarên min, gerek meçin ber deriya.
Gelek anî hindik anî, şikrê xwe kir,
Namûs, xîret wê zarên xwe xweyî dikir.
Ew mezin bûn, bûne xweyî emek-kare,
Bûn du gencên pir rûnerme, kaw-kubare.
Hemaîl navê dêtiyê ma bê pare,

Rûnerm Îsa bû xortekî emekdare.
Dayka mêrxas Îsa şande dibistane,
Boy gelê xwe ew jî bike baş tiştane.
Hemû dersa, wî distendin tenê pênce,
Nedikete nav şuxulên bê armance.
Zû qazanc kir, wî hurmeta tew dersdara,
Aqlê xwe va firq dabû ji hemû zara.
Li wir dîtin gelek-gelek dost, hogire,
Xwe rê dibir wek xortekî mezin, gire.
Dibistîn da wî Zeynevê tev dixandin,
Bêrê heval, paşê herdu hev hebandin.
Wan dibistan xelaz kirin serfinyazî,
Huba wana reh vedida bê qerezî.
Car-carana bixof, dizî hev didîtin,
Dilê wan da çi ku hebû, tew dirêtin.
Gelek cara dixeyîdîn, hev nedkirin,
Cawê hubê ser hevdu da rêdikirin.
Heval, hogir, tew mervên gund wan hesiyan,
Huba wana eşkela bû, netirsiyan.
Piraniya bawer nekir, lêv hilkirin,
Hineka jî, bi dil-ceger dua kirin.
Cemîlê xwele gazî kir lawê xune,
Got: - Kurê min, dilê xwe veke, bêje mine.
Dayika te sekiniye nolî şêra,
Min kirine pir şuxulên jina, mêra.
Berya gotye: ”Gilyê êlê xêlif nabe,
Êlê çi got, zû û dereng, ew jî dibe”.
Berê şerm kir, paşê vekir dilê xune,
Navê Zeynevê anî ser zarê xune.
Cemîle şabû, kenya, ket nav fikra,
Hezar carî şikir anî xwedê xwe ra.
Wê Îsa lez hemêz kir û da ber maça,
Got: - Ya rebbê, ji te dikim hîvî, rica.
Pêş kurê min, kevir têke tu penêre,

Şikir xwedê, ew jî bûye îdî mêre.
Esil, nisla Zêynebê anî pêş xune,
Şabû, got, ewe eynî layiqî mine.
Berya gotye: "Dê bibîne, dotê bîne,
Qiraxê bêz binihêre, hê bistîne".
Rûsipiyên pir nav û deng wê civandin,
Berbi mala Mehmûdê ew eşq, şa şandin.
Mehmûd, Zînê pir xoşhal bûn vê hatinê,
Pîrozbaya xwe dane wê dilketinê.
Çend roj şûnda bû dîlana herd delala,
Êl hemû hat, dîlanxane nema vala.
Hinek bav xwe, boy ewlada dikin feda,
Hinek dibên, xwezil xwedê ewlad neda.
Ew zarêd xwe ku dibînin dîn, har dibin,
Wan dihêlin terkeselavetî dinê dibin.
Xastiyara xwedê zara kêm-kêm dide,
Kî naxwaze, wan ra bê hed, cot-cot dide.
Giha ciyê qilêr timê pir şîn dibe,
Qet tu emrek bê xastina xwedê nabe.
Bavê Îsa pî ne avît wê dîlanê,
Êl eşiya, ne eferim sed car danê.
Dayka mêrxas qedand deynê xweyî mezin,
Îsa kire bi mal, bihal, him jî bi jin.
Xêrxaza eferim dane dayka şêre,
Gotin: - Şêr-şêre, va çi jin, va çi mêre".
Cemîle ruh va hêsa bû, rûnişt rihet,
Ji Zeynevê wê pir didît qedir, hurmet.
Nas û dosta çavronkayî didane wê,
Xelat-berat dihatine der mala wê.
Şabûna ew îdî bibû weke çiya.
Nav êlê da pir serbilind digeriya.
Kê ew didît, dest-rûyên wê maç dikirin,
Daykeke şêr, wê ra hurmet pir dikirin.
Herdu genca mil kutane milê heve,

Bi dil-ceger kar dikirin herda teve.
Bûne xweyê du ewladê cindî, rindik,
Sabrîn, Bîlal – du sêvikê şirîn, qendik.
Roj pey hevdu dibûne sal, direviyan,
Teze-teze hê radibûn ew ser piyan.
Cemîlê wan dinihêrî kubar dibû,
Boy cefayê kişandibû, poşman nedbû.
Derî-dergê wê vedibûn pêş hemûya
Mêvanê wê dihatin ji hemû ciya.
Nîşan dida hurmeteke pir mezine,
Ne dixwast kesek ji wê bike tu gazine.
Geleka bextewarî didane wêye,
Digotin, xwedê bextekî çê da wêye.

***

Emir diçe nolî avê, nasekine,
Kes nizane, çiyê bibe roja dine.
Tavê dabû, dihat bêhna zivistanê,
Caweke nebxêr gihişte Agbastanê.
Kesî nexwast, vê ecebê bîne ziman,
Bêje Cemîle, mal li te bûye wêran.
Îro qezya qewimiye, reben dayê,
Riya hevirmûşe diçe Evropayê.
Îsa, Zêynev, herd delalê teye rêwî,
Gihîştin, niqitka emir xweye dawî.
Qasidê mewtê, ew te stendin bê însafî,
Tema Bîlal, Sabrînê nedan wan tu kesî.

***

Esman reş bû, ewra birq dan, birûsk ketin,
Baran barî, çem eqara xwe derketin.
Çiya, baniya zelûl-zelûl kirin gazî,
Gula belgên xwe weşandin, mane tezî.
Kew hişyar bûn, tev bilbila kirin lûvîn,

Teyrik-tûya bask lênedan kirin qîrîn.
Zer hejiyan, zinar hol bûn, kevir ketin,
Karxezala tevî maka hêsir rêtin.
Darê reza behra salê nebûn xweyî,
Zêrîn kete tew bînberê dine mayî.
Şîna şewat nişkêva ket nava gunde,
Dengê girî wek asîman bû bilinde.
Dost-hogira, qafê xwe dan, bû hêwirze,
Tew mitheyr man vê ecêba kewe, teze.
Îsa, Zêynev gotin kalyan, nalyan, giryan,
Hev xuldirîn, malo mala dû hevdu geryan.
Ber derê Cemîle hatin, bûne tijî,
Wê rebenê mêze kirin, bûne rojî.
Tewa kewaç-kewaç kirin îske-îske,
Nizanibûn, cawê wêra kiyê veke.

***

Daykek digrî, dilûvîne,
Kevir-kuçka dihelîne.
Bûye pepûk serê riya,
Dinihêre hatî-çûya.
Dev-lêvên wê zingirîne,
Por-gulyên xwe dirûçkîne.
Qudûm nake pêşda here,
Ji kê pirske, ku bigere…

**Dayka reben…**

Êl hejyaye, tew hatiye hewara te,
Ruhber, bê ruh, hemû digrîn îro tev te.
Teyrok barye, birûsk ketye nav mala te,
Hatin girêdanê derî, baciyê te.

Bext rûyê te nekeniya qet rojekê,
Şa nebûyî, eşq nebûyî, tu carekê.

Te xwe avît avê, êgir boy sêwiya,
Qerisiyî, peritiyî serê riya.

Mezin kirin, bûne xwedî nav û dewlet,
Xwest piçek emir bikî tu jî rihet.
Felek lez ket, bê wede bû mêvana te,
Alake reş anî, nikand ber derê te.

Ecêbên wa kêm-kêm dibin nav emir da,
Mirina heq, şan-şerefe bê wede da.
Îsa, Zêynev wede zûtir çûn mala heq,
Tofan te hat, pey nekeve kiye neheq.

Dayka reben, pêş rebbê jor meke şere,
Dinya fanî wa hatiye, wê wa here.
Rebbê jorê tîrêja xwe bide ser te,
Bila bijîn Bîlal, Sabrîn, Hemayla te.

***

*Bext min ra xayîn derket, nexwast tevî, min hevaltîke qence bê qeziya bike. Nişkêva hevala mine jiyanê, dayika ewledê min Dîlbera Bala bê wede ji min stend. Ez ser axa Qazaxistanê rastî evdeke esil-kok xwe va kivş, Cemîla Bariyê Ozo hatim. Ev îdî nêzîkî deh salane, ez ew û herdû ewladê wê Îsa û Hemaîl malekê da dijîn.*

*Nava van deh salên buhurî da, ez ji herdû zarên wê û paşwextiyê bûka wê Zeyneba Mehmûdê mûmê-misqalê ne êşyame.Min ew ewledê xwe, wan jî ez çawa bavê xwe qebûl kirime.*

*Nika Îsa û Zeynevê bi qeziya tirafîkiyê va dinya xwe guhastine. Bê wede çûne mala heq.*

*Min boynet xatirê ruhê wanî nemirî, ev poêma bi ser motîva zelûliyê nivîsî. Rewayî ruhê wanî ji dinê çûyî kir.*

*Hezar-hezar carî rehma xwedê li wan be.*

# ŞANO

**** Seyran***
**** Miho û Telî***


# SEYRAN

***Sê perde, şeş sifet***

***Rola diqedînin:***

**Reşo** – 52 salî, bavê Seyranê.
**Rindê** – 43 salî, dayika Seyranê.
**Seyran** – 17-24 salî, xwendavana dibistana navîn. Paşê xwendavana zaningehê doxtiriyê.
**Sewto –** 54 salî, hevalê Reşoyî zoroktiyê. Bavê Mîro ye, lê Mîro gewmandinê da kivş nabe.
**Sûrên Sarkîsî Badînyan** – 75 salî, profêssorê ulmê doxtiriyê. Serkarê komisyonê îmtahanê qebûlkirinê. Dersdarê zanîngehê.
**Dersdarê yekê** – 35 salî, Lîparît Aramî Danêlyan. Kandîtatê ulmê doxtiriyê, endamê komisyonê.
**Dersdarê duda** – 30 salî, Mînas Hovanêsî Mîrabyan. Kandîdatê ulmê doxtiriyê, endamê komîsyonê.
**Tîtal** – 24 salî, xwendavanê zanîngehê doxtiriyê. Hemkûrsê Seyranê.
**Hasmîk** – 24 salî, xwendevanê zanîngehê.
**Rûben** – 24 salî, hemkûrsê Seyranê.
**Aram** – 27 salî, hemkûrsê Seyranê.
**Gundiyê yekê** – Cinarê Reşo.

**Gundiyê duda** – Cinarê Reşo.
**Elî** – 50 salî, bavê Tîtal, nîvxwendî.
**Zarok** – Kurê cînarê Reşo.
**Xêlek gundiyên din** – Yê ku dibine tevgelê gewmandinê. Tevî Sewto têne nexweşxanê.



Rûpelek ji destnivîsa “Seyran”

## PERDA YEKÊ
## *SİFETÊ YEKÊ*

***Perde hedî hedî evraz dibe.***

***Mala Reşo. Mal bi qeyda gelirî hatiye tindirûs kirinê. Fêza malê sêhatiye hildanê. Ev bi emenîke nexşînva peçinîne. Ber sêr kulavek raxistine. Ser kulav çend belgî û doşekên piçûke zirav danîne. Reşo û Rindê palê xwe sipartine belgiya, rûniştine. Qulçekî malê Seyran ser piya sekiniye. Dike îske-îsk. Digirî. Pê desmalê hêsrên çavê xwe paqiş dike.***

**Reşo** – *(Bi hêrs)*. Dengê xwe bibire. Tolaza *(Rindê nîşan dide)* ji wê tolazê. Tê kivşê, ezê singekî bikutim. Tuyê hebinekî pêdakî. Erê! Lawo, qet xwe mekuje. Ez bavim. Bavê baş tu cara xiraviya ewladên xwe naxwazin. Eşedubilla, Mîro xortekî gelekî başe. Ew ber çavê me mezin bûye. Çima xwedê ji te biriye? Xwe çima çalî-baliya dixêrî? Ez dixazim, tu timê bextewar bî. Bi mal, bi ewled bî. Bila gişk xwezila xwe bi te bînin. Lawo, îdî bûyî bûye, çûyî çûye! Min gilî daye. "Ev seriye, ew oxire". Îdî dîntiya meke *(Nêzîkî wê dibe, porê wê mehez dike)*. Keça min, gotina bavê xwe neh meke. Kal-bava gotiye: "Berxa aqil du maka dimije. Ya bê aqil, birçî da disewiqe". Dimire.

**Seyran** – *(Kelogirî)*. Bavo, ne ez dixwazim bixwînim *(Herdu destê xwe va dêmê xwe digire, dike îske-îsk)*.

**Reşo** – *(Bi hers).* Keça nemeriva, te dîsa navê xwandinê kişand! *(Rindê dinihêre)*. Of, of. Ji derdê cinsê we! Ne, ev gişk nenerê tene! Ku

ew ne çike dike, ne jî pike dike. Wa bersîvê dide min, xwe darda dike. Qurimsaxa, qîza qurimsaxa, ezê zûtirekê hesavê te jî têxime tizbî! Min hê sera-serî da dizanibû wê wa jî dibe. Loma min digot, bila neçe mektebê. Lê, te lîlik dibarandin. Na, bila bixwîne, ji hevala paşda nemîne. De nika, kerem ke, bersîvê bide. Min serê te jêkirê. Ne te her wext pel şuxulê min xistine! *(Reşo destê xwe berbi herda dike)*. Rind bibihên, wekî gotina min nebe, ezê serê we herda jî bi kêreke kor jêkim. *(Bi hêrs nav malêda diçe-tê)*. Bila êl nasbike, ez kime *(Bînefişka dikişîne)*, kurê kême!

**Rindê** – *(Dengekî nizim)*. Evdê xwedê, tu çima dîsa destûyê dasê destê min da digirî? Min belengazê çi kiriye? Te çi daye min, çi ji min dixwazî?! Tu bavî, çawan dixwazî, usan jî bike. "Serî koç, ku li kêvir". Kengê min got na, wê demê serê min jêke. Bila xwîna min, tejî-tûlên te helal be. Destê xwe pêsîra min va leziqandiye? Bûyî qîr, sîr, pêsîra min bernadî?!

**Reşo** *(Diqîre, berbi wê diçe)* – Bese, dengê xwe bibire! Ne, te bi wan, usan gotina va mala min şewitand. Ez kirime vî halî. Nika ewlada min, pêş min sekiniye. "Na", dibêje. Gotina min erdê dixîne. Wey, wey, derdê cinsê we! Wekî hevekî gema we bê sistkirinê, hûnê xwedê ra jî bendetiyê mekin. Ax, ax! Heyamê derbaz bûyî! Heya hebû, abûr hebu. Lê nika?... Hemû çûn, çûn! Loma jî kal-bava gotiye: "Heyamekê usanê bê, xewê nemîne çûka, şermê nemîne bûka, perçeyê nemîne sûka". Xût ew heyam hatiye. De mêrî, ber bisekine!

**Rindê** – *(Ber xwe da)*. Hey teqyayo, çi bûye? Çima xwe dikujî, binefişka dikişînî? Ez kengê tevî şuxulê te bûm? Mala vaîsa bişewite. Ez kirime qismetê te! Min emrê xwe da destê te tu lezet nedît. Nika jî ewlada min ketiye teniya te. Çawa dikî, bike. Tenê ji min dûr here. Bila xwedê vê bazara te pîroz meke!

**Reşo** – Belê, belê, ez mêrim. Xwedanê giliyê xwe me. Min gilî daye, ezê biqedînim. *(Destê xwe dike ber qayişa xwe, nav malê da bi hêrs diçe-tê)*. Meriyên cuda min ra ne lazimin. Ev seriye, ew oxure! Kuta bu, çû!

**Rindê** – *(Berxwe da).* Wey lê, mêraniya te çavê te ketî. Bextê min ra bûye mêrekî weke sed mêra. Bê çawa ji mêraniyê xeberdide. "Dizikê got: - "Binê min zêre. Kevgîrê got: - Lê, ez ji ku têm?" Belê, mêrik zûda mêraniya xwe ser min cêribandiye. *(Vê demê, derva deng tên. Derê tê kutanê. Sewto û çend merivên gunde nas dikevine hundur).*

**Sewto** – *(Dikene)*. Xwedanê malê, destûr heye, em bêne hundur?

**Reşo** – *(Bi denegekî şa)*. Keremke, keremke, birayê minî delal, ev mala tew pêşkeşî teye. Bila timê mêvanê nolanî te bêne mala min. *(Rindê ra)*. Keçê, zu bike malê têxe pergarê. Min pir got, te hingik bihîst. *(Seyranê ra).* Qîza min, tu jî îdî terka wê şîn-şepûla xwe bide, şerme. Min cem mêrika rûreş meke. Lawo, welleh, billeh, tu qusûra kurê mêrik tune, delalekî xortane. Salê 40-50 berx, kavirî heqê xwe distîne. Nolî gelek cahilên nikaye tezebêketî nîne. Eşedbillah, wekî salekê nîn

nedî wî, zarê wî hevdu ranabe, rûyê te nanihêre. *(Destê xwe datîne ser milê Seyranê)*. Lawo, wekî tu xebera bavê xwe bikî, înşaalah, tuyê tu poşmaniyê nekişînî. Heta hebî, tuyê nav xeznê da bijî. *(Seyranê dike îske-îsk, digirî dike diçe)*.

**Sewto** – *(Dikene)*. Reşo, dîsa ci piste-pista teye? Ez jî zanim, tu keça xwe gelekî hez dikî. Lê usan hewalde, bila dengê te bê me jî? Malik avayo, tu zanî, wekî ez pey qewlê xwe hatime? Beriya gotiye: "Mêvanê gazî nekirê, rûdinê ciyê gêzînekirî". Lê ez mêvanê gazî kirîme. Usane, yanê na? Îzna min heye ciyê rind rûnêm?

**Reşo** – *(Dikene)*. Elêyka eleykeselam. Ciyê mêvanê nolî te timê mala min da heye. Hûn ser serê min, ser herdu çavên min hatine. De keremkin, keremkin, pêşda werên. Kîder xweşa we tê, wêra jî rûnên. *(Sewto û merivên pêra hatî ser kulêv rûdinên. Belgiya didine ber palê xwe. Vê demê Reşo bi lez berbi derê diçe)*. Sewtoyê bira, vê saetê, vê saetê, hinekî sebir bikin, her tiştê ciyê xwe bibîne.

**Sewto** – *(Ciyê xwe radibe, milê Reşo digre, berbi mêvana tîne)*. Reşoyê bira, qet nerihet nebe, welleh, tu tişt pêwîst nîne. Malik avayo, tu eme xerîbin? Eme her roj cem hevdune. Hezkirina xwedê, emê paşê hemû tiştî bikin. Hika mera pêwîste, em tenê armanca xwe bînine sêrî, biqedînin. Bila hevalên meye hatî jî tev me şa bibin.

**Reşo** – *(Dikene)*. Belê, belê, Sewtoyê bira. Weke şabûnê tu tiştek şirîn tunene. Ez mêrim, kurê mêrame. Min gilî daye, demek mesele îdî

kuta bûye. Nika kêfa teye, dixwazî şa bibe, dixwazî bireqise. Qîzeke min qurbana te kiriye! Xilas bû, çû! *(Ew Sewto hevdu hemêz dikin, dikenin)*.

**Kom** – *(Gişk bi hevdura)*. Eferim, eferim, eşedbillah. Mêrik hê berê-berê da xwedanê giliyê xwe bûye. Gelî xinamiya, bila xwedê vê xinametiya we pîroz bike. Ser şirînayê bibe. Welleh, lap bêhna gula ji vê bazara we hat. Îdî çi pêwîste, va alî-wa alî avîtin. Şuxulê ser rastiyê xwedê jî jê hez dike. Eferim, sed eferim, we ra!

**Sewto** – *(Boxçê xwe vedike. Gustîlê û temerziyê nîşanî cimaetê dide)*. Gelî dilxaza, ev jî belga bûka minin. Reşoyê bira, camêro, bêje bila bûka min bînin. Ez belga kurê xwe pêdakim.

**Reşo** – *(Vedibişire)*. Sewto, birayê minî hêca, îdî keremke, ji ciyê xwe rabe. Zehmet bikşîne, derbazî oda din be, gazî bûka xwe bike, belga kurê xwe pêdake. Milê wê bigre bîne vira. Em jî pîrozbahiya xwe bidinê te. Meydan îro ya teye. Ez çi kareme. De rabe, rabe, şerm meke.

**Kom** – *(Gişk bi hevra)*. Sewto, mêrik rast dibêje, malik avayo. Meriv kaba seba çi berav dike. Tu çima xwe ewqasî paşda vedikişînî? Camêrî heqe, jî ciyê xwe rabe, xizmeta xwe biqedîne. Bila her tişt kutabe, here!

**Sewto** – *(Ciyê xwe radibe, derbazî oda dîn dibe. Lê, wir kesekî nabîne. Zû paşda vedigere, dengekî bilind gazî dike)*. Reşo, Reşo, malik avayo, ka, kî odê da heye, tu min dişînî wir?!

Serê tekim, odeke vike-valaye. Camêro, ne ins heye, ne jî cins!

**Reşo** – Sewto, xwedê kur hîşto, tu çawa dibêjî, kesek tunene? *(Lez diçe derê odê vedike, xofgirtî paşda vedikişe. Çavê Sewto dinihêre, dike qîrînî)* Na, na xêr. Qet nikare usan bibe?! *(Vê demê Rindê tê dike, ser wê da diqîje)*. Qîza nemeriva, kanî, kanî, leçera te?! Kuda çûye? Zûbike, bin erdê da be jî derxe bîne! Yanê na, ezê temam nisla te bişewtînim. Lê, hema ewe li min kêm bû!

**Rindê** – *(Berxwe da).* Mêrik, ez ji ku zanim, keça min kanî? Ewê pirsê bide xwe. Çima ji min pirs dikî? Gunê teye, tu jî bersîva xwe bide!

**Reşo** – *(Bi hêrs).* Qîza nemeriva, ji nemeriva! Çawa tu nizanî, leçera teye kuye? Lê, kiyê bizanibe?! Serê min neêşîne, zûbike, ciyê wê bêje! Gazîkê, bila bê. Mêrika şuxulê xwe biqedînin. Xeberdana zêde ne lazime. Ne tu zanî, ezê çi bikim?

**Zarok** – *(Vê demê zareke dikeve hundur)*. Apo Reşo, ez zanim Seyran kuda çû. Heçika wê çemedanê xwe hilda, avtoke sipî siyar bû, berbi bajêr çû. *(Zarok zû ji dikê diçe. Merivên hatî çavê hevdu dinihêrin, hêdî-hêdî dikine piste-pist, Reşo mêze dikin. Reşo serê xwe berjêr dike, halekî fegir li wan dinihêre).*

**Reşo** – *(Rindê ra)*. Qîza neyara, te tevî leçera xwe ev yek jî anî serê min! Axriya emrê min da ez kirime pînekî sorî, pêkenî. Tu hew dizanî, ezê te sax bihêlim! *(Hucimî ser Rindê dike. Dikuxe, dilerize, ser çoka dikeve. Nolanî dîna diqîre).* Cimaet, wekî usan bû, qet zirar tunene! Ez îro

da xwîna wê tejî-tûlên we helal dikim. We ew kêderê dît, fitê medine ruhê wê, cî da bikujin. Bi xwedê, ezê netika we maçkim. *(Dîsa dikuxe. Bêhna xwe giran dikişîne, dike ûfe-ûf)*.

***Cimaet hêdî-hêdî ji dikê diçe. Perde berjêr dibe. Dîk di nav tariyê da nayê xanê***.

## PERDA YEKE
## *SİFETÊ DUDA*

***Perde vedibe. Dik nav şeveqê da tê xanê.***

***Profêssor Badîkyan, Hamlêt û Lîparîte rûniştîne. Pêş wana Seyran û du keçên din rûniştokê mektebvana da ber wan kaxet û qelem rûniştine. Ji ulmê kîmyayê bersîv didin, wekî qebûlî zanîngeha doxtiriyê bibin.***

***Dersdar guhê hevdu da dikine piste-pist. Bin çava va wana dinihêrin.***

**Seyran** – *(Dêmekî şermoke destê xwe bilind dike)*. Heval dersdar, îzin heye?

**Profêssor** – Keremke, keremke, keça min, ez we dibihêm.

**Seyran** – Ezê amademe bersiva pirsên xwe bidim.

**Profêssor** – *(Vedibişire)*. Wekî usane, keremke. Lawo, ber zana hemû dergên ulme vekirîne. Hîmê ulim ser rastiyê hatiye damezrandinê. Şerm meke, pêşda werê, em te bibhên.

**Seyran** – *(Derbazî pişta kursiyê hewaldinê dibe, bilêta xwe dixwîne)*. Pirsa ewil, pêşda hatina tirşê kîslateye *(Li textê nivîsarê rêaksiyayê û formûla wî dinivîse).* SO3 + H2O = H2SO4… Pêwiste, wekî bê gotinê, em vî tirşê kîmyayî pir kêrhatî qewlê laboratoryayê da distînin, dişînin hemû qulçê welête cuda-cuda da… *(Dixwaze bidomîne).*

**Profêssor** – Seyran, lawo, îdî bese. Te rêaksiya û formûla çawa hebûn usan jî nivîsîn. Ezî ji bersîva te pir razîme. *(Herdû dersdarên dinê ra).* Lê hûne, razîne, yanê na?

**Dersdarê yekê** – Seyran, kîslata di nav jiyanê da pêwîstî kîjan para dibe? Ew çi rolê diqedîne? Wekî tu wî ewqasî dipesinî.

**Seyran** – Wekî kîslata nebe akkûmlyatorê nebin, bê akkûmliyator her cure têxnîka kêrhatiyê bisekine. Jiyanê serobin be.

**Dersdarê yeke** – *(Dêmekî şa)*. Gelekî baş, ezî bersîva te ra qaîlim. Eferim te ra. Kivş dibe, te rind xwendiye.

**Dersdarê duda** – Seyran vê formûlayê da *(Textê nîvîsarê nîşan dide)* valênta kirkûtê çende, wekî bi tevbûna wê kîslata hasil dibe?

**Seyran** – Hê formûlayê da valênta kirkûtê şeşe. Curekî din nikare bibe. Lê…

**Profêssor** – *(Dersdara duda ra)*. Tuyî bersîva wê ra raziyî, yanê dîsa pirsên te hene?

**Dersdara duda** – Na, na, heval profêssor, wê bivir lap kokê da lêda. Çi pêwîst bû, ew jî got. Ezî gelekî bersîva wê razime.

**Profêssor** – *(Dengekî milahîm)*. Belkî dîsa pirsên we hene? Keremkin, bêjin.

**Her dersdar bi hevra** – Na, na, heval profêssor, emê bersîva wê ra qaîlin. Îdî hûn zanin, çawa dixwazin, usan jî bikin.

**Profêssor** – *(Seyranê ra)*. Lawo, derbazî pirsa duda be. Em te dibihên.

**Seyran** – *(Bilêtê dixwîne)*. Nav emir da rola oksîjênê çiye? Ew pêwîstî çi dibe?

**Profêssor** – Keremke, lawo, welleh xeberdan û navê te ra eşqa min tê. Ew min dibine heyamekî gelekî dûr. *(Hetika xwe miz dide)*.

**Seyran** – *(Hêdî)*. Oksîjên nav emir da êlêmênteke pir kêrhatiye û belavbûyî ye. Ew him halê serbest da, him jî nav qazên cure-cure da xwe dide kivşê. Nîşana wêye kîmyayî *(Li textê nivîsarê dinivîse)* $H_2O$ ye. Ew nav hewayê da 21 selefe. Nav avêda 88-89 selefe. Jiyan bê oksîjên nabe. Hemû bînber bi wê dijîn. Lê…

**Profêssor** – Keça min, bese. Tu rast dibêjî, bê oksîjên jiyan tunene *(Kesereke kûr dikşîne)*. Seyran, Seyran, lawo, ezî bersîva te gelekî razîme. *(Herdû dersdara ra)*. Lê hûne jî razîne, yanê na? Diqewime pirsên we hebin? Keremkin.

**Herdû dersdar** – *(Bi hevra)*. Heval profêssor, dersdarê meyî pir heja, dema ku hûne bersîva wêra qaîlin, eme zû da qaîlin.

**Profêssor** – De wekî hûne qaîlin, ez îdî şirovekirina pirsa sisya pêwîst nabînim. Fikra we çiye? *(Ew destê xwe bilind dikin, yanê 'eme razîne')*. Seyran, keçê min, îdî bese. Kaxezê xwe bîne. *(Ser kaxezê pênc datîne, îmza dike. Herdu dersdarên din jî îmza xwe datînin. Kaxez dide Seyranê. Seyran dixwaze here)*. Na, na, keça min, lez nekeve. Tu îro da xwendevana

zanîngeha doxtiriyêye kursa ewil têyî hesabê. Ez te pîroz dikim. *(Wê cem xwe dide rûniştandinê)*. Lawo, te ser birînên mine kevin vekirin. Hema ewe jî reng, bejin û bala xwe va mîna te bû. *(Destê xwe dide ser milê wê)*. Lawo, em qeza Wanê diman, bineliyê gundê me Kurd û Ermenî bûn. Dê û bavên me hevdura cînarîke gelekî baş dikirin. Me zara jî hevdu ra hevaltî dikir. Em hevra dûçûne pincar beravkirinê, şev çavgirtinok dilîstin. *(Kesereke kûr dikşîne)*. Mala me û mala apo Elo cînarê hevdu bûn. Seyran keça apo Elo bû. Ez ewe emrekî da bûn. Me hevdu ra hevaltî dikir. Bav-dayikên me bi hevaltiya me ra pir şa dibûn. Me qewil dabû hevdu wekî… Lê êvarekê gelek eskerê tirka tijî nav gunda me bû. Ew 1915 salê bû. Xêlek mal şewitandin, gelek merivên ame-tam kuştin. Kesî nizanibû, ew çima usan dikin, kê ew şandine? Wê êvarê bineliyê gund geleka malê xwe hîştin revîn. Me jî mala xwe hîşt, ketine çol-çolistana. Piştî gelek çetiniya, çend sala şun va em gihîştine Ermenistana Sovêtiyê.

Wê evarê şun va, ez tu cî rastî Seyranê nehatim. Nizanim çi bi wê hat, kuda çû, kê ew kuşt… Min wê şunda tu kesî ra hevaltî nekir. Ezî hetanî nika jî hîviya wê me. *(Keserekê dikişîne)*.

**Seyran** – *(Vedibişire)*. Heval profêssor, yeqîn dilê we da tiştek hebûye ku hûn heta nika wê bîr nakin? Hîviya wê sekinîne?

**Profêssor** – Eh, eh, Seyran, Seyran. Lawo, wedê me da kulfeta Kurde pir merûm bû. Bê extiyare, çavgirtî bû. Firqiya wê, eşyakî malê tune bu. Li nika… *(Bii eşq).* Şikir, şikir, sed

eferim bavê te ra. De here, here, wî bîne cem min. Welleh, eze rast eniya wî maçkim. Wekî tu bi seya wî camêrî îro hatî derketî vira, vê derecê. *(Seyran feqîr-feqîr çavên wî dinihêre, profêssor dikene)*. De here, here, şerm meke…

**Seyran** – *(Kelogirî dibe)*. Heval dersdar, ez tenê hatime, bê hezkirina bavê xwe. Birayên min tunenin, xwişkên mine piçûkin. *(Dike îske-îsk)*. Bavê min dixwast, min zorê bide mêr, ez ji mal revîme. Îdî venegerime wir. Bavê minê min bikuje.

**Profêssor** – *(Ciyê xwe radibe)*. Lawo, sed eferim vê mêrxasiya te ra. Dîrokê da wek jina Kurd kesek mêrxas nebûye. Wê timê tevê mêrê xwe, yanî jî bav, birayên xwe pêş neyara şer kiriye. Beriyê gotiye: "Şêr şêre, va çi jin, çi mêre". Wekî usane, sev xatirê navê Seyranê – nan xwêya wede da kal-bavê me tevî hevdu xwariye – îro şûn va ez bavê te, tu jî keça min. Ez gerekê doxtira ewil bidime gelê Kurdî qurna da zêriyayî. *(Milê wê digre)*. Rabe, rabe, gelekî mitale meke. "Xwedê heye, xem tu nîne". Qîza min, di jiyanê da her tişt diqewime, lê meriya ra aqil û deyax pêwîste.*(Seyran radibe. Ji dikê diçe. Profêssor dû wê dinihêre).*

***Perde hêdî-hêdî berjêr dibe. Dik nav tarîstanê da nayê xanê. Dengê cure-cure têne bihîstinê*.**

## PERDA DUDA
## *SİFETÊ SİSYA*

***Perde vedibe, dik nav rohahiyê da tê xanê. Seyran û Hasmîk xelatê sipiye lê. Destê wan da pirtûk. Ser stoleke dirêj rûniştine. Seyrane gelekî posîdeye. Hasmîk wê dinihêre û bi dêmekî geş.***

**Hasmîk** – Seyran, xwîşka min, îdî bese, tu xwe ewqasî diêşînî. Malik avayê, min navê van sala da qet carekê dêmê teyî ken nedît. Timê nav mitaladayî. Qet pirsgirêke te xilaz nebûne. Şikir, em zûtirekê zanîngehê xilaz dikin, çetnaya salên girîng îdî paşda dimînin. Ne, min te ra gotiye; piştî mirina dê-bavê min ez sêwîxanê da mezin bûme. Kesekî min tunene. Lê, ez çi bikim?! Emir didome, emê bibine xweyî mal, dewlet, ewlad, doxtir, serkar. Beriya gotiye: "Demê bibe dema me, xirebendê bibe xatiya me" *(Radibe, xwe dihejîne)*. Her sibe zû, wedê hatime xebatê, ezê xwe awa bihejînim *(Seyran dikene)*. Hêrs bibim, sert rûyê xebatkaran binhêrim. Ewê guhê hevdu da mêkine piste-pist. Ezê emir bidim, ewê biqedînin. Tu jî... Îdî çima ewqas mitala dikî?

**Seyran** – *(Kelegorî dibe).* Hasmîk, xwîşka mine delal, gotinên te hemû rastin. Lê... Of, of. Ez îdî çi bêjim? Xwezil, ez qet nehatama vê dinê, ne jî ev ezabên tel, min bidîtana. Eyane, temê dê-bavê şirîntir tiştek tune. Lê, eze zûda jî wî temî merûm bûyîme.

**Hasmîk** – *(Demekî şikber).* Seyran, tê kivşê, te hela dilê xwe tew min ra venekiriye, erê? Gelek tişt min veşartine. *(Destê xwe serê xwe*

*dixîne)* Lê ez bê fehmin, erê? Hemû sêrên xwe te ra qise kirine. Çawa dibêjin, tiştek bin berê da nehîştiye.

**Seyran** – *(Wê hemêz dike)* Qîzê, dîn nebe. Em îdî xwîşkên hevdune. Berê min rind bibihê, paşê ji tebera xwe derê, hê xwe bilomîne, ricim bike.

**Hasmîk** – *(Bê mede)* Qîzê, ev şeş salin, em odekê da dimînin, kursekê da dixwînin. Ya rast, wekî tu û Tîtal nebûyana, min tu car gilî nedida Aram, ne jî wî ewqasî hez dikir. Ne, tu zanî? Ez qedrê Tîtal gelekî digrim. Wî çawa birayê xwe hesab dikim. Min giliyê we erdê ne xist. Piştî xilaszkirina zanîngehê tuyê tevî Tîtal herî cîkî xebatê. Ê, îdî çi dixwazî? *(Kelegorî dibe)*. Ne, tu rind dizanî, xêynî Aram kesekî min tunene. Êh, Seyran, Seyran, te dîsa ser birînên min vekirin. Lê, ez çi bikim?! Xênî Aram kê ra şabim?

**Seyran** – Qîzê, dê-bavê min herdu jî hene. Lê eze…

**Hasmîk** – Hey emir dirêj bûye. Diqewime te û Tîtal tev bişînine nehya we. Dibêjin wir doxtore kêmin. Dê-bavê teyê we bibînin, şa bibin. Mêvandariyê bidin, paşê deweta we bikin. Binê, çiqas tiştên nûhe, başe hela pêşiya wene. Wê şûn va îdî tu dizanî.

**Seyran** – *(Çavên xwe paqiş dike).* Hasmîk, xwişka min, tu rast dibêjî, xwedê ew dabûne min. Lê merivên xirav ez ji wana qetandim.

**Hasmîk** – *(Bi lez).* Çima, çima? Welleh, tu dîsa tiştekî ji min vedişêrî. Bêje, bêje, malik avayê, te lap dilê min teqand. Rica dikim, fikra xwe zelal bêje, ez te rind fehm bikim.

**Seyran** – Bisekine, bisekine, hinekî sebir bike. Ezê îro îdî dilê xwe te ra vekim. Eze ji wan, ewe ji mine xeyidîne. Nav van sala da me qet hevdu nedîtiye. Piştî xilazkirina dibistanê navîn bavê min nedixast ez xwendina xwe bidomînim. Dixwast min bide xortekî gundê mayî nexwendî. Wî şivantiyê pêştir tişt nedîtî bû. Loma jî ez ji mal revîm. Dayika min du cara dizî bavê min dirav dabûne gundiyê me. Min ew hilnedan. Ez her havîn fabrika perçe çêkirinê da kar dikim.

Gündiyê me dibêjin, bav û diya min îdî gelekî ji dest xwe çûne. Çi bikim, ez ne gunekarim. Gunekar erf-edete meyî kevne. Wî ew kirine wî halî. Derwa min xelqê dişewitîne, hundurê min, min dişewitîne. Ev şeş salin, min ewladiya profêssor Badîkyan qebûl kiriye. Ez nika ewladê wî me. Ew car-carana min bi xwe ra dibe malên hevalên xwe, çawa ewlada xwe wana ra dike nas.

**Hasmîk** – *(Curê xeydê).* Seyran, eze rastim, te hetanî nika ev qewmandina ji min veşartine. Çima, profêssorî bê ewlade, wekî tu xwe ra ewlad hildayî? Ew merivekî usanî heyiriye?

**Seyran** – Belê, ewî him ji bê malbate. Dilê wî da ewqas qewmandinê zelûl hene, wekî bêne weşandinê, çiqas pirtûkên qalinê derên. Êh, xwîşka min, me çi dîjiye! Profêssor timê dibeje: Qîza min, piştî kutakirina zanîngehê ezê mêvan bême mala te, dê-bavê te ra bibime nas. Neviyê xwe ra bilizim, bi wan şabim. Gelo, wê demê şirîntir çi heye?

*(Vê demê ji kenarê dikê, dengê ken tê. Tîtal, Aram û Rûbên têne cem wan. Tîtal wan dinihêre, dikene).*

**Tîtal** – *(Milê Aram digre).* Oho, kuro, Aram, ne kew, xezalên xasbaxçaye vane. Îdî em kîjan nêçîra digerin? Kuro, çima em pêçkên wanin! Hinekî sebir bike, bê ez çi tînime serê wana. *(Tiliya xwe dihejîne, gişk dikenin)*.

**Aram** – *(Destê Tîtal digre)*. Min digot bide pey min, te nazî dikirin. De keremke. *(Dikene)*. Te çi ji xwedê dixwast, xwedê ew jî daye, îdî çi dixwazî? Hez dikî, kew bêje, dixwazî xezal bêje. Ew îdî şuxulê teye. Hey te çav ji min xasto, çima sekiniyî, pêşda here. Hinekî qudumke. *(Wî berbi wan didefîne, dikene)*. Welleh, hema Rûbênî rast xeysetê tedaye. Gelo, vê demê şirîntir û qîmettir tiştek heye?

**Rûbên** – *(Feqîr-feqir)*. Gelî bira, axir hûn çima min ewqasî dilomînin, ricim dikin? Malik avano, merî bîst pênc saliyê derbazbûnê şûn va îdî nikare bizewice. Qîzik berê xaşa te tê paşê, êh, çi zanim… Serê we kim, nava saetekî da rast hezar sewda tê serê meriya. Ber çavên te dibe dûman. Dixalifî, xwe va alî, wa alî dixêrî, nikarî derê derekê. Dikevî nav kol-kosa, kaş-kerîşa. Êh, cehmê da. *(Dîsa kortika xwe dixurîne. Gişk dikenin)*.

**Seyran** – *(Dikene)*. Gelî bê kêra, hela bêjin, bêjin, bê kê îzin daye we, wekî hûn ewqasî ji heddê xwe derdikevin? Diqewime, we feqîr dîtine? Yanî hirç kiriye delê? *(Kulma xwe nîşan dide)*. Welleh, ezê we hêvîr nermtir bikim! Riya xwe rind nas bikin, rast bimeşin.

**Aram** – *(Çavê xwe Hasmîkê ra diqirpîne)*. Hasmîk, tu zanî, Seyran dîsa hêrs bûye! Qîzê, were hela eme saxin nav vê agir, alavê derên, yanê na? Emê berî gişka bişewitin! *(Destê Hasmîkê digre, dixwazin herin)*.

**Seyran** – *(Dikene)*. Na, na, gelî dekbaza, welleh, îdî tela we serê xwe nagire. Beriya gotiye: "Gur roja dûmanê, diz şeve reşê gelekî hez dikin". Erê? Qîzê, were cem min, me sêvên sor şandine pey wana? Kîjan rê da hatine, bila kortika xwe bixurînin, wê pêda jî herin. *(Dikenin)*.

**Rûbên** – *(Feqir-feqîr wan dinihêre)*. Gelî pirzana! Qet tu naziya mekin. Serê bavo, şuxulê weyî tindirûse. Loma hûn ewqasî gir dibirin. Hema yê tamê mayî ezim. *(Dike diçe)*.

**Hasmîk** – *(Bi tirs).* Hela hişbin, hela hişbin, ça ku profêssor berbi me tê. *(Gişk çavê Hasmîkê dinihêrin)*.

**Tîtal** – Kanê, kanê, qîzê, te lap ziravê me qetand?

**Hasmîk** – *(Tiliya xwe dirêj dike)*. Ay waye… Rast tê cem me. *(Gişk wî dibînin, zû ji dikê diçin)*.

**Profêssor** – *(Tê dikê. Disekine, kesereke kûr dikişîne)*. Êh cahiltî, cahiltî. *(Navbirî)*. Beriya rast gotiye: "Qîztî, xortî gula geşe, kaltî, pîrtî roja reşe". Herin, herin, gelî gûlên mine bîn xweşe, ne çilmisî. Bila xwedê bext bide we.

***Perde berjêr dibe. Dengê mûsîqiyê te. Dengbêj kilama "Gulê merûmê" distire. Dik nav taristanê da nayê xane.***

## PERDA DUDA
## *SİFETÊ ÇARA*

***Dengê mûsîqiyê bilind dibe. Perde hêdî-hêdî evraz hildikişe. Dik nav ronahiya şamdana da tê xanê.***

***Mala Reşo. Mal bi curê eşîrtiyê hatiye xemlandinê. Emenîke nexşînva ser hatiye peçinandinê. Kulave raxistîne. Ser kulava çend belgî danîne. Reşo palê xwe daye belgî. Gelekî giran bêhna xwe dikişîne. Dikuxe. Car-caran jî dike ûfe-ûf, inte-int.***

***Sewto, Rindê û çend mirovên din cem wan rûniştine. Rindê pê desmalê netika wî paqiş dike. Şêlbikva avê devî wî va dike****.*

**Reşo** – *(Dikuxe, hêrs dibe, destê jina xwe didefîne. Netka xwe miz dide)*. Ax, ax, zeman, zeman! Tola ji tolanê, ne tu jî dizanî ro kîjan alî da çûye ava?! Ne te ez nav êlê da rusva kirim. *(Navbirî)*. Sewto, bira, welleh, dilê min diteqe. Ez çi bikim? "Sûre tenge, milê Evla begê min ranabe" *(Xwe-xwe ra)*. Na, na usan nabe! Gunekar ez bi xwe me. Min wede da fersenda xwe fût kiriye. Gerekê hê zartî min stuyê wê hilqetanda. Diranê vê leçerê jî yeko-yeko bikişanda, kaşkira. Bizanibûna, ez kime, çi dikarim bikim. Na, ez îdî nika wê şaşiyê bernadim. Eger rabûm, ez îdî fitê nadime ruhê wan. Lê wekî ranebûme, ew jî îdî bextê wane. *(Dixwaze rabe)*.

**Sewto** – Reşo, Reşo, minet dikim, xwe ewqasî merêncîne. Malik avayo, tuyî nexwaşî, nexwaşa ra rihetî, hêsabûn lazime. Lê, tu dîsa… Beriya gotiye: "Dîwar hilşiya, toz kişiya". Xilaz bû, çû! Pirsek bû, me xwest, ne bû, em çi bikin? Min kurê xwe îdî zewicandiye. Şikir, du neviyên min hene. Ezî dayina xwedê xweyî pir razîme.

**Reşo** – *(Bi hêrs)*. Camêra ew ezim, ezim, heta nika sax mame. Bila xwedê derdê mîna derdê min nîşanî tu bendêyê xwe nede. Neyarê min jî wî derdê nebînin! Tenê mirina malxirav dikare min vî derdê bê derman xilaz bike. Derdê min bide kevira, kevirê biteqin. Lê ez… Ehhh, heyam, heyam! *(Dikuxe, Rindê avê dev va dike, Reşo destê Rindê didefîne)*. Ax, ax! Ne, ev gişk kirinên tene. Ez bûme nexwaşê nava ciya, nika xwe heyf diki. Serê bavê te kim, ew nabihure!

**Rindê** – *(Ber xwe da)*. Wey lê, axîn dil da mayî, lingşikestî lap xwîn vedireşe. *(Keserê dikşîne)*. Ne wan axîn, ofîn, bînefişkên te ez kirime vê rojê. Berhêwan bûme pîreke sed salî. Ewlada min kete çola. Of, of! Min ji destê te tu lezet nedît! Min ra çi bûyî, ewlada min ra çi bî! Te qet nehîşt em rojeke xwedê parî nanê rihet bixun. Eme timê dew-doza te da bûne. Ya me ra pevçûyî, yan jî cînara ra. Tu wa hatî, tuyê wa jî herî. Kal-bava gotiye: "Kurmê şîrî, heta pîriye", "Tulmikê pişta, gor rast dike".

**Reşo** – *(Dengekî bilind)*. Dengê xwe bibire, qîza nemeriva! *(Destê xwe sîngê xwe dixwîne)*. Wekî ev cana nebûya teyê xwedê ra bendetî nekira. Bîra te çûye? Her ro şîn, girî, xeyd fîlan, fistan? Tuye rokê virbûyî, deh roja xerava bavê

xwe da bûyî. Ax, ax, ji derdê cinsê we. Ezî ji weyî birîndarim, birîndar. Xwedê, wekî bask bida we, weyê her der bihedimanda, kesek sax nedihîşt. “Xwedê çiyê dibîne, berfê ser da dibarîne”. Ev hal jî we ra gelekî hindike.

**Rindê** – *(Hêdî)*. Wey lê, waymûş nebûyî, hela bê çawa xwe dipesine.

**Sewto** – *(Bi curekî nerazî serê xwe badike)*. Reşo, Reşo, malik avayo, ez jî zanim, wê nav êlê da serê me berjêr kir. Em çi bikin? Îdî tu çi ji vê belengazê dixwazî? Çima wê hez dikir, wekî wa bibe? “Pir gotin, çan cotine”. Wede her tiştî nîşan dide.

**Rindê** –Qurbana wê me, hema ya baş ew bû, wê ew jî kir. Wekî bima, wê ji destê te çi lezet bidîta? “Ya dest dikin, dê-bav nakin”. Paşê her tiştê eyan dibe, heqî, neheqiyê hev bêne bijartinê. Her kesekê bigihîje heqê xwe.

**Reşo** – Na, na, Sewto, camêro, çima ez gede-gûdê vî heyamîme? Îro gilî bidim, sivê poşman dibim. Min gotiye, piştî mirina min piyê wêyê têkeve vê malê. *(Xwe dileqîne)*. Kuro, ne ez deyindarê ruhekîme. Xilaz bû, çû! Ew nêçîra mine. Ez wê sax bernadim, wekî sax bigere, “ev seriye, ew oxire”. Gerekê hemû xastinên wê, dilê wê da herne axberê sar. Êl hê bizanbe, ez kîme, kurê kême!

**Sewto** – *(Herdu ra)*. Hey malik avano, hema şerê we boy îro mabû? Hinekî bisekinin, sebra xwedê bikin. *(Dengekî milahîm)*. Belkî ewê jî poşman bibe, şaşiya xwe fehm bike, bê ser riya heq. Piyê xwe dayne ser mêzîna heqiyê. Hinekî sebir bikin. Mîro nebû, bila bibe Sûto. *(Dikene)*.

**Gundiyê yekê** – *(Dengekî milahîm)*. Reşoyê bira, hê berê-berê da kal-bava gotiye: "Nîvê rê vegerandin, ne poşmaniye". Ez xwedê xwe, ez bextê xwe Sewto rast dibeje. Tu kesî hûn ji hevdu cuda nekirine. Ev çendik çend salin, hûn pêş çavê me hevdu ra biratike bê evez dikin. Gişk we hevdu ra mînak dikişînin. Der-cînar ser we mitheyr dimînin. Hûn çawa neferê malekênin. Tevî hevdu dixwun, cîkî diçin-tên. Birayên helal jî nolî we nabin. Hemûşk xwezila xwe bi we tînin. Eşedbilla, Sewto rast dibeje, bila hema usan jî bibe. Mîro nebû, bila bibe Sûto. Ê, çi firqi, welleh Sûto, Mîro jî bedewtire. Mîro derê mektebê venekiribû. Lê Sûto qet nebe du-sê sala çûye mektebe. Ev jî hesabekî mezine.

**Gundiyê duda** – Apo Reşo, ezî vê xwesteka apo Sewto ra qaîlim. Welleh ezîm, bille Kerîm. Mêrik pirsa mêra dibêje. Yeke, herdu jî birayên hevdune. Ê, çi firqî? "Gur çi bizinê xwariye". Nebû qismetê Mîro, bila bibe qismetê Sûto. Ortê da çend sal firqî hene. Kî fikra xwe dide tiştên usan. Kal-bava gotiye: "Bûke hespêye, kes nizane qismetê keye", "Serî-birî, go seqirî".

**Rindê** – *(Halekî şaşmayî da).* Kuro, ez nizanim hûn bi hişê xwe xeberdidin, yanê we îdî hişê xwe unda kiriye? Ev çi gotine, nebû ew, bila bibe ev. Lê xelqê me ra çi bêje? Hûn ji qîretê, namûsê, mêraniyê xeber didin, xwe dipesinin, datînine ser çiyayê Qaf. Lê ez nav vê xeberdana we da tiştekî nabînim. Ez ne ya berê me avê bikime devê xwe bisekinim. Welleh, ezê

serê we yeke nebûye usan bînim, êl gişkê bê temaşa we. Kûçik ji destê we nîn megirin.

**Reşo** – *(Dengekî bilind)*. Qîza nemeriva, dengê xwe bibire. Heddê xwe bizanibe! Neke qîşte-qîşt, ezî hela saxim. Min îzin nedaye, tu ewqasî gir bibirî! Qet xwe darda meke, ciyê xwe da rihet rûnê. Ez bavim, çawan bixwazim, ezê usan jî bikim!

*(Vê demê dengê tûtîna maşînê te, du keç û mêrekî cilê sipiyê lê destê wan da çemadanê doxtiriyê têne mal. Hemû şaş dimînin, wana dinihêrin)*.

**Reşo** – *(Ecebmayî)*. Kuro, Sewto, ew kîne, kê gazî wan kiriye? Kê ew şandine? Kuro, yeqîn ev dîsa nenerên te ne? Erê! Ezê bimirim, lê tucar piyê xwe navêjime wê wêranê. Ezî razîme, Ezraîl vê deqîqê ruhê min bistîne, ne ku herime nexwaşxanê. Xwedê ruhek daye, kengê bixwaze, wê demê jî bistîne. Îdî nexwaşxane, doxtor kê ra lazimin. Birê min, xwe qet ewqasî meêşîne, gilî devê mêra carekê dertê. Veselam, şûttemam. Ez tu dera da naçim. Bextê te me, vana zû ji vira derxe. Bila çavê min wan nebîne. Yanê dilê minê biteqe. Rica dikim, hinekî zû bike!

**Sewto** – *(Milahim)*. Hey malik avayo, tu dîsa dest înadê xwe venakişînî. Camêro, "Xwedê derd jî daye, derman jî daye". Timê gotiye: "Hemû derda ez dişînim, lê cuzîke dest benda xwe da ye". Camêro, nexwaşxane tu meriya dixwe, yanê dikelîne? Bese, bese, îdî dest wan înadê xwe vekîşîne. Camêro, rabe, kincê xwe xweke, em tevî hevdu herin. Tevî hevdu jî sax,

silamet vegerine malên xwe. Tu mitala meke. “Xwedê heye, xem tunene”. *(Dikene)*. Ezê beranekî kelî qerqaşî çavreş qurbana te serjêkim. Bixwun, vexwun, bireqisin. Rica dikim, rabe, rabe, kinca xwe ke. Lez keve. Nika hemû doxtire hîviya tene.

***Perde berjêr dibe. Dik nayê xanê. Dengê mûsîqî bilind dibe*.**

## PERDE SİSYA
## *SİFETÊ PÊNCA*

***Perde vedibe. Dik tê xanê, dengê mûsîqî bilind dibe. Dengbêj kilama “Dewrêşê Evdî” distirê. Nav tirêjên şamdana da jûra[2] Seyranê tê xûyayê. Seyran û çend keç, xortên cilê sipiyê lê ser nûriştoka rûniştine. Tîtal jî nav wan da ye.***

**Seyran** – *(Serê xwe bilind dike, kesereke kûr dikşîne. Dengekî nerm)*. We boynet nexwaşê yê ku bê, cî amade kiriye? Rica dikim, usan bikin, wekî ew cara duda min nexeyîde. Tîtal, ez vî şuxulê bersîvdarî girîng dispêrime te. Eze ji te arxayînim. *(Dikene)*. Kuro, kurnebûyo, tu zanî ew kiye?

**Tîtal** – *(Vedibişire)*. Seyran, tu dîsa nolî hergav, îro jî şikber diaxifî. Qîzê, gotina te usan dertê, giva ez hemû mirovên nehiya we nas

---

[2] Jur – ode

dikim. Welleh, billeh, xênî te hela tu kesî nas nakim. Fikra xwe zelal bêje, wekî ez te fehm bikim. Şuxulê xwe usan tindirûs bikim, bizanibim ku kiye, kî çiye! Ne tu dizanî, gotina min gotine. Min gilî da, kuta bu, çû!

**Seyran** – *(Dikene)*. Kuro, îdî bese, tu xwe ewqasî dipesinî. Gelekî kûr meçe. Tuyê dawiyê bizanibî, ew kî bûye. Wê hingê tuyê îdî dest pêsîra min venekşînî. De rabe, rabe, bese xwe qure bikî. Dû şuxulê xwe here. Me nede şerme! Qewata xwe nehêvşîne.

*(Dengê tûtîna ereba doxtiriyê tê. Hemû doxtir ciyê xwe radibin. Jûrê dertên. Seyran û du doxtir diçine jûra emeliyatkirinê. Reşo kincê nexwaşxanêye li ser nivînê veleziyaye. Çavên xwe venake, dike ûfe-ûf. Car-carana dikuxe. Sewto û çend merivên ji gund hatî ser piya cem wî sekinîne)*.

**Sewto** – *(Hêdî)*. Reşo, Reşo, malik avayo, te lap dilê me teqand. Camêro, şikir xwedê, emeliyat gelekî baş hatiye qedandinê. Îdî çavê xwe veke. Em jî hevekî te ra şa bibin, yanê na! Hemû doxora emeliyatkir dipesinin. Dibêjin tilî, piyên wê zêr dibirin. Îdî çima me ewqasî ditirsînî? Lê min te ra ne digot, her derdekî dermanek wî heye? Şikir xwedê, emê çend roja şûn va te sax, silamet bibine mal. Ezê beranekî kelî qerqaş bin piyên te da qurban serjêkim. Dost, hogirên bixwun, vexwun, bireqisin. Ê, wê şunda îdî çi dixwazî? Emê bi emrê xwedê çend sala dîsa tevî hevdu jiyan bikin. Nevî, nevîçirkên xwe ra şabibin.

**Reşo** – *(Çavê xe vedike, Sewto dinihêre)*. Sewto, welleh ezîm, billeh kerîm. Tu hevalekî kêrhatiyî, pir îtbari. *(Dike ûfîn)*. Xwedê rûyê ewlada xirav reş bike. Eşedbilla, ez pêş te şerm dikim, nikarim çavên te binihêrim. Wekî usan mekira, wê diha baş bûya…

**Sewto** – *(Curekî xwe razî)*. Reşo, Reşo, rica dikim, derheqa we pirsê da qet ewqasî mitale meke. Eme berê çawa bûne, nika ji wê zêdetirin. Kal-bava gotiye: "Nebû ew, bila bibe ev". Xilaz bû, çû! Îdî tu çima xwe ewqasî dirêncînî. Lê, bi îzna xwedê, emê vê carê gotina xwe ese biqedînin. Kî çi dibêje, bila bêje.

**Kom** – *(Hemû bi hevra)*. Reşoyê bira, welleh, Sewto pirseke zehf baş dibêje. Camêro, em kurdin, tiştên cuda-muda nikarin biqewimin. Malik avayo, qîz kiye, şûtî-mûtî hewal bide. Yanê gotina bavê xwe neqedîne. Zimanê wê jêke, têke berîka wê. Serî birî, go seqirî.

**Reşo** – Sewto, ez ecêbmayê wê doxtorê me. Mine wê nedît. Berî emeliyat kirinê tiştekî nolî hewê dane ber pozê min. Wê şûn va ez haj tu tiştî tunenim. Lê min dengê wê dibihîst. Zû-zû emir dida; ewî bînin, wî daynin, yê din bidine min, digot… Çirke-çirk dihat. Lê min tu êş sih nedikir, qey bêjî tiştek didirûn. Xwezil, mine wê bidîta. Welleh, minê herdu destên wê ramûsana. Bigota: - Heval doxtor, ez ji te vir mala xwedê razime, te ez cara duda vegerandime dinya ronik. Bile rebbê jorîn bext bide te. Heta hebî, nav emrekî eşq û şa da bijî!

**Sewto** – *(Bi dengekî milahîm)*. Reşoyê bira, gelekî mitala meke. Çiya rastî çiya nayên, lê

meriv rastî hev tên. Tuyê wê bibînî, razîbûna xwe bidêyda.

*(Tîtal xelata sipiyê lê amraza xwîn pîvandinêye stuyê wî da tê jûrê nexwaşa. Selamê dide, cem Reşo rûdinê. Xwîna wî dipîve. Zenda wî digire, heta şêstî dijimire. Vedibişire*).

**Tîtal** – Apo, şikir xwedê her tiştî normale. Min qet bawer nedir, wekî doxor Seyranê vê emeliyata weye ewqasî girînge, bersivdar wa baş biqedîne. Bi rastî jî, tilî, pêçiyên wê zêr dibirin. *(Sewto û merivên wir çavên hevdu dinihêrin. Zû ji jurê dertên)*.

**Reşo** – *(Çawa veçiniqe)*. Kurêm, kî, kî, Seyran?! Ew çi Seyrane, ez emelyat kirime? Ez naxwazim wî navî bibihêm! Min zû da ew nav kûraya dilê xwe derxistiye, avîtiye binê bîreke çil arşûnî. *(Dixaze rabe)*. Rica dikim, min bibe cem wê. Wê bibînim. Bê ew kiye? Ji ku hatiye? Ji çi esliye, çi cinsiye?

**Tîtal** – *(Hêdî)*. Apo, xwe ewqasî meêşîne. Nika îzna we tunene, hûn rabin ser piya. Doxtora teyê xwe bê cem te, tuyê wê bibînî. Dilê te ra çi dibihûre, gişkî bêjî wê, razîbûna xwe bide diyarkirin.

*(Du keçên cilê sipiye lê tên. Reşo radikine ser piya. Dikevine ber milê wî. Hêdî-hêdî nav jurê digerînin. Dîsa ser ciyê wî vedilezînin, diçin).*

**Reşo** – Tîtal, kurê min, tu kî yî? Kurê kêyî? Ku dimînî? Kîjan qebîlêyî? Diqewime, ez malbeta we, yanê ji qebîla we nas bikim.

**Tîtal** – *(Vedibişire)*. Apo, ezî ne ji nehiya we me. Lê, Kurdim. Navê bavê min Elî ye. Jê ra Eliyê Ûsivê Şemo dibêjin. Bi qalkirina wî, ew

berî reva 1926-a li qeza Wanê jîne. Piştî revê malbeta me hatiye Ermenistana Sovêtiyê. Nehya Kotaîkê da cîwar bûne. Hika jî wir dijîn. Qebîla me ra Qerka dibêjin.

**Reşo** – *(Dikene)*. Ê, kurê min, ezî Şawelîkîme. Lawo, Qerka û Şawelîka birayên hevdune. Loma ewqasî xwîna min ser te dikele. Kurê min, bila xwedê bext bide te. Welleh, te xwe ra senetekî pir baş bijartiye. Jorê xwedê, jêrê doxtor dikarin meriyê gora jî rakine piya, ruh bidinê. Lawo, pirsê etiv tunene. Tu zewiciyî? Çend zarên te hene? Diqevime, tu jî nolanî cahilên nikaye eslê xwe nasnekirî dixwazî dereng bizewicî?

**Tîtal** – *(Dikene)*. Apo, welleh, hema tu jî nolî bavê min difikirî. Ça ku bêjî, hûn birayên hevdune. Xeysetê we eynî yeke. Ew jî timê ji min pirs dike; lawo, lê tuyê kengê bizewicî? Dibêje: 'Ne, ez jî dixwazim, neviyê min hebin, destê wan bigrim, bigerînim, bibime dibistan, serê wan mehez bikim. Îtbara dinê tunene, kes nizane sibê çi biqewime, kiyê hebe, kiyê tunebe. Merivên aqil şuxulên ferz derengî naxînin'.

**Reşo** –Lawo, bavê teyî raste. Hemû dê û bav çiqasî hevdu dûr bijîn, lê boynet ewlada xwastinê wane nolî hevin. Ew ewladê xwe ra edlayê û bextewariyê ji xwedê dixwazin. Hilbet, ewlad du cure dibin, yek baş, yek xirav. *(Dike ûfîn)*. Bila xwedê ewledê xirab neke qismetê tu dê-bava. Ax, ax, destê ewladên xirav! Ewladê xirav derdê bê dermanin, tu loxman nikarin wan qenc bikin. Ew dê-bav berhewan pîr, kal

dikin. Xwedê ewladê usan nede neyarê min jî. *(Vedibişire)*. Diqewime, bin çeviya te heye? Loma jî…

**Tîtal** – *(Serê xwe berjêr dike)*. Apo, ez dibînim, tu merivekî aqilî, dinê dîtiyî, dixwazî her tiştî hîn bibî, heta dawiyê bizanibî. Welleh, ezê îdî dilê xwe te ra vekim. Ê, çi firqî, tu jî bavekî nolî bavê minî. Min û doxtira te zanîngehê da tev xwendiye, tev xilaz kiriye. Nika jî tevî hevdu kar dikin. Me gilî daye hevdu, wekî xwedê hez bike, emê…

**Reşo** – *(Dêmekî şa)*. Lawo, lap sewdakî başe. Wekî hûn hevdu hez dikin, xeysetê hevdu zanin, îdî wê rindtir çi heye? *(Kesereke kûr dikişîne, ber xwe da)*. Xwezil, ez wextê da nolanî te bifikiryama. Lawo, xwedê we bextewar bike. Wekî tu min banî deweta xwe bikî. *(Destê xwe, sîngê xwe dixîne)*. Ev apê teyê sergovendiyê nede tu kesî. Of, of. Lawo, bextewar bin.

**Tîtal** – *(Dikene)*. Gilî didim, wekî ezê we ese banî deweta xwe bikim. Bavê minê sibê bê. Ezê wî we ra bikime nas. Ewî jî nolî weyî pir mislihet kêşe. Bawerim, hûnê hevdu ra rind ziman bibînin, dilê xwe valakin.

*(Perde berjêr dibe. Dengê mûsîqiyê tê. Dengbêj kilama "Hey Dilberê" distirê. Dik nayê xanê)*.

**PERDA SİSYA**
***SİFETÊ ŞEŞA.***

***Perde evraz dibe. Dik nav şeveqê da tê xanê. Reşo kincê nexwaşxanê da veleziyaye. Gelekî nerihete. Zû-zû dêrî dinihêre. Du keçên cilê sipiye lê tên. Cilê Reşo diguherin, cilê malê lêdikin. Reşo radikin ser piya, dikevine ber milê wî. Hinekî digerînin, dîsa datînine ciyê xwe. Derî vedibe, Tîtal tevî bavê xwe dikevin hundir. Selamê didin, Reşo selama wan vedigire, Tîtal û meriyê hatî dinihêre, milê xwe hildikişîne.***

**Tîtal** – *(Dikene)*. Apo, min gilî dabû, bavê xwe bînim, we ra bikime nas. Min qewlê xwe qedand. Keremke, bavê min ra bibe nas. *(Wana destê xwe didine hevdu, navê xwe dibêjin. Elî cem Reşo rûdinê)*.

**Reşo** – *(Dêmekî geş)*. Eliyê bira, eferim, eferim te ra. Eşedbilla, te helal be. Te torekî gelekî baş daye kurê xwe. Beriya gotiye: "Têke nav ava heram, vexwe, of nabêjî". Meriv dikare pêş ewladên usan va ruhê xwe nehêvşîne. Kurên usan milet ra pêwîstin. Nika hineke beredî hene, ne kêrî xwe tên, ne jî kêrî milet. Rojên xwe vala, bê kêr derbaz dikin. Xênî şuxulên xirab tiştek destê wan nayê. Xwedê bila ewladên xirab neke qismetê tu kesî. *(Dike ofe, of)*.

**Elî** – Reşo bira, kal-bava gotiye: "Heta ava bîrê xwe tunebe, tijî kirinê va bîr têr av nabe". Hilbet, boynet ewlada torê dê-bava eseye. Lê, gerekê ewladê xwe da jî tiştek hebe, wekî gotinêd dê-bavê xwe qebûl bike. Bizanibe, çi wî

ra xêre, çi ziyane. Piştî dibistana navîn kutakirinê min nedixwest wekî Tîtal xwendina xwe bidomîne. Wî ji min hîvî kir, ez miqabilî xwesteka wî derneketim. Nika jî… Bira, bila ewladê te jî bextewar bin. Ewlad dara behre, çiqilekî wêyî tele, yekî şirîne. Kê ra kîjan ket. Tu jî behra ewledê xwe şirîn bibînî. Şikir, ezî Tîtalê xwe gelekî razîme. Nav van salan da ewî tu cefa nedaye min. Boy hemû kirinên xwe bi min şêwiriye, paşê qedandiye. Nika jî dîsa…

*(Derî tê kutanê. Tîtal lez berbi dêrî diçe, vedike. Profêssor, Seyran û çend doxtor cilê sipî da dikevin hundur. Profêssor selamê dide, Reşo û Elî selama wî vedigirin. Reşo nişkêva Seyranê dibîne û nas dike. Bawer nake, wekî ew Seyrana wî ye. Xêleke xurt netika xwe miz dide, wê mêze dike).*

**Profêssor** – *(Dêmekî geş)* Reşoyê bira, keremke, doxtora xwe ra bibe nas. *(Milê Seyranê digre, berbi wî dibe. Seyran dike îskîn, xwe davêje hemêza bavê xwe. Reşo qet nizane, wê çawa hemêz dike, milê xwe çawa stuyê wê ra dibe. Dêmekî poşmanî, gunekar profêssor dinihêre. Profêssor vedibişire, destê Tîtal jî digire, tîne cem Reşo).* Birayê min, bîr meke, ev jî kurê teye, wî ra jî bibe nas. *(Destê xwe dihejîne)*. Dinê wa hatiye, wê wa jî here. Axiriya mitala tunene.

*(Reşo destê xwe stuyê Tîtal ra jî dike, wî hemêz dike, maç dike. Vê demê Rindê du boxçe destê wê da tê. Çavê xwe bawer nake. Kengê herdu doxtira hemêza Reşo da dibîne, 'simila, simila' dibêje)*.

**Reşo** – *(Berê xwe Rindê da dike*). Were, were, bila hesret dilê derê. Bê min kî hemêz kirine, kî hatine cem? Min ewladek unda kiribû, lê nika du ewlad dîtine. Were, tu jî wan hemêzke, kul-derda dilê xwe derxe. Bila îdî dilê te rihet be. *(Tîtal ra).* Hey lîstîkvano, lema ev çend roj bûn, te ez dikolam. Va alî, wa alî rast dikirim, erê? Kêleka min cîkî nediçûyî. *(Tîtal serê xwe berjêr dike)*.

**Rindê** – *(Halekî şikber da)* Reşo, malik avayo, wellah, billeh, min qet tiştek fehm nekir. Ev çi hale, ev çi tewale? Çi hevdu hemêz kirine, çi ewlad dîtine? Mêrik, diqewime, te hişê xwe unda kiriye? Hindik dimîne dilê min biteqe. Zû her tiştî min ra şiroveke yanê na!..

**Reşo** – *(Dikene)*. Jinik, ne bimre, ne jî bila dilê te biteqe. Xwe hinekî xweyîke. Te çi dixwast, ew jî hatiye sêrî. Îdî çima wan sêrbaziya dikî? Xwe va alî, wa alî davêjî. Hişê min, nika hatiye serê min. Ezî şaş bûme, ewe rast bûye. Nika ez boynet şaşiya xwe pêş wê şerm dikim. Nizanim çi bikim. Dibêjim: - Qîza min, ez qurbana te me, min bibexşîne *(Seyran radmûse)*. Lawo, min pir neheqî te kiriye, mine efû bike. Lê îzna xwedê, ezê vê carê şaşiya xwe rast bikim. Te ra deweteke bi dilê te bikim. Temam êl, ove bêne temaşe wê. Ezê berbirî hemû dê, bava, bira, qewma bêjim: Gelî amede, ez ji we hîvî dikim, hûn nolî min bê însaf nebin, mitalê xirav ji dilê xwe bavêjin, azayê bidine ewladên xwe. Bila bextê xwe ew xwe helkin. Bila ew jî bibine hineke mîna Seyrana min.

**Elî** – *(Dikene)*. Reşo, Reşo, malik avayo, xwedê ji te razî bûyo, te min ra qet tiştek nehîşt, wekî pê biaxifin, dilê xwe valakim. Eşedbilla, te her tişt him pîva, him jî birî. Îdî min ra tiştek nehîşt. Bila ser gilî gotinên te be. Ez jî wan ra bi dilekî eşq dibêjim: - Gelî ewledên min, bila xwedê we bextewar bike, hûn nav jiyanê da tu tengiyê teliyê nebînin. Sax, silamet, têr ewled, têr dewlet bin. *(Tîtal û Seyranê radmûse)*. Şikir xwedê, her tişt bi xwestina min bû. Kal-bava gotiye: "Tu nekira, tu nayê pêşiyê". Reşoyê bira, xwişka Rindê, xwedê rûyê we sipîke. Bila xwedê mirazê we wana bike. Em wana timê nav emrekî şa, bextexar da bibînin. *(Ew û Reşo hevdu hemêz dikin)*.

**Rindê** – *(Kelogirî dibe, milê xwe stuyê Seyranê û Tîtal ra dibe)*. Qîza min, tu zanî, min boynet vê roja te çiqas şevên bê xew, rojên tele girîng derbaz kirine. *(Reşo dinihêre)*. Vî bê însafê bavî te çi zulim, zelûlî anîne serê min, ew tenê xwedê zane. Ez wê dinê wî nabaxşînim. Ewê boy kirinên xwe ese nav agirê cehmê da bişewite. Nika hezar şikir, ji dayîna rebbê jor, wî ez bîra xwe dernexistim. Dîleka min qebûl kir, min ev roja çavê xwe va dît. Bavê te jî boy hemû gunehên xwe poşman bû, dît kî heq bûye, kiyî neheq bûye. Şikirdayîna xwedê ra hemû xwestinên min hatine qedandinê. Ezê îdî gorê da rihet razêm. Lawo, bila xwedê mirazê we hevdu bike. Bibine du gulê bîne, ne çilmisî. *(Dubar hêsrên xwe paqiş dike, wan radmûse).*

***Profêssor*** *– (Dikene).* Gelî bê însafa, axir usan nîne? Wê îdî lap ji teberê derxist. Heyran, ez we hîvî dikim, piyên xwe anagorî lihêva xwe dirêj bikin, milê xwe stuyê wan berdin. Ew ne ewladê we, ewladê minin. *(Destê Reşo, Elî dike hevdu)*. Gelî birayên mine delal, ez we pîroz dikim. Bila xwedê ewladê we bextewar bike. *(Seyranê, Tîtal hemêz dike, maç dike. Hêsrên xwe paqiş dike. Seyran û Tîtal destê hevdu digirin, ji dikê diçin. Ew dû wan dinihêre, kesereke kûr dikişîne)*. Herin, herin, gelî gulên mine bêhn xweşe, ne çilmisî. Xwedê we hevdu pîroz bike.

***Perde berjêr dibe. Dik nayê xanê. Dengê mûsiqiyê tê. Dengbêj kilama "Yar Şemamê" distirê. Dûr va dengê strana keçikan tê, kilama "Her wer, were, lawko were" distirên.***

Ha wer, were, lawko were,
Ca wer were, lawko were.
Eme zû da hîvya tene,
Em heyrana bejna tene.

**Dawî.**

2010.

**Çend giliyên kurt derheqa dîroka nivîsara pyêsa "Seyran"ê da.**

Wedê min salên dirêj komara Ermenistanê wezereta perwerdê da kar dikir. Boynet dibistanê navîn da hînkirina tore-telîm, zû-zû diçûme nehiya. Rojeke ev qewmandina rûsipîkî kurdî pirzaneyî, milethez min ra qal kir. Min ji wî hîvî kir, wekî ew min bibe cem Seyranê. Wî rica min qebûl kir.

Em tev çûne nexwaşxana nehiyê, min Seyran dît. Ew îdî dayîka çend ewledên gihîştî bû.

Lê, min Tîtal nedît.

Seyranê got: - Dewletê Tîtal şandiye Moskvayê, ewê wir du sala bixwîne.

Dema apo Kerem armanca hatina me wê ra got, ew vedbişirî, rûyê wî nihêrî got: - Apo Kerem, şerm bû, te çima ev camêra aniye, min asê kiriye. Tiştê buhurî, meriv ewqasî jî pey nakeve.

Got û keniya. Em jî tevî kenê wê bûn. Wê bi zimanekî pir ferihî û maqûlê qewmandin destpêkê girtî hetanî dawiyê qal kir.

Min gilî dayê, wekî ezê vê qewmandina binivîsim, bigihînime gelê xwe.

Min ew nîvîsî. Lê girêdayî çend meselê emira, ew bîra min derket. Deme 2010 salê min arxîva destnivîsarên xwe tindirûs dikir. Dubar rastî wê destnivîsarê hatim. Min pêş rûhê Seyranê giliyê xwe qedand, ew temem kir.

***

Nenihêrî gelê kurd qurna bîst û yekê da dijî, lê telebextî ra heya nika jî nav gel da bavê nolanî Reşo gelek hene. Ew nikarin bin bandora erf-edetê wede derbazbûyî derên. Bûnê dîlên

wan, ewledê xwe bê dilî wana dizewicînin. Miqabilî xwendina wana (îlahî ya keça) dertên. Dawiyê ew keçan ya zû dinya xwe diguhezin, yanê jî nikarin malbetê xwe ra çêkin. Hevdu dûr dikevin. Boynet ev kêmasî nav gel bêne hildanê, deynekî pir giranî, girîng dikeve ser milê rewşenbîrên kurd. Gotî, her rewşenbîrek pêwîste miqabilî van kêmasiya şer bike...

# MİHO Û TELÎ

**Çar perde.**

***Rola diqedînin:***

**Miho** – 24 salî, gavanê êla Bişar begê.
**Têlî** – 17 salî, keça Bişar begê.
**Bişar beg** – 52 salî, begekî xwînxar, xwe razî.
**Gul** – 42 salî, dayika Telî yê.
**Sehîd beg** – 48 salî, merivekî pir dewlemend.
**Ahmed axa** – 61 salî, dostê bavê Bişar begê.
**Şêx** – 64 salî, merivekî durû. Dostê bavê Bişar begê.
**Memmed** - 26 salî, gavan. Hevalê Miho.
**Gulîzer** – 18 salî, dezgirtiya Memmed. Hevala Têliyê.
**Carî** – 35 salî, mala Bişar begê da kar dike.
**Serek xulamê mala Bişar begê** – 40 salî.
Kome xulam, çend carî. Xêlek merivên din. Yê ku hatine temaşa Bişar begê

## PERDA YEKÊ

***Perde evraz dibe. Dik paqiş tê xanê. Mala Bişar begê. Mal bi cure mala dewletiya, bi her cure kêr-menîa va hatiye xemlandinê. Xalîçe û gulave raxistiîne. Fêzê çend doşekên hiriyêye dirêje kêmber hene, ser***

***wan belgiyên mezin danîne. Gul û Têlî pêşberî hevdu rûniştine, şirîn-şirîn diaxifin. Vê demê Miho destê wî da şivdar, kincê xilmete lê çend nane biçenkê da der mala wan ra dibihure. (Berê nav kurdên koçer da edetekî wa hebû; wedê êvarê garan dihate ovê bi novetêva her malekê nanek didane gêvîn). Gul wî dibîne.***

**Gul** – *(Têliyê dipirse)*. Lawo, ez qurban. Îdî çavê min pak nabînin. Bê însafê bavî te, ez berhêwan kirime pîreke hevtê salî. Cimaetê qetandime. Ez xêncî merivên berê nika kesî nas nakim. Şev, roj nolî kevotkekê qefesê da me. Dernayême nav cimaetê, êlê nabînim. Emrê min nav zulm, zelûliyê da dibihure. Dawiya minê çawa bibe, ewê xwedê dizane. Beriya gotiye: "Wedê merî hevtangê xweyî tevjînê nabîne, rojên wî nav ax kesera da derbaz dibin". Çawan bikim, xwedê eniya min wa nivîsiye.

**Têlî** – *(Halekî melûlda)*. Dayê can, te lap dilê min teqand. Tu çima wa berhêwan navê pîrtiyê tînî ser xwe? Hevtangê te hela qet haj bayê dinê tunenin. Welleh, ew kesk, sor, zer xwe dikin. Çav, buriyên xwe kil dikin, bisk û guliyên xwe têl-têlî dikin, xwe dixemlînin. Dîlana da dora sergovendê nadine tu kesî da. Usan direqisin, meriv wan hişmetkar dimîne, hew dizanî keçên çarde salîne. Lê tu dibêjî, eze pîrim, zara ber çavên xwe mezin bûyî nasnakî. Ew Miho ye, kurê Evdoyê Beşkî ye. Wedê ez zar bûm, ew tevî dayîka xwe car-carana dihate

mala me. Em tevî zarê apê min hewşa me da malok-malok dilîstin. Ber destê te bişkûrî jî dikir. Nika gavanê ovêye.

**Gul** – *(Keserekê kûr dikişîne)*. Lawo, tu derheq wî da usan hûrgilî diaxîfî, dîtiyê bêje, te navika wî biriye, yanê jî tevî wî barava nan, xwê, av xwariye. Ne, tu jî nolanî min şev, roj qefesêda yî… Kengê ji min dûrketî, wekî wî ewqasî nêzîk va nas dikî? Roja teye jî nolî roja mine. Zulma bavê te ez helandime, wê te jî bihelîne. Ez seva xwe mitale nakim, kula min tuyî. Destê vî gurî da halê teyê çawan bibe?!

"Tîra li minê, dîsa li minê". Nizanim, serê teyê kîjan kevirî bikeve. Xwezil, min roja teye baş bidîta. Ezê gorê da rihet bibûyama. Lawo, şuxulê xwedêye Xelîl begîne. Bê xortekî wayî bedew ra gavanî kiriye qismet. Ew gerekê lawê axakî, begekî bûya. Wekî dîndara wî cimaet têr nebûya. Welleh, vî emrî da huba min jî firî ser wî. Xwezil Îsmaîlê min jî bibe yekî mîna wî. Ezê royê hezar carî şikirbûna xwe xwedê bînim. Lawo, "Giha ciyê qirêj da pir şîn dibe".

**Têlî** – *(Dêmekî nerazî)*. Dayê can, min qet tu wa pozbilind nizanibûyî. Timê digot, dayîka min baştir, sadetir dayîkê kesî tunenin. Lê ça ku eze xalifî bûme. Çima gavantî, şivantî etve? Xwedê ew jî xuliqandine, îdî tu çima wan begem nakî? Wekî nolanî pismamên me mêra bikujin, jina birevînin, wê wî çaxî xweşa te bên, erê?!

**Gul** – *(Mitheyr, mitheyr wê mêze dike, vedibişire, destê xwe stuyê wê da dibe, maç dike, kelogirî dibe)*. Eferim, eferim te ra, lawo, beriya rast gotiye: "Kur hêla bavê da, keç hêla

dê da dikşîne”. Min miçerbî te derdixistin. Welleh, te gelekî kişandiye ser nisla min, ne ku ya bavê xwe. Ez vê bersîva te ra gelekî şabûm. Ezê îro dilê xwe te ra vekîm, tu îdî her tiştî fehm dikî.

**Têlî** – *(Wê hemêz dike)*. Dayê can, eze zûda hîviya vê xwesteka te bûm. Çima ez nabînim tu, bavê min çawa hevdu ra rê diçin? Mehe, sala hevdu ra na axifin. Ez hemû tiştî dibînim, lê xwe ker dikim, giva min haj bayê dinê tunene.

**Bişar beg** – *(Bi hêrs dikeve hundur diqîre)*. Xwedê ser xêrê binivîse. We ku serê xwe kuta hevdu, derheqa qenciyê da gilî tunene. Dîsa hûn vizê kê dikin?! Yeqîn, we hemû şuxulên xwe kuta kiriye, erê? De rabin, rabin, ez we careke din wa nabînim!

**Gul** – *(Bi hêrs wî dinihêre, keserê dikişîne)*. Hey kevirê te, ji kevira cuda bûyo, ew çi buxtane tu ser me da dikî? “Mirîşkê hêk kir xwe ra heval çêkir”. Me heta nika mala kê xirab kiriye? Mal xirabkirî tuyî! Bavî, hatî xeraba xwe usan bike, wekî hinekî dilê me bi te bişewite. “Kurmê şîrî, heta pîriye”. Tu çawan hatî, tuyê usan jî bimînî. *(Dê û keç çavê herdu dinihêrin)*.

**Têlî** – *(Dêmekî nerazî)*. Dayê can, hinekî serê min diêşe, dixwazim qasekî herme cem Gulîzerê. Îro çend roje me hevdu nedîtiye, wê ji min bixeyîde.

**Gul** – Ez qurban, dilê teye çawa dixwazî, usan bike. Lê, hinekî zû vegere. *(Çavê Bişar begê dinihêre)*. Lawo, bê wê jî, em bûne dizê sola xwe, emê ber van rexne, rezîliya jî deyax bikin.

Bê ewê paşê derheqa me da çi buxtana hevdu bîne.

**Bişar beg** – *(Bi hêrs)*. Çawa bêjî, gotina min ne gihîşte ne te, ne jî dayîka te, erê?! Çima ew doxtira teye? Wê bibînî, êşa serê teyê elbêra dayne? Baş, baş! Lê, bîr mekin; gaz, meqese destê min da ne, ha. Ez usan bikim, tu ew sêwî salava hevdu nebînin! Tuyê wî çaxî rind bizanibî, bavê te kî bûye. Here, here, bila êtîmok êşa serê te sax bike.

**Gul** – *(Ber xwe da)*. Xwedê, mala vaîsa tûr-tevez bike. Ez ku, tu ku! Ewladên wan, ber wan bibine kibab! Ew bikevine belake, vê bela min xiravtir, ku bizanibin çi bi min kirine, ez çi dikişînim!

**Têlî** – *(Wê hemêz dike, radimûse)*. Dayê can, ez qurbana te me, evqasî xwe meêşîne, hêrs nebe. Min îdî têr xwar, ez tu dera da naçim. Bila dilê bavo hêsa bibe. De rabe, rabe, dêmê xweyî bedew veke, ez te binihêrim, şa bibim. Ne tu hemû dayîka bedewtirî!

**Gul** – *(Kelogirî)*. Lawo, rind bizanibe, bê vê bextreşa dayîka te destê vî xwînxarî da çi kışandiye? Ez bûm, birayek bûn, vî qetilkarî destê min û wî jî hevdu qetand, warê bavê min porkurê reş hîşt. Ew şande ciyê hate, nehatê heta roja îro kesek salxê wî nade. Çavê min riya wî qerimîne. Şev, roj hîviya caweke wî me. Merivekî xerîb ku ji cîkî dûr tê, dilê min dike çirpîn. Zû qasidekî dişînime cem. Lê… Ev derdê min ku bidana kevira, kevirê biheliyana. Ez ne heliyam, mirov kevir mehkemtire.

**Têlî** – *(Ber dilê wê da tê)*. Dayê can, te dilê min tîş-tîşî kir. Gelekî mitala meke, bila Îsmaîl û Arifê teye sax bin. Yek birê te, yek jî kurê te. Ez jî *(dikene),* xwîşka te.

**Bişar beg** – *(Gelekî hêrs çavê Gulê dinihêre)*. Şivana qîza şivana, min wede da çi pêwîst bû, hemû kir. Dilê xwe li wan serqot, pêxas mal bavanî te rihet kir. Lê tiştekî herî mezinî ferz fewitand. Gerekê min zimanê te jêkira, pajika guhê te ra derxista wekî, roja îro te wa nekira bilebil! Wî çaxî guhê minê lap rihet bûbûya.

**Gul** – Wey lê, waymûş nebûyî. Malbavanê min ji destê te serê xwe hildan. Ji vî welatî dûr ketin, çûne ciyên usan, wekî dengê seyên te jî nebihên. Îdî çi ji min dixwazî?

*(Vê demê dengê Ahmed axa tê. Cilê nûhe lê. Serê wî da papaxê bixare, piya da sapoka (gîzme) çerma, zehf xwe razî tê dike. Selamê dide, Bişar beg ber radibe. Gul û Têlî zû ji dikê diçin).*

**Ahmed axa** – Bişar beg, serê keko, min gelekî bîra te kiribû, lê ji te tu deng nehatin. Bê însafo, çima çi bibe, wekî tu carekê derê min vekî? Tu kevirê kilîsa Fila da bikevin, yanê tuyê hatina xwe poşman bibî? Emrê me îdî nîvî derbaz bûye. Vir ha şûn va gerekê em zû-zû hevdu bibînin, gilî gazinên xwe hevdu bikin, wekî dilê me hinekî hêsa bibe.

**Bişar beg** – *(Ber xwe da).* Yeqîn dîsa şuxulekî wî xar bûye; ya hatiye avê, yanê êgir. Lema usan şirîn-şirîn dest pê kiriye. *(Ahmed axa ra)*. Axayê delal, welleh ezîm, billeh kerim, min jî pir dixwast, wekî te bibînim. Lê şuxulê

êlê usan kiriye, navê min bîra min derketiye. “Kotan çi dizane, qaîş çi dikişîne…” Kal-bava rast gotiye: “Derdê êlê girantir, tu derd tunenin”. Malik avayo, hinek têne avê, hinek têne êgir. Du bira hevdu ra pev diçin; diziya hevdu dikin; jin, keçên hevdu direvînin!... De were, bê tuyê van derda çawan derman bikî? Kê ra çi zimanî bibînî? Êh, jimarê va kuta nabin.

**Ahmed axa** – *(Dikene)*. Begî sax be. Te ewqasî halê xwe da got, ez gotina xwe noşman bûm. Xwedê kur hîşto, xwe gelekî seva êlê meêşîne. Lê, ser va bernede, wê stuyê te siyar bin, ha! Boy wan hindikî bike, gelekî ji wan hilde. Heta wan ne givişî, serê xwe te ra xar nakin. Tê bîra te, rehme lê bûyê bavî te ew çawa nolî terşa didane xebatê? Qafê wan da usan lêdida, wan heta mirinê serê xwe bilind nedikirin… Bira can, tu qet pirs nakî, nabêjî, mêvano, te xêre, tu çi qewî hatî?

**Bişar beg** – *(Curekî nerazî)*. Ahmed axa, ew pirseke ne caîz bû, te got. Meriv qet mêvanê xwe ra dibêje, mêvano, tu çi qewî hatî? Wekî pêwîst be, mêvan xwe armanca hatina xwe eyanke. De kerem ke, kerem ke, ez te dibihîzim.

**Ahmed axa** – *(Hinekî şikber, va alî, wa alî dinihêre)*. Bişar beg, xwedê jî dizane, bende jî rind dizanin, wekî qedrê te cem min çiqas geleke. Ez hê berê da gelekî nêzîkî malbeta we bûme. Tu dizanî, min rehme lê bûyê Têmirê birayî te çiqasî hevdu hez dikir? Geleka xwezila xwe hevaltiya me dianîn, hineka jî çavneberî dikirin. Kor bim, seva wî hafadî! Emrê xwedêye,

hatiyê herin. Bira can, çi ji te veşêrim, çi ji xwedê… Ez qasidê Sehîd begê me.

**Bigar beg** – *(Çawa veciniqe, awirê tuj va çavê Ahmed axa dinihêre)*. Ahmed axa, min fehm nekir? Rica dikim, nêta xwe hinekî zelal bêje. Sehîd beg ku, ez ku? Ew çi qasidiye, wekî tu boynet wî dikî? Nav min û wî da tu tiştekî parve vekirinê tunene. Lê, çawa heval, em qedrê hevdu gelekî digirin. Diqewime, ji aliyê min da wî pirseke nelayiq bihîstiye? Bawer nakim! Çi bêjim, her tişt diqewime. Wekî tiştekî usan hebû, bila xwe min ra bigota. Îdî çima ev zehmetê giran dida te? Ne ew, ne jî ez, em hevdu ne ditirsin, ne jî şerm dikin. Car-carana *(dikene)*, em hevdu ra hevaltiyê jî dikin, Wanê rastî hevdu ten. Welleh, em hevdu ne êşyane, ne jî hevdu ra tiştek gotiye!

**Ahmed axa** – *(Vedibişire)*. Bişgar beg, ev qasidiya mine îro hevaltî û dostiya weye ku hûn hevdu ra dikin, pir evzeltire. Armanca vê qasidiya min pêştir kesek nikare bîne serî. Wekî îznê bidî, ezê armanca xwe qal kim.

**Bigar beg** *(Bê sebir)*. Ahmed axa, te lap sebra min birand, ez kirime nav mitalên kûre, dûr. Malik avayo, heta mis, mis dibêjî, carekê va îdî Mistefa bêje. Ez jî hildim, daynim, bersîva xwe bidim û pêş te û Sehîd begê şermende nebim.

**Gul** – *(Halekî şermoke tê dikê, berbirî Bişar begê dibe)*. Bişar beg, rica dikim, îznê bidî, bila carî qawê bîne. Çima Ahmed axa gelekî hatiye mala me?

**Bigar beg** – *(Çavê wê dinihêre, vedibişire)*. Welleh ezîm, billeh kerim, gora keko kim, ez derheqa te da çi bêjim, çi nabêjim. Dilê min tu car ber te dernayê. *(Ahmed axa ra çav dike)*. Xwedê kulfeta esilzade nake qismetê her kesî. Ezî hêla te da zû da bextewarim. Xanima min, bêje, bêje bila qawê bînin *(Gul bi hêrs wî dinihêre, serê xwe berjêr dike, ji dikê diçe)*.

***Perde hêdî-hêdî berjêr dibe. Dik nayê xanê. Dengê strana bilind dibê***.

## PERDA DUDA

***Perde evraz dibe. Dik tê xanê. Têlî û Gulîzere rûniştine. Hêdî-hêdî diaxifin, carna va alî, wa alî dinihêrin. Têlî dengekî mede kirî berbirî Gulîzerê dibe.***

**Têlî** – Gulîzer, xwîşka mine delal, tu dizanî, wekî ez te pêştir sêra dilê xwe kesî ra nabêjim. Tu him hevala min, him jî xwîşka minî. Qizê, van mitalê bê xilazbûyî, îdî ruhê min xwarine. Nikarim, xwe ji wan xilaz bikim. Ez şev, ro kuda diçim, tenê Miho pêş çavê xwe dibînim. Ew geh berbi mala me tê, geh ji mala me dertê. Vedigere min dinihêre. Em nêzîkî hevdu dibin, nişkêva bavê min tê xanê. Em xwe vedişêrin… Nizanim, ev mitalê çi bîne serê min? Wê kengê kuta bibin? Duh êvarê ew eşkela pêş mala me ra derbaz bû, dayîka min ew dît. Gelekî xweşa wê pê ra hat. Lê got: - Sed heyf, wekî kurê

gêvîne. Min hizir kir, sîtile ava kelandî ser min da vala kirin. Hindik ma, dilê min bisekine. Lê min xwe xweyî kir.

**Gulîzer** – *(Vedibişire)*. Xwîşka min, çima bîra te derketiye, wedê rehme lê bûya Xatiya Kew ku dihate mala we, carcaran Miho jî tevî wê dihat. Ez jî tevî diya xwe dihatime bal Xatiya Gul. Em hewşa we da malok-malok dilîstin. Miho timê seva te malok çêdikirin. Tu digiriyayî. Te malok hildişandin. Wê feqîrî dîsa çêdikirin. Şikir, hûn îdî mezin bûne, dîsa tevî hevdu xwe ra malokekê çêkin. Xwedê hûn hê piçûktî kiribûne hevalê hevdu. Dest mitalê vala vekişîne, tişteka baş bifikire.

**Têlî** – Gulîzer, tu usan arxanî, arxanî diaxifî, dîtiyê bêjin tu teze hatî vê dinê. Te qet haj bayê dinê tunene! Şi vê dinê da ciya, banî, kaş, kerîş, hût hene. Hût meriva dikişîne hulfa xwe. Kes nizane çi te hat. Dibêjî mitala meke? *(Navbirî)*. Qîzê ev çend salin em hevdu hez dikin. Me car-carana dizî hevdu dît. Tirsa nolî berfê, baranê zû ji hevdu diqetiyan. Nika îdî wede pê ra gihîştiye.

**Gulîzer** – *(Dikene)*. Têlî, tu dizanî, wekî ez nav kurxatiyên xwe da qedrê Miho gelekêi digirim. Eze hazirim, riya wî da serê xwe bidim. Wî ev sêra xwe zû da min ra gotiye. Arxanî be, ewî jî roja te da ye. Ew feqîra jî nav mitala da dikele. Nizane çi bike, kuda here. Belengazê apo Evdoyî sax bûya, belkî dermanek bikira. Têlî can, "Pirgotin, can sotine". Tirsê dilê xwe bavêje, tirs mala meriya dişewîtîne, hemû xwestinên meriva bê bersîv dihêle. *(Vê demê*

*Miho nişkêva tê dikê, Têliyê ku wir dibîne, ji şabûna hindik dimîne, xwe undake. Gulîzer wî dinihêre, dikene. Têlî jî pir şa dibe. Gulîzer wî cem xwe dide rûniştanê. Ew û Têlî bin çeva va hevdu dinihêrin, dikenin)*.

**Miho** – *(Bi dengekî merhemet)*. Keçxatî, welleh, şuxulê xwedê kes nizane, min qet bawer nedikir, wekî ezê îro Têliyê bal te bibînim. Usan roj tunenin, ez seva wê bibînim, nêzîkî mala wan ra derbaz nebim. Lê, carana dûrva wê dibînim, hinekî dilê min hêsa dibe. Çi bikim! Xwedê wa eniya min nivîsiye.

**Gulîzer** – *(Dikene)*. Kurxatî, de nika têr-têr, arxanî Têlî xwe binihêre. Bila dilê te rihet bibe. Tu hevdu dîtinên we, wê nolî îro bê tirs nebin. Welleh, tu çi dikişînî, ewa jî wî dikişîne. "Dîtina çava, mirazê dilane". Pir mitale meke. Misileteke bal xwedêye, kesek pê nizane. Yeqîn xwedêyê we ra jî dergekî veke hûnê mirazê xwe şa bibin. Welleh, ezê her ro duayê xwe li we bikim.

**Têlî** – *(Dengekî bedew)*. Xwîşka min, belkî xwedê bi wan duayên te li me bê rehmê. Yanê... Yalê bendeyên xirab da tu xêrê li me nabe! Nika bendê xirab, bendê qenc zeftirin. Şuxul ku kete destê wan tu av û kefenê me hazirke. *(Herdu dikenin)*. Tu şev, roj tenê wan duayên xweye tiverikî bike, bila xwedê me bê rehmê. *(Nişkêva Gul tê dikê. Her sê ciyê xwe radibin. Gul destê xwe va eşaretiya 'rûnên' dide. Têlî û Gulîzer rûdinin, lê Miho elbêra ji dikê diçe)*.

**Gul** – *(Zarekî şirîn)*. Gulîzer, lawo, ew xorta kurê Kewa rehmetî nîn bû? Belengaza Kewê bê wede çû rehmê xwedê. *Evdeke* gelekî baş bû. Keçtî me gelek cara hevdu ra hevaltî dikir. Paşê riyên me hevdu cuda bûn. Wê Evdo, ez jî ketime destê vî gurê harî, zulumkar. Êh, çi bêjim, wey bext! Wey bext! Patşê gote keça xwe "Lawo, ez bext bidime te, yanî text?" Keça wî dibêje: "Bavo, tu bext bidî, textê xuberê bê".

*(Gulîzer û Têlî halekî xofgirtî hevdu dinihêrin. Nizanin derheqa vê mesela Miho wê ra çawa bêjin. Gulîzer çava va eşaretiyê dide Têliyê; 'bêjim, yanê na?' Têlî bi eşaretiya serê xwe va 'bêje, bêje' dike. Ji dikê diçe)*.

**Gulîzer** – *(Tirse-tirs)*. Erê xatî Gul, ew Mihoyê kurxatî min bû. Xortekî gelekî rûnermî, xebatheze. Lê, bextê wî jî…

**Gul** – *(Dengekî milahîm)*. Qîza min, çima bextê wî çi pê hatiye? Welleh, kurê rehme lê bûyê lap xortekî berbi çeve. Gelekî rehmê lê bûyê çûye, ne ku Evdo. Evdo, hema xortiya xwe da yekî xilo-pilo bû. Min qet bawer nedikir, wekî Kew wî qail be. Êh, lê kî keça kurd dipirse, tuyê kê bikî, kê nakî? Keça kurd tewşeyê heywanekêye. Dilê bavê kê dixwaze dide wî. Yanê jî diravê kêyî pire, ew jî dikire! "Dîwar hildişe, toz dikişe" Derheqa paşeroja da kesek nafikire. Xwezil, keça kurd ne xuliqiya, ne jî ev zulma bikişanda. Lawo, te dîsa ser birînên min vekirin… Loma jî hinek xwe darda dikin, hinek jehrê dixwun, hinek xwe davêjine behra, cema, xwe dixeniqînin, hinek jî bê sero-bin unda dibin. Daykeke bê dil mêrkirî wedê kurê wêyî

bermiraz diçe rehma xwedê, ew ser kurê xwe da wa digerîne: "Te çivîka bask zerê / Daniye ser kevirê kerwanserê / Derdê dil daye, ser derdê cegerê". Lawo, agirê hubê, agirê cegerê gurtire, şewattire. Ew venaêse, te ra diçe axberê sar!

**Gulîzer** – Xatî Gul, dixwazim pirsekê bêjim, him ditirsim, him şerm dikim. Nizanim, tuyê min xelatkî, yanê celatkî! *(Ciyê xwe radibe, berbi wê tê, destê wê radimûse, dide ser herdu çavê xwe. Vê demê Têlî lez tê dikê, çavê Gulîzerê dinihêre. Gulîzer serê xwe va eşaretiya "na" dide)*.

**Têlî** – *(Dengekî nerm)*. Dayê can, wedê hatina bovoye. Bizanibe ku eme dîsa cem Gulîzerêne. Wê kevir, kuçika beravî serserê min bike. Were, were, îdî em herin.

**Gul** – *(Têliyê ra)*. Ez qurban, delîla te me. Tu here, ezê hinekî şûn va bêm. Qet metirse, eze zû da fisildûmana bavê teye beledim. Wê bêje, bêje, xwe biweste, bisekine. *(Têlî dikê diçe. Gul berê xwe Gulîzerê da dike)*. Qîza min, ne şermke, ne jî bitirse. Pirs ku hat, gerekê bêjî. Ya xêr, ya şer. Ne gotin gunehekî girane, meriv dikeve ber guneha.

**Gulîzer** – *(Soro-moro dibe, serê xwe berjêr dike)*. Xatî Gul, ev çend salin *(Diwîwiqîne)*, Têlî û Miho hevdu hez dikin. *(Destê xwe va rûyê xwe dipeçine, dixwazê here. Gul milê wê digire. Curê veçiniqe. Guhê xwe bawer nake. Şûna xwe da çawa biqerise dimîne. Tenê çavê Gulîzerê dinihêre)*.

**Gul** – *(Xêlekê şunva, halekî pejmûrde da)*. Gulîzer, lawo, ev çi caweke nevxêr bû, te da min? Qîza min, bextê te me, vê pirsê ne hilde, ne dayne! Bila Bişar beg pê nehese, wê dinê kafkûn bike! Eman, eman, destê wî gurê harî ziyankar! Tu nizanî ew çiye! Heyfa wî xortî. Bila xwe meke ber gulla wî. Bal wî meriv kuştin, wek çivikek kuşinêye. Çima qîz tenê Têliya mine? Welleh, ew xorta qîza kê bixwaze, wê destê wî ramûsin. Wî xwînxwarî çavên gelek dayîk û xwîşka nav hêsrên xwînê da hîştine. Bextê te me, devê xwe mehkem bigre, yanê dinyayê hevdu keve. Bihedime ha!

**Gulîzer** – *(Halekî poşman)*. Xatî Gul, te lap hundirê min qetand. Çima apo Bişarî ewqasî zulumkare, xwînrêje?

**Gul** – Lawo, tu zarî, gelek tişta nizanî. Derheqa wî gurî da bavê xwe pirske. Ewê te ra gelek tişta qepke.

*(Vê demê Memmed dêmekî eşq tê dikê. Xatî Gulê ku dibîne, xwe unda dike. Dixwaze paşda vegere, Gulîzer awirê xwe va eşaretiya 'meçe' didê)*.

**Memmed** – *(Lez)*. Gulîzer, te Miho ne dîtiye? Ew îro nehatiye mala we? Wekî bê, bêjê da Memmed te digeriya. Bila ese min bibîne. *(Zû ji dikê diçe. Gul dû wî dinihêre, hinekî şikber dibe).*

**Gul** – Gulîzer, lawo, ew kurê apê teyê Elî bû? Ew çima usan lezûbez Miho digere? Yeqîn tiştekî ferz heye? Xwedê bixevrîne, ew jî xortekî berbiçave. Lê, mexeyîde, nagihîje Miho. Emir nolî avê diçe, zarên du, pêr seva parîke nan

digiriyan. Maşella, bûna xortên serxwe. Çavê xwedêyî ser wan be.

**Gulîzer** – Belê, xatî, ew û Miho hevdu ra hevaltiyê dikin, tevî hevdu diçine ber garanê ovê. Timê têne mala me. Ew Hesenê birayî min nehberek, sêrêzk dilîzîn. Yeqîn dîsa dixwazin cîka da herin.

*(Gulê halekî pir perîşan ji dikê diçe. Memmed zû milê Gulîzerê digre, berbi xwe dikişîne, radimûse. Gulîzer xwe destê wî derdixe, hinekî dûr disekine)*.

**Gulîzer** – Kuro, te lap aqilê xwe unda kiriye. Cunu bûyî, çiye? Ne wê me bibînin, şerma ser şermêye.

**Memmed** – *(Dikene)*. Gulîzer, çavê te buxwum, wê Miho dît, yanê na? Barê, te wê derheqê da tiştek jê ra got, yanê na? Ne tuye zimîn da gelekî qoçaxî!

**Gulîzer** – *(Wî def dide)*. Erê, erê, lap arxanî be. Wê Miho dît, pir begem kir. Min jî çi pêwîst bû, hemû got. Lê… Kîjane xêre, bila xwedê wê bike. Pêş Têliyê û Miho bereke kûre bê binî heye. Ji wê silamet derketin gelekî zore. Çi zanim, haji wan, haj apo Bişar! Ez gelekî ditirsim.

*(Miho tê dikê. Gulîzer hev peyvandina xwe û xatî Gulê Miho ra qal dike)*.

**Miho** – *(Şestekî mêranî)*. Xwîşka mine delal, Memmedê bira, qet kêfa xwe xirab mekin, tu şaîşiya mekişînin. Beriya gotiye: “Xwedê heye, xem tu nîne”. Tu şuxul bê zehmet naqedin. *(Dikene)*. Emê destên xwe bilind bikin, ban gorî xwedêyê xwe bikin. Rebbê jorînî pir mezine,

rehma wî ye pire. Helbet wê piçek rehma xwe bide ser me. Înşallah, emê bi alîkariya wî vê şuxula xwe bê qezayî biqedînin. *(Destê wan digire)*. Werin, werin, êvar nêzîk dibe, çavê Têlî riya mine, bila min bibîne, dilê wê hinekî hêsa bibe. *(Ji dikê diçin)*.

***Perde berjêr dibe. Dik nayê xanê. Dengê strana zelal tê bihîstinê. Sazbend qeydê "Herê lo, herê lo Baso" lêdixînin.***

## PERDA SİSİYA

***Perde vedibe. Dik zelal tê xanê.***

***Mala Bişar begê. Bişar beg, Ahmed axa û Şêx belgî dane ber palê xwe. Destê wan da fîncan, qawê vedxwin, hevdu ra hêdî-hêdî diaxifin.***

**Ahmed axa** – *(Zarekî maqûl)*. Bişar beg, min emrê xwe da gavên bê armanc ne avîtine. Berê pîvaye, paşê biriye. Ziyan ne daye tu kesî, kesek ji min ne êşiyaye. Ez timê alîkarê şuxula xêrê bûme. Bila xwedê xêrê, silametiyê bîne qismetê me hemûya.

**Bişar beg** – *(Curekî nerazî)*. Ahmed axa, ez van gilî, gotinên teye duseriye peçikî. Tu serederiya dernaxim. Cara dinê te armanca xwe ne got, çûyî. Nika tevî Şêx hatî, dîsa destê xwe davêjî kol, kosa. Geh va alî dinihêrî, geh wa alî dinhêrî! Malik avayo, xwedê kur hîşto, dîsa dibêjim: Heta mis, mis dibêjî, carekêva Mistefa bêje, wekî bizanim, tu boy çi hatî? Armanca

hatina te çiye? Ez jî hildim, daynim, bersîva te bidim. Xwedê zelaliyê pir hezkiriye. Mala xwedê ser zelaliyê hatiye avakirinê.

**Ahmed axa** – *(Hinekî xwe berav dike)*. Beg, welleh tuyî rastî. *(Çavê Şêx dinihêre, Şêx jê ra çav dike)*. Ezê îdî armanca hatina xwe we ra bêjim. Begê minî delal, ez îro çawa xazgînçî hatime mala te.

**Bigar beg** – *(Çawa vecinîqe)*. Ahmed axa, min pak nebihîst, hîvî dikim dubarke. Te got xazgînçîme erê? Wê xazgînçîtiyê tu boy kê dikî, kê tu şandî? Ew xwedanê çend serêye? Çi culetiye? *(Navbirî)*. Yeqîn wî merî gurçikê gura xwarine, erê?

**Ahmed axa** – Begê min, çima ewqasî hêrs dibî? Xwedê jî dizane, bende jî rind dizanin, wekî nav êlê da kesek nikare ber hulfa te bisekine. Yanê jî mûmê-misgalê bilipite, pirsa nelayîq derheqa te da bêje. Ewî ez şandime ber derê te, ew jî ne merivekî ewqasî kême. Nav êlê da tenê ewî hinekî anegorî teye. Ew Sehîd bege. *(Navbirî)*. Têliya keça te xwe ra dixwaze. Tuyê keça xwe bidî yekî, usane, yanê na?

**Şêx** – *(Zarekî durû)*. Beg, emrê xwedê kesek nikare înkarke, yanê tiştekî lê zêdeke. Keç ku mezin bû, gihîşte hetê xwe, bi emrê şerîetê pêwîste wê zû bidî mêr. Nedî, xwe ra gunehekî gelekî mezin qazanc dikî. Bexte, hatiye. Diha baş dibe, neh nekî. Belkî xwedê bê me xeleqên wan hevdu hilkişandine, em dibine sebeb.

**Bişar beg** – *(Nav mitala da)*. Mêvanên mine pir qedir, we armanca hatina xwe got. Zanim, hûn boynet şuxulên vala derê min venakin.

Welleh, Sehîd beg ne mêrekî xirabe. Nav êlê da nav-dengê wî jî pire. Lê, hinekî sebir bikin, ez kûr bifikirim. Emê dîsa hevdu bibînin.

**Ahmed axa** – *(Beşereke xweş)*. Bigar beg, beriya tu tiştek dûhatiyê xwe ra nehîştine. "Gîha ser koka xwe şîn dibe". Ew şîrî helal be, te mêtiye. Te bersîva esilzada da me. Belê, emê dîsa hevdu bibînin.

*(Radibin, xatirê xwe beg dixwazin. Bigar beg wan heta ber dêrî verê dike. Gul tê dikê. Çavê wî dinihêre, kesereke dikişîne)*.

**Gul** – Bigar beg, hêrs nebe, mêvanên te çi qewî hatibûn? Lê çima ewqasî zû çûn? Ahmed axa, Şêx tu cara ji mala me usan zû neçûne?

**Bişar beg** – *(Gelekî hêrs)*. Qîza nemeriva, ev çi qewimiye, tu îdî ser min gostaqiyê dikî? Pirs, bersîva ji min dixwazî, erê? Jinî, here jintiye xwe bike! Ez rind dizanim, ew çima hatibûn, çima çûn. Here, here, dîsa tepgê serê min hevdu nexêre.

**Gul** – *(Halekî melûl da)*. Beg, min hewaldina we hemû bihîst. Xwedê xenîmî Ahmed axayê virek, Şêxê durû bibe. Lê, wan boynet pirsa hatî, qet rebbê jorîn fedî ne kirin? Ne tirsiyan? Keça teye hevdeh saliye, Sehîd beg se, çar sala te biçûktire. Nanê wan deriya, ava wan devê ziwa be! Xwedê wan qebûl meke. Lê, qet xwedê însaf nedaye wan?

**Bişar beg** – *(Diqîre, destê xwe davêje qevza qemê)*. Of, nelê bê… keça pêxasa, ez ku heme, tu kî yî?  Kê destûr daye, tu tevî şuxulê min bibî? Ez mêrim, çawan bixwazim, ezê usan bikim. Lê ez wê bidime kê? Gavanekî, şivanekî,

yanê rûtekî bê bavî bestê hatî, erê?! De bêje, bêje, tu kê mislihet dibînî? Ez bidime wî. *(Bilind dikene)*. Belkî dilê hêsa bibe. Bexte, vebûye, bila here, buxwe, vexwe, bide, bistine, kêf bike. Bibe xanima ser text. Rojên xwe nav eşq-şayê da derbas bike. Îdî çi bile-bila teye? Here, here, cinê min ranake!

**Gul** – *(Hêrs)*. Hey mala te xirav bûya, te dewleta xwe nexaro! Çima dewleta te hindike? Hed-hêsabê wê tunene, ji ava bera Wanê zehftire. Tuyî lele wînî? Te çavê xwe kutaye qelenê Têliyê? Hey erdê te ra gazî esmîn kiro!

*(Herdu ji dikê diçin. Sehîd beg, Ahmed axa û Şêx têne dikê)*

**Sehîd beg** – *(Halekî pir xwe razî)*. Ahmed axa, Şêxê delal, min kefiltiya xwe daye we. Herin dilê we çawa dixwaze, usan bikin. Ez Bişar begê baş nas dikim, çi got, erê bêjin. Tenê armanca min biqedînin. Malê dinê ruhê wî şirîntire. *(Berê xwe dide Şêx)*. Ezî Ahmed axa arxaînim, lê çiqas qeweta te heye, bide xebatê. Devê wî girêde, bila meke mike-mik. Malik avayo, tu wan nivişt ok, miviştokên xwe kîjan rojê ra dihêlî? Gora keko, ez deyndarê te namînim. Herin, herin, bila xwedê alî we bike. *(Dikene)*. Kur vegerin, ha!

**Ahmed axa** – *(Vedibişire)*. Sehîd beg, ezî gelekî te razîme wekî tu ewqasî îtbara xwe bi min tînî. Ezê bi alîkariya xwedê vê xwastina te bê icir biqedînim. Welleh, mêrik cara dûda jî me bi hurmeteke pir maqûl va qebûl kirin, him jî verê kirin. Lê, îtbara dinê tunene, wext, zeman

hatine guhastinê. Merivên nika zû qewlê xwe bîr dikin. Emê herin, çawa gotine, "Ev seriye, ew oxire".

**Şêx** – *(Gelekî ji xwe razî)*. Sehîd beg, tu qet şaîşa mekişîne. *(Destê xwe sîngê xwe dixîne)*. Ev birê te ne miriye, bi alîkariya ulmê şerîf, ezê usan bikim, ew navê xwe bîra xwe derxe. *(Dikene)*. Begê minî delalo, çima me kulav xwendiye? *(Milê Ahmed axa dikişîne)*. Were, were, em herin, tuyê wira qeweta vî birayê xwe bibînî! Serê Sehîd begê bila sax be. Ji wî malê dinê, ji me qeweta ulmê şerîf. Dawiyê da xwedê me hevdu mede şermê!

*(Ahmed axa û Şêx xatirê xwe Sehîd begê dixwazin, dikê diçin. Sehîd beg pey wan dinihêre, dikene, xwe-xwe ra diaxife).*

**Sehîd beg** – *(Halekî xwe razî)*. Herin, herin, beriya gotiye: "Bila xweşî be, xweş nebû, hemînkê reşî heye, heye".

*(Ji dikê diçe. Gul û Têlî têne dikê)*.

**Gul** – Ez qurban, delîla te me, di jiyanê da ji boy dê, qîzê nêzînktir kesek tunene. Lawo, dilê te da çi disêwire, min ra bêje. Ezê derdê te bi destê xwe derman kim. Xwedê derd jî daye, derman jî daye. Mirov loxmanê nevsa xwe ne.

**Têlî** – *(Wê dinihêre, keserê dikişîne)*. Êh dayê can, tu usan arxanî-arxanî diaxifî, dîtî bêjin welleh, billeh ber hulfa vê mêrxasê çiya jî nikarin bisekinin. Lê, ez halê te baş dizanim. Tu destê zalimê bavî min da ev çend salin çi dikişînî…. Dayê can, xwe qet meêşîne, dû her tiştî mekeve. Ciyê xwe da rihet rûnê. Ne, tu qulba minî!

**Gul** – *(Feqîr-feqîr)*. Lawo, welleh, tu min aqiltirî. Vî heyamê qetlê da merivên nolanî mine feqîr, qet nikarin tu tiştî bikin. Qeweta wan nagihîje bendikekî vekin. Her alî da qîrîn, qûjîn, zulüm dibare. Kes halê kesî nizane. Kî çawan dixwaze, usan dike. Xwedê axiriyê xêr bike.

*(Gulîzer dêmekî şa tê dikê. Xwe davêje hemêza Gulê, herdu destên wê maç dike).*

**Gulîzer** – Xatî Gul, ev çend rojin, min tu nedîtî, lap bîra te kiriye. Serê bavo, ez weke dayîka xwe te hez dikim. Ez jî tevî Têliyê hemêza te da mezin bûme, firgî tunene, tu jî dayîkeke nolî dayîka minî. *(Dikene)*. Dive, min gilî-gotinên we nîvcî hiştin?

**Gul** – Na, na, qîza min, tu lap wede da hatî. Mînê banî te kira. Tiştekî meyî ji te veşartî tunene. Lawo, beriya gotiye: "Hevalên baş, bira û xwîşka pêştirin", "Heval neynika dilê hevale". Ez ser Têlî mitheyr mame. Ew ro-ro nolanî gulîlka paîzêye wede buhurî zer dibe, diçilmise. Nizanim hewalê wê çiye? Lawo, belkî tu min ra tiştekî ese bêjî?

**Gulîzer** – *(Serê xwe bêrjêr dike, soro-moro dibe)*. Xatî Gul, min derheqa Têlî da çi hebû gişk we ra qise kiriye. Nika ku tu dixwazî, ese ferih bizanibî, ezê we ra dubare bêjim. Ev çend salin Têlî û Miho hevdu hez dikin. Wan ev sêra xwe heta nika tirsa apo Bişar veşartibûn. Lê, nika îdî dibînin, royê çend xazgînçiyên wê têne ber derê we. Ew nav agirê hubê da dişewite, diperite. Nizane çi bike, kê ra çi bêje. Miho jî halê wê da ye. Îdî vê zêdetir çi bêjim? *(Gulîzer ji dikê diçe. Gul nolanî nexwaşeke bedhal nikare*

*ciyê xwe rabe. Tenê va alî, wa alî dinihêre. Têlî çavê diya xwe dinihêre, Gul wê hemêz dike, porê wê mehez dike)*.

**Gul** – *(Dengekî pejmûr)*. Dalala min, dayik qurbana te be. Gulîzerê îdî ez bi hemû tiştî hesandim. Lawo, roja dê, deynê ewladêye. Ew agirê te dişewitîne, wextê da dayîka te jî şewitandiye. Ew ava hubêye tiverikî min jî tem kiriye. Lê zalimê bavî te, nehişt ez wê avê têr-têr vexum. Ber min da hîşt. Belkî xwedê ber wî da bihêle! Heta min têxine gora sar da jî, ezê nifirkara nevsa bavê te bim. Lawo, ro li me wedekî xirab da çûye ava. Çi bêjim, bila dawî xêr be!

**Têlî** – *(Dike îske-îsk)*. Dayê can, rûyê min bin piyê te be, min bibexşîne, tu îdî hemû tiştî hesyayî. Eze pêş te gunekarim. Min şerma dilê xwe te ra venedikir. *(Kelogirî ji dikê diçe)*.

*(Gulîzer, Memed û Miho têne dikê. Gul hêsrên çavê xwe paqiş dike. Dilekî hişmetkar rûyê Miho mêze dike. Memmed û Miho destê wê radimûsin).*

**Gul** – *(Ber xwe da)*. Welleh, kurê mêrik serê sed kuriye. *kişîne)*. Hema ew jî xortekî mîna wî bû, eynî ewe, sekiniye. Çawa bêjî bav, kurê hevdune. Qed, qamet, bedewiyê da jî ça sêveke kirine du kera. Şev, ro bejna wî ber çavê min naçe. Kuda difetilim, wî dibînim. Xwedê mala vaîsa xirab bike, nehîştin mirazê me bi hevdu bibe!

**Gulîzer** – *(Dêmekî eşq, Miho nîşanî wê dide)*. Xatî Gul, zarotiya wî ber çavê we derbaz bûye,

binihêr, bê xortekî çawa jê derketiye. Kê, wê bawer kira wekî…

**Gul** – *(Dilekî xêrxwaz)*. Gulîzer, Gulîzer, tu ewladê Kewa rehmetî nîşanî min didî? Zaroktî û qîztiya min Kewê tevî hevdu derbaz bûye. Me timê hevdu dipirsî. Çavê xwedêyî ser be! Lap xortekî hêcaye. Bila xwedê per-baskên xwe ser wî têke sî-sitar.

**Memmed** – *(Dêmekî şermoke)*. Xatî Gul, min Gulîzerê ew bi zorê aniye bal te, şerma nizane çi bike. Nizane xwe kuda veşêre. Dibêje ezê çavê xatiya Gul çawa binihêrim? *(Berê xwe Miho da dike dikene)*. De me îdî şermika te revand, dilê te da çi heye, çi disêwire, gişkî veke, arxanî, arxanî qise bike. Demeke vê demê baştir tu cara nakeve destê te. Bira can, meydan îdî ya teye. Hespa xwe çawa dixwazî, usan bibezîne. Kesek pêşiya te nikare bigire. *(Dikene, destê xwe sîngê xwe dixe).* Ev birayê te pişta te mîna şêra şêkiniye.

**Gul** – Memmed, kurê min, Gulîzerê, Têliyê min ra gişk qise kirine. Lawo, min ew agira dîtiye. Wî agirî gortir, tu agir tunene. Ez wana ra emrê dirêj, oxura bê qeziya, roja eşq, şaye şirîn dixwazim. Lê, bila bîr mekin, pêşberî wan sûreke polayê sekiniye. Tu qewet nikarin wî cî rakin. Xwedê par-baskên xwe bide ser wan. Vê duayê pêştir ez wana ra nikarim tu alîkariya bikim. Bila xwedê wan ra bibe yar. Kî dibe neyar, bila bibe neyar. Lawo, “Heqî zirav dibe, lê naqete”.

**Miho** – Xatî gul, alîkariya teye, herî mezine, pir qîmet ew bû. Te ew jî da me. Ew duayên

teye bi dil û cîger boy me hemû alîkariyê evzeltirin. Bila xwedê dengê we bibihê. Xatî can, beriya gotiye ku, "Çavê ku ditirse, zilik zû dikevinê". Emê berê gazî xwedayê xwe bikin, paşê bimeşin.

***Perde berjêr dibe, dik nayê xanê. Dengê stranê tê bihîstinê. Dengbêj kilama 'Gulê marûmê' distirê.***

## PERDA ÇARA

### Beşa yekê

***Perde evraz dibe. Dik nav ronayêda zelal tê xanê.***
***Bişar beg û Gul rûniştine, hevdu ra diaxifin. Vê demê Ahmed axa û Şêx têne dikê. Gul lez ciyê xwe radibe, ji dikê diçe.***

**Ahmed axa** – *(Dengekî maqûl)*. Bişar beg, bibexşîne, tu îdî armanca hatina me rind dizanî… Te got sebir bikin, me sebir kir. *(Dikene)*. Nika jî em sebir nakin. Gelekî sebir kirine bê feydeye. Eme hîviya qiararê tene. Çawa te ra dest dide, emê usan jî bikin. Beriya gotiye: "Xwedanê qîza sultanın". Emê pey êrişa te bimeşin.
**Şêx** – *(Vedibişire, dengekî milahîm)*. Beg, ocaxa keko kim, nav êlê da axa, beg gelekin. Lê, yek nagihêje te. Bal min qedrê teyî pir bilinde. Ewqas qenciyên te derbazî aliyê min

bûne, jimarê va kuta nabin. Ev çend salin, em tevî hevdu nan, xoyê dixwun. Min pirseke nelayîq te ne bihîstiye. Welleh, qismetekî gelekî baş hatiye ser ewlada te. Şikir, daîna xwedê, bextê wê vebûye. Mirovên aqil şuxula xêrê paşda naxêre, neh neke. Bide, bila here. Rebbê jorîn jî paqişayê pir hez kiriye.

**Bişar beg** – *(Nav mitala da tenê çavên wan dinihêre. Dengekî maqûl)*. Ahmed axa, şêxê delal, dû çûna we ra min gelekî mitale kiriye. Hildaye, daniye, hatime ser qirarekî kutasiyê. Ez vê carê we destê vala verê nakim. Qedrê Sehîd begêyî cem min pir bû, nika lap pir bûye. Firqî tunene, bavê minî rehmetî 25 sala rehme lê bûya dayîka min mestir bû. Wê dinya xwe zû guhast, çû mala heq. Lê mala bavê wê ava be, mêrekî mîna min da malbeta bavê min. Bêjine Sehîd begê, dilê wî çi wext dixwaze, bila bê, belge, nîşaniya xwe dayne. Wedê dewetê jî bila xwe qirarke. Mesele qelen, ew îdî şuxulê min, wî ye. Maşella, dewleta Sehîd begê ava bera Wanê pirtire. *(Ahmed axa, şêx pir xoşhal dibin. Xatirê xwe Bişar begê dixwazin, ji dikê diçin. Bişar beg, dû wan dinihêre, bilind dikene)*. Sehîd beg, de tu mêrî nika ber tekê min bisekine. Min zû da ev roja dixwast, wekî te bavêjime çengela xwe. Şikir, tu bi piyê xwe hatî! Te çi bi min kiro, ez te usa bigivişim. Bedena te da piçek ava te nemîne. Heyfa kevin, teze, gişka ji te derxim. Tuyê hê bizanibî ez kî me, çi kareme! *(Halekî eşq da ji dikê diçe. Gul û carî têne dikê)*.

**Carî** – *(Pirse-tirse)*. Xanim, bibaxşîne, îznê bide, ez dixwazim derheqa xeberdana wan da we ra caweke teze bidim. Lê, ditirsim, beg bibihê, wê elbêra serê min qutke, goştê min wê bavêje ber tejî, tûlên xwe.

**Gul** – *(Dengekî milahîm)*. Qîza min, qet metirse, bêje, bêje. Begê heta kutasiya emrê xwe wê nizanibe, wekî te gotiye… Ev çend salin tu vê malê da dixebitî, min timê qedrê te girtiye. Te tiştekî xirab nekiriye. Ez te cariya malê hesab nakim, tu jî nefereke vê malêyî. Bêje, qet metirse.

**Carî** – *(Hêdî-hêdî guhê wê da dike piste-pist).* Xanim, Bişar begê erêbûna Têliyê da. Got: - Bêjine Sehîd begê, çi wext dixwaze, bila bê belge, nîşaniyê dayne. Zûtirekê deweta xwe bike, kulfeta xwe bibe. *(Carî ji dikê diçe. Bişar beg tê ser dikê)*.

**Gul** – *(Xwe usan dide kivşê, giva ha ji tu tiştî tunene)*. Beg, bibexşîne, pirsê etiv tunene. Şikir, çawa tê xanê, te mêvanên xwe verê kirin, erê?

**Bişar beg** – *(Curekî qelf kirî)*. Belê, belê, qîza, min mêvanên xwe verê kirin. Bêje, bê gotina te çiye?

**Gul** – *(Hêdî)*. Lê te ew ser hîmî çi qewlî weste kirin?

**Bişar beg** – *(Bi hers)*. Qîza nemeriva, tu dîsa tengê serê min hev dixêrî?! Ew şuxulê mine, ne yê teye. Tuyê dawiyê bizanibî min ew ser çi qewlî verê kirine.

**Gul** – *(Dêmekî melûl)*. Ev çend salin, ez ketime vê wêrana te. Min rojeke xwedê mirûzê

te nolî îro ewqasî eşq ne dîtiye? Yeqîn te dîsa mala hineka şewitandiye? Yanê jî hazir dibî bişewitînî? Kuda dilipitî, xiraviyê pêştir tiştekî nakî.

**Bişar beg** – *(Bi hêrs)*. Qîzê, tu dîsa tengê serê min hev dixî? Heteren-peteren xeber didî, erê? Min kir, nekir, tu nebuy meriv! Nav şel, şimaqiya da zêr-zewara da xeniqandî, dîsa nolî berê çarix, gorê qirêj va hatî xanê. Derketî holê, xwedê kivşê. Beriya rast gotiye: "Tulmikê piştê tenê gor dikare rast bike". Îdî giliyê min tunene.

**Gul** – Hey xwedê te qebûl nekiro! Çima dîsa min jerdadayî dikî? Kulfeta te me, çima îzna min tunene, pirsekê te pirs kim? Nabêjî, qet nebêje. *(Dixwaze ji dikê here)*.

**Bişar beg** – *(Destê wê digire)*. Meçe, meçe, te ku erebe daxiste rastê, ezê sebebê şabûna xweye îro te ra qalkim. Xanima mine şaşe-per, tu jî şabibî! Rabî, rûnî dua min bikî. Min erêkirina Têliyê da. Got: - Bêjine Sehîd begê, bila bê zûtirekê deweta xwe bike. "Serî birî, go seqirî".

*(Gul nolî meriveke mera lêdayî ciyê xwe da hişk dibe, disekine. Tenê çavê wî dinihêre)*.

**Gul** – *(Halakî feqîr da)*. Hey dayika min nemirê. Çima min nizanibû, te dîsa malek kafkûn kiriye? Loman usanî eşqî, şayî. Hey mala te xerav bûyo, te çima ewlada min avîte nav wî agirî? Kire bela wî derdê bê dermane? Bi destê xwe emrê wê pûç kir, kire qijikeke reşe bedbexte. Ew ku, Sehîd beg ku? Wê destê wî da çi rojê bibîne? Erd te ra gazî esmîn bike!

**Bişar beg** – *(Bilind dikene)*. Jinik, dilê xwe lap hênik bigire, xweyîke. Ez ciyê şil rûnanêm, wekî bin min şil bibe. Tuyê dawiyê bizanibî, min çi kiriye, çi tele wan ra çêkiriye. Min çerxa wan usan badaye, heta mirinê ewê nikaribin wê rast bikin. Wextê bê, tuyê jî destê min tewafkî. Here, here, dîsa textikê serê min hevdu nexêre. *(Sert wê dinihêre, ji dikê diçe. Wê demê Têlî û Gulîzer têne dikê. Têlî dayîka xwe ku wî halî da dibîne, elbêra wê hemêz dike, zû-zû herdû sûretê wê radimûse. Destê xwe dide berpalê wê)*.

**Têlî** – Dayê can, ez qurbana te me, yeqîn te û bavo dîsa hevdu ra şer kiriye, erê? Zû bike, bêje. Yanê dilê min biteqe.

**Gul** – *(Wê hemêz dike, hêsra dibarîne. Destê xwe stuyê wê ra dibe, serê wê mehez dike)*. Na, na, delîla te me! Arxanî be, qet tu tiştek ne qewimiye. Dîsa hinekî dilê min xirab bûye. Malbavanê min ketine bîra min.

**Gulîzer** – *(Têlî ra çav dike, Têlî ji dikê diçe)*. Xatî Gul, ne ez him qîza te me, him jî dewsa hevala te me. Çi pirsên te hene, timê gişka min ra dibêjî. De bêje, çi bûye, çi qewimiye? Min ra qise ke. Bila dilê te hinekî vala be, hêsa be. Gora dayîkê, ne tu dizanî, ez giliyê te tu kesî ra nabêjim.

**Gul** – *(Destê wê digire, berbi xwe dikişîne. Guhê wê da hêdî-hêdî dike piste-pist)*. Qîza min, derdê mine bê dermanin. Qisekirinê va ew xilaz nabin. Çiqasî ser wan vedikî, ewqasî ber hevdu dertên. Bidî kevira, kevirê bihelin. Lê, ez deyax dikim. Nizanim, ji ku dest pê kim, kîderê

da kutakim. Derdê îro jî lap daye ser hemû derda. Ezê îdî vî derdî nikaribim bikişînim. Xwezil, xwedê ez nexuluqandama. *(Kelegorî dibe)*. Lawo, xwînxwarê me îro erêkirina Têliyê merivê Sehîd begê ra daye. Îdî her tişt kutakiriye. Dilê min diteqe, nizanim çi bikim...

**Gulîzer** – *(Nolanî dîna ciyê xwe radibe)*. Çi, çi, te çi got? Sehîd begê ra, erê? Wey, wey…

**Gul** – Erê, erê, qîza min, Sehîd begê ra! Belkî ew tu xêrê vî sewdayê xwe nebîne! Xwedê belakê xêr nazil bike, berî şayê, ez şîna wî bikim. Bila xwedê dengê min bibihê.

## PERDA ÇARA
### Beşa duda

***Perde vedibe. Dik zelal tê xanê. Sehîd beg, Ahmed axa û şex belgî dane ber palê xwe, rûniştine. Destê wan da fîncanê qawê, maqul-maqûl qawê vedixwun. Hêdî-hêdî diaxifin, bilind dikenin.***

**Sehîd beg** – *(Dêmekî geş)*. De bêjin, bêjin, gelî qasidê min wek dêwa. Bê hûn qîz hatine, yanê kur? Dêmê we ra kivş dibe, hûn îcar kur hatine, erê? Ez Bişar begê rind nas dikim, çavbirçîbûna wî jî baş dizanim. Ewê boy malê dinê her tiştê xwe derbaz be, qet of nabêje. Wî zûda çav kutaye dewleta min. "Malê dinê, soriyê mêraye". Bila ser wê fikirke. Wî bîr kiriye, kurê mal qazanckirî baş dizane wî malî çawa, boy kê, kîderê, çer çi hîmî xerc bike. Mal hewamesîl nayê qazanckirinê.

**Ahmed axa** – *(Xwe razî)*. Beg, gora keko kim, qet usan nebêje. Heta me ew anî ser riya rast, cermê eniya me qetiya. Zimanê min *(Dikene)*, niviştokê şêx ew ker û lal kirin.

**Şêx** – *(Destê xwe sîngê xwe dixîne)*. Welleh, ezîm, billeh kerim. Wekî ev boka nebûya, ew tu cara usan hêsa nerm nedibû. Ezî çawa ketime hundur, min hê ber derî ayeta devgirêdanê xwend. *(Dikene)*. Beg, loma tu qelfê xwe bi min dikî? Niviştok, miviştok dibêjî. De nika qîmetekî baş bide vî bokî? Rind bizanibe, bê ez kî me, çi dikarim bikim? Niviştokên min dikarin cêhê hev kuteka ra bimeşînin. Tu hela qeweta wan pak nizanî. Loman usan arxanî arxanî diaxifî.

**Sehîd beg** – *(Destê xwe dide ser milê herda)*. Ez we pir, pir razîme. We ev zehmetiyê minî giran kişand, armanca min mînanî mêra qedand. Îro da qedrê we bal min lap zêde bû. We tevî rehmetiyê bavê min nan, xwê xwariye. Ez mêrim, kurê mêrame, xwedanê giliyê xwe me. Xelata we ser serê min, herdu çavên min. Sedî sed, arxanî bin. Beriya rast gotiye: "Hesin germî, germî, şuxul nermî, nermî", "Nîn bide nanpêja, yekî jî zêde bidê". Hûne rastin, şuxula xêrê çiqasî zu bikî, ewqasî baş dibe, bê içir dibe. We ev şuxula dest pê kiriye, hûnê jî kutakin. Pêwîste, îdî em haziriya deweta xwe bibînin. Dîsa dibêjim, xwedê ji we razî be. Înşalla, ezê zûtirekî banê we bikim.

*(Her sê ji dikê diçin. Vê demê Miho, Memmed, Têlî û Gulîzer têne dikê. Têlî halekî kelegoriyê da ye. Dixwaze bigirî, dike îske-îsk. Gulîzer wê*

*hemêz dike, cem xwe dide rûniştaninê. Porê wê nerme-nerm mehez dike)*.

**Gulîzer** – Têlî, xwîşka mine delal, îdî feydê girî qet tunene. Çi lazim bû, bavê te ew jî kiriye. Tu çiqasî gelekî bigiriyayî, tuyê hewqasî armanca xwe dûr bikevî. Devsa girî, mitalê baş pêwîstin. Em kîjan rê xwe ra bijbêrin, wekî wê re da bê qeziya bimeşin. Bigihîjine xwestina dilê xwe. *(Miho dinêre)*. Kuro, tu çima qet dengê xwe nakî?

**Memmed** – *(Şestekî mêranî)*. Têlî, xwîşka min, welleh, Gulîzer rast dibêje, feydê girî ku hebûya, rewşa dinê qet wa nedibû. Ruyê erdê belengaziyê, feqîriyê hilnedida. Zorbe, fiqare vî cureyî ne dizêrandin. Hêsrên bê sitara nedibûne çem, kanî. Dewsa girî, em gerekê rûnin, rind mitalekin, wekî fersenda xwe dest bernedin. De rabe, xwîşka mine delal, hêsrên xwe paqiş ke, em pilaneke bikişînin. Zora wan, dewleta wan mer, mişka heye! Me jî aqil heye. Aqil hemû malê dinê qewimtire. *(Çavê Miho dinihêre)*. Bira can, ez rastim, yanê na? Dengê xwe bike. Belkî dilê Têliyê hinekî hêsa bibe… Nanêrî hêsrên xwînê dibarîne? Çima dilê te qet lê naşewite. *(Dikene)*.

**Miho** – *(Posîde, posîde çavê wan dinihêre)*. Memmedê bira, Gulîzera xwîşk, hûn çima min haqasî dilomînin, ricim dikin? Çima dilê min kevire? Welleh, billeh, ez mihteyr mame. Nizanim, çi bikim, kuda herim, ji kê pirseke xwedê hez bibihêm. Ev çend sal bûn, ji tirsa Bişar begê kesek vê meselê nedihesand. Xwedê û we herda pêştir kesekî nizanibû. Nika hûn

rêkê bidine pêş me, em wê rê da bimeşin, wekî piyê me kevir, kuçika mekeve. Min îdî serê xwe unda kiriye. Tirsa Bişar begê, ki diwêre qet nebe dizîka va nêzîkî min bibe. Hukmê wî zalimî, hukme! Çawa bixwaze, wê usan bike. *(Gul halekî melûl da tê dikê. Miho, Memmed elbêra dikê diçin. Têlî û Gulîzer dimînin)*.

**Gulîzer** – *(Dengekî merhemet)*. Xatî Gul, çi qewimiye? Çima haqasî mitala dikî? Kêfa xwe hinekî kok xweyike. Xwedê mezine, yeqîn ewê piçek rehma xwe ser wan tifala têke sî-sitar. Tu tenê gazî xwedêyê xwe bike. Destê xwe deyla xwedê bernede.

**Gul** – *(Feqir-feqir)*. Eh, qîza min, xwedê wedê ez xuliqandime, elbêra ev derdana netika min nivîsîne. Lawo, ez taqet nakim, vê derheqê da bisekinim. Wî xwîna min firke, of nabêje. Bila bela wî ber piyê wî rabe. Belkî ruhê min, êlê jê xilaz bibe. Wî bo pirseke piçûk, zanî çi anî serê Etarê belengaz. Pûzika wî mûzikê ra derbaz kir. Warê wî feqîrî reş hîşt. Ser birînên min venekî.

**Têlî** - *(Hêsrên xwe paqiş dike)*. Dayê can, ez qurbana te me, qet tu şaîşa mekişîne. Ne ez neviya Egîtê Reşo me. Tu timê dibêjî, te gelekî ser nisla min da kişandiye. Wî rehme lê bûyî heta mirinê nehîşt ev hacûcê xwîna xelqê xwarî, rokê mala xwe da parî nanê rihet bixwîn. Tirsa wî serê xwe unda kiribûn. Miqabilî wan şer-dewa xweye heqiyê neda seknandinê. Nika ku navê wî tê kişandinê, êl nolî merivekî radibe ser piya. Pêş navê wî bejna xwe ditewînin. Qîza te şuxulê xwe baş dizane. Hinekî sebir bike, her

tiştê ciyê xwe bibîne. Tu min ra pir pêwîstî. *(Gul wê radimûse, diçe. Miho û Memmed têne dikê)*.

**Gulîzer** – Xwîşka min, bersîva vê kirina bavê te tenê tişteke. Hûn destê xwe bidine destê hevdu, serê xwe hildin, alîkî da herin. "Dîwar hilşiya, toz kişiya". Bila Bişar beg, Ahmed axa, Sehîd beg û Şêxê durû ha tepika bidine serê xwe. "Serî birî, go seqirî". Riya rast eve.

**Têlî** – *(Feqîr-feqîr)*. Gulîzer can, ez nêta te ra qaîlim. *(Çavê Miho dinihêre)*.

**Miho** – *(Vedibişire)*. Wekî Gulîzer û Memmed qaîlin, Têlî, destê xwe bide destê min, îdî min ra çi dimîne, ez hazirim emrê we biqedînim. *(Dîsa dikene)*.

**Memmed** – *(Dengekî merhemet)*. Miho, em birayê hevûdune. Xwîna min, xwîna te ne şirîntire. Hema kîdere zirave, bila wir da jî biqete. Lavayî kirinê, tirsonektiyê emê ne gihîjine tu merema. Kuro, îdî çima disekinî, kêr îdî hesto asê bûye. Şevekê Têliyê hilde terkeselawetî dinê bibe. Bila îdî her tişt kuta bibe.

*(Miho û Têlî destê hevdu digirin, Her çar ji dikê diçin. Bişar beg û Gul têne dikê. Beg banî cariyê dike wekî Têlî bê tevî wan taştiya sibê bike. Carî derbazî ciyê razana Têliyê dibe, wê nav cîda nabîne. Zû paşda vedigere, ji tirsa zimanê wê tê girêdanê. Zûr dibe. Çavê Bişar begê diniêre)*.

**Bişar beg** – *(Ser wê da diqîre)*. Qîza nemeriva, ne min te ra got, banî Têliyê bike. Bila bê, taştiya sibê bike. *(Carî xofgir çavê wê dinihêre, ew dîsa diqîre)*. Heywana dola

heywana, tuye kerî, yanî lalî? Çi kula te hatiye? Çima cawa min nadî?

**Carî** – *(Diricife, diwawqîne)*. Beg, Têlî ciyê xwe da tunene.

**Bişar beg** – *(Diqîre)*. Te çi got? Çawa ciyê xwe da tunene? *(Lez derbazî hêla ciyê razana Têliyê dibe, zû paşda vedigere. Ser Gulê da diqîre)*. Kanî, kanî leçera te? Hê çavê sibê venebûye, ew kuda çûye? Yeqîn dîsa çûye 'ziyareta" wê bê bavê leçer, erê?

**Gul** - *(Dengekî milahîm)*. Evdê xwedê, çima ser min da usan diqîrî? Dinê xirav dikî. Ez ku bizanibim, ew kuda çûye? Qîze, şikir mezin bûye, maşella, ser min dikeve. Ezê wê deyla xwe va girêdim? Wê rokê here mala cînara, rokê mala hevala. Ezê heta kengê qerewiliya wê bikişînim? Hema tuyê hercar wa dinê beravî ser serê min bikî? *(Ji dikê diçe)*.

**Bişar beg** – *(Hêrs banî serok xulam dike)*. Kuro, kurê nemeriva, zû here, wê cewrika sa ji cem Gulîzerka bê heya hilde bîne! Ezê wê ra îdî giliyê xweyî kutasiyê bêjim. Riya mala wê leçerê heta-hetayê wê heram bikim. *(Xulam dikê diçe, zû paşda vedigere)*.

**Xulam** – Beg *(Diwawqîne)*, cimaet dibêje, Mihoyê kurê Evdoyê gavan îşev Têlî revandiye. Kesek nizane kîjan alî biriye...

**Bişar beg** – *(Dilerize. Hindik dimîne bikeve)*. Wey, wey! Wey, bavo! Wey, lê min! Qîza min, kurê Evde gavanê?! Erê, erê! *(Nav dikê da diçe-tê. Destê xwe ser xulam da dihejîne)*. Kuro, cekdarên min hilde, here! Binê erdê da be jî wî seyê kurê sa bibîne. Derxe! Elbêra gormendî

bikin. Nahêlin kesek nêzîkî laşê wî bibe. Bila geleka ra bibe ders, wekî kesek qeletiyên usan îdî mekin. Tasek xwîna wî bîne, ez firkim. Belkî dilê min hêsa bibe. Te bihîst, yanê na?! Ax, ax, ewlada bê îtbar, te nav êlê da serê min berjêr kir! Kirime pînekî sor, piyê xwe alandim. Kuro, wê bêheyayê mekujin, sax bînine cem min. Ezê poz, guhê wê jêkim wekî, ew heta kutsiya emrê xwe nikaribe derê nav cimaetê. Kuda here, hemû tûyî rûyê wê bikin. Te fehm kir?

*(Xênî Bişar begê hemû dikê diçin. Devra dengê Gula tê. Wêle-wêl bilind dibe. Hinek şun va deng têne birîne. Xulam tirse-tirs tê dikê)*.

**Bişar beg** – *(Hêrs)*. Kuro, heywanê dola heywana, te emrê min qedand, yanê na?

**Xulam** – *(Diwawqîne)*. Begî sax be, ez xulam. We çawa emir da bû, min usa jî kir! Hema gulla ewlîn da ew seyê kurê sa gormendî kir, berbi cehnemê şand. Lê…

**Bişar beg** – *(Hêrs)*. Kuro, terşê kurê terşa, ija lê çiye? Zû bike, wê bê heyayê bîne cem min. Ez qirarê xwe biqedînim! Bila dilê min hêsa bibe, yanê dilê minê biteqe.

**Xulam** – *(Diricife)*. Begê min, ez xulam *(Navbirî)*, ezî pêş te gunekarım, îzna te heye tu min bikujî. Min nikaribû wê sax bînime hizûra we. Wedê wê laşê wî kûçikê, kurê kûçika ku dît, mînanî dîna kire qîre-qîr. Geh ket, geh rabû. Xwe avîte ser laşê wî. Ew ramûsa, ramûsa, dengekî bilind qîriya, got: - Miho, delalê min, bê te îdî vê dinê da min ra cî tunene! Jiyana bê te min heram be. Giriya, ciyê xwe rabû, li me nihêrî, nolî xezaleke birîndar kire qîre-qîr, berbi

behrê revî. Heta em pê ra gihîştin, wê xwe avîte gerxenêqê. Em çiqasî lê geriyan, me nedît. *(Piştî bersîva serek xulam, beg nolî dîna diqîre. Porê serê xwe vediçire,* pamika *serê xwe dixîne, dike axe, ax. Poşman, poşman banî cimeata sekinî dike)*.

**Bişar beg** – *(Destê xwe berbi wan bilind dike)*. Êlno, werin, werin, min bikujin, biniqlînin, ricim bikin. Rica dikim, mesekinin. Min bi destî xwe ewlada xwe kuşt. Mala xwe xirav kir. Ocaxa xwe şewitand. Hehîşt ewlada min mirazê xwe şa bibe. Seva bê aqiliya xwe ew berhêwan şande axberê sar. *(Bilind digîre)*. Na, na, delala min, bavê te, te tenê nahêle. Bila behra Wanê bibe Ezrailê min jî. Bila gorên me herda cot bin. Bê te, boy min îdî feîdê wê jiyanê tunene. *(Dike axe, ax, pamika serê xwe dide. Nolî dîna ciyê xwe radibe, berbi behrê direve, xênî serek xulam kesek dû wî naçe. Hinekî şûn va xulam halekî pejmûrde paşda vedigere!)*

**Xulam** – *(Cimaeta kombûyî mêze dike, diwawqîne)*. Cimaet *(Navbirî)*, hinekî min bibihên. Ezê we ra caweke nevxêriyê bidim. Min xwe Bişar begê ra ne gîhand. Wî, wey lawo, wey lawo dikir, diqîriya. Dengekî zîz qîriya. Va alî, wa alî nihêrî, got: 'Têliya min, delilê te me, bavê xwe qebûlke. Ez hatim, ez hatim. Û xwe avîte behrê. *(Xulam dike îske-îsk, çavê xwe paqiş dike, rehma xwedê lê be, dibeje).*

**Cimaet** – *(Hemû bi hevra)*. Rehme kîsî xwedêye. *(Dengê cure-cure têne bihîstinê)*. "Mal merzela her kesê here ser emelê", "Aqilê sivik timê barê giran hildide" dibêjin.

***Perde berjêr dibe. Dik nayê xanê. Dêngê strana bilind dibe. Dengbêj kilama "Miho, wî, wî, wî, wî" distirê.***

**DAWÎ.**

## Derheqa sponsorê



Elîyê Barî 1968 salê Komara Ermenîstanê, nehya Masîsê, gundê Rihanliyê hatiye dinê. Dibistana navîn 1985 salê li nehye Masîsê da qedandiye. Du sala Arteşa Sor da xîzmet kiriye. Li komara Ûkrayayê, bajarê Kîyêvê da zankoya tendirûstiyê xilaz kiriye, bûye bijîşka dirana.

Girêdayî şerê Qerebaxê ew koçberê komara Azerbaycanê dibe, bajarê Bakûyê da bijîşkê dirana kar dike.

2000 salê cîguhezî komara Qazaxistanê dibe. Niha karsaziyê ra mijûle. Bav sê zarane: Letîfe, Qadir û Nûrhan. Malxuya wî Gulnara Hetemşah jî doxtore.

Ez çawa bavê wî emekê xweyî ku min pêra kişandiye, bi dil û can lê xaş helal dikim. Rebbê jorîn rica dikim, emrê dirêj û sexlemiya bê qeziya têke qîstmetê wî. Ew vir ha şûn va bibe siponsorê gelek kesên ku, boynet nefê gela tiştekî kêrhatî xuliqandine.

Bi van çend xetên wî ra çend şîret û sipartinê xwe didim. Wekî ew wana bike bingeha jiyana xwe:

## ELÎ, KURÊ MİN

Qet bîr meke van şîretên bavê xune
Nav emir da tim nas bike şûna xune.
Him jor, him jêr, tu rûnene, lez mekeve
Kesê şûna xwe rûnanê, zû dikeve.

Ev dinya wa hatiye, wê wa jî here
Qenc hindikin, ji xirav tu zû dûr here.
Cewa avê tê da kirye gure, gure
Zû û dereng, avê tê da dîsa here.

Dema pirsîn, wekî zanî, bersîv bide
Dû tu kesî, bê cî, vala hewal mede.
Pir ne axife, bigre qedrê dev û lêva
Ewladê çê, bilind dikin navê bava.

***Barîyê Bala***

## NAVEROK

Pêşxeber ………………

**HELBEST**

***Welathezî***
Welatê dê ………………
Azayî ………………
Laçîn ………………
Lûrî-lûrî, lawê mino ………………
Welat ………………
Rêwîme ………………
Şikir, şikir ………………
Yekbûn çiye ………………

***Lîrîka***
Şuxlê xwedê kes nizane ………………
Gelek hatin ………………
Min çi dît, çi ne dît ………………
Domama Kurd ………………
Kestek halê kêvir girya ………………

***Hub û Hezkirin***
Keçika rindik ………………
Bedewa xwe razî ………………
Dota Kurd ………………
Hey bê însaf ………………
Ez ji kê ra hay, ez ji kê ra? ………………

***Şîret***
Kurêm, qencî unda nabin ………………

Kurêm, bigre riya raste ………………
Lawo ………………
Pêwîste, wekî her kes şûna xwe da rûnê ………………
Xwelî çi ye? ………………

***Çar xet*** ………………

***Ji bo zarokan***
Hejmaran ………………
Kurkê min ………………
Nûrxanê min ………………

***Rewakirin***
Dawî eve ………………
Keke Ezîz ………………
Axaliyê Nîyaz ra ………………
Ceyran, keç bira ………………
Dostê min ………………
Gulnara, buka mine delal ………………
Nûrhan, piçûka kalko ………………
Megrî, Nûrhanê min ………………
Têmirê bira ………………
Pismamê heca ………………
Rewayî şêxe pir xwe razî dikim ………………

**POÊMA**
Paşa û Belgîzar ………………
Çar emir, çar demsal ………………
Cemîle ………………

**ŞANO**
Seyran ………………
Miho û Telî ………………
Derheqa sponsorê ………………

# Barîyê Bala
# Kulîlkên Necilmisî

Rêdaktor: ***Kinyazê Îbrahîm Mîrzoyev***
Rêdaktorê berpirsiyar: ***Hejarê Şamil***
Korrektor: ***Eliyê Barî***
Rêzber: ***Anarê Barî***

***Vê pirtûka xwe rewayî şehîdê Şerê Cihanê duda, bavê xwe Elîyê Paşayê Miho û dayîka xweye emekdar Qaza Evdoyê Bişo dikim.***

**Weşanên Zengezûr**
**Rêdaktorê sereke: Hejarê Şamîl**
hejare_shamil@hotmail.com

# PDF:

# Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:
https://www.ensiklopediyakurdi.com/

Tel.:
+7 918 073 48 79